# *Ku mirov li kurdistanê jin bê*

*Abdusamet Yîgît*

Weşanên SORAN

.
.
.
.

*Ku mirov li kurdistanê jin bê*

Weşanên SORAN e
.
berlin 2015
Edîtor : Zeynel Abidîn Han
Berpirsiyariya Redaksiyonê: Zagros Baran
Grafîk û Design : Gazîn Han
.
email: han-grafik@hotmail.de
.
Çap û Grêdan : Concept Medienhaus GmbH
Bülowstr. 56-57 10783 Berlîn
.
ISBN 978-3-98166-86-8-1

.

## PÊŞGOTIN

Pirtûka **"ku mirov li kurdistanê jin bê",** balê û heyê dikişêne li ser rewşa jina kurd û tekoşîna wê ya azadîyê. Heta roja me, di nava tekoşîna azadiyê de bi hezaran jinên kurd, bo azadîya xwe û civate xwe jîyane xwe feda kirin a. Wan jinên kurd, bi hebûn, têgîn û zanîna xwe re mîreteyek mazin ya ku mirov divê ku wê werêne ser ziman li şûn xwe hiştin.

Bêgûman, bi vê pirtûkê re, ezê wê îdîayê nekim ku ez hemû pirsgirêkên jina kurd werênima ser ziman. Lê bi çerçoveyî û nêzîkatîyî, divê ku mirov wê çawa hilde li dest û werêne ser ziman, min di wê çerçoveyê de hilde li dest. Ev berhem, weke berhemeka lêkolînî derket li holê. Di nivîsandina wê de mijar bi mijar, li ser jinê, rewşa jinê û pirsgirêkên ên ku hena, di encama nîqaşkirinên dirêj ên bi jinên cûr bi cûr re ew nivisand.

Bi teybetî, tekoşîna azadîya jinê, li kurdistanê gihiştîya astaka pirr zêde mazin û bilind. Weke mêrekî nivîsandina vê pirtûkê li ser rewş û mijara jinê jî, wê ji min û keseyetîya bixwe ve jî, bigihêne fahmkirinaka mazin. Her jinên kurdistanî, dema ku mirov li wan dihisêne, mirov gelek têgînên mazin bi fahmkirina bi wan re bidest dike. Rewşa jinê li kurdistanê, î ro bi tekoşîna jinê re pirr zêde li pêş a. Herî zêde, hanîna vê tekoşînê ji devê jinê, wê rastîya wê baştir bide fahmkirin.

Jina kurd, zimanê wê û yê civate wê, ji aliyê rejimên ku kurd û Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin ve hatîya qadaxa kirin. Di vê çerçoveyê de pirsgirêkên xwe hanîna li ser ziman jî, dibê weke pirsgirêkna sereka di vê çerçoveyê de. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke devê jina kurd, bi qadaxaya li ser zimanê wê re hatî mifte kirin a. Di nava şert û mercên bi vî rengî de jina kurd, hem bi civate re û hem jî di nava civate de tekoşîna azadîyê û wekheviyê dide.

Her wusa, li vir, divê ku ez werênima ser ziman ku min nêzîkatîyên saziyên ku xwe weke ´saziyên jinan ên tirk" binav dikin jî, bi şaşîya wan û têgîna wan ya ´netewîya serdest´ re hilde li dest. Ev jî, weke mijaraka dema ku mirov ji aliyê jinên kurd ve lê dinerê, weke aliyekî ku pirsgirêkên mazin ji jinên kurd re diafirêne ya. Bo vê yekê, ev alî jî, di serî de divîyabû ku biheta fahm kirin. Di serî de li vir, mijara rêbazê û nêzîkatîyê pirr giring bû ku me di vê çerçoveyê de bihanîya ser ziman. **Rêbaz û nêzîkatî**ya rast, hertimî, ji pirsgirêkan re nêvî bi nêvî çareserîya

jî. Lê ku nêzîkatî û rêbaz ne rast bê, wê ew nêzîkatî û rêbaz, li şûna ku pirsgirêkan çareser bike, wê hê bêhtir û zêdetirî pirsgirêkan mazintir bike û bike weke pirsgirêkên hê maztir. Saziyên jinan ên tirkiya, ku zimanê wan zimanê tirkî ya, dema ku bi vî rengî nêzîkî jina kurd û pirsgirêkên wê dibin, hê zêdetirî, pirsgirêkê maztir dikin û pirsgirêkên nû jî bo wê diafirênin.

Saziyên jinan ên tirkiya, dema ku nêzîkî jinên netewên din dibin, zimanê wan fêr dibin û ankû bo fahmkirinê tercûmanîyê pêş dixin. Ku diçina jinên kurd, ti rêz û hûrmetê nadina zimanê civate kurd û heta ku zimanê jina kurd. Bêqiymet jî dibînin. Ji wan re bi zimanekî beyenî bi zimanê tirkî diaxifin. Lê jinên kurd, wan fahm nakin. Bo van saziyan jinan, fahmkirina jinên kurd bi zimanê tirkî, wê weke çareserîyê jî ji wan û pirsgirêkên wan re. Bo vê yekê, projeyên xwe yên fahmkirinê, hemûyan jî, li ser esasê fêrkirina jina kurd bi zimanê tirkî ava dikin û diçina jina kurd. Ti carî saziyên jinan ên tirkiya, fahm nekirin û yan jî nexwestin ku fahm kirin ku bo ku herina nava jina kurd û wê fahm bikin, divê ku bi zimanê wê fêr bibin û bi wê re herin û têkiliyê bi wê re dênin. Bi vê pirsgirêkî re, weke van pirsgirêkan û pirsgirêkên din ên zihniyetê bi minaqên pirsgirêkê ên ji jîyanê min hanî ser ziman. Hêvî dikim ku bo jinên kurd, ev pirtûk bibe weke gotinaka alikar. ..

Ev berhem, armanca wê ya sereka ew a ku jin, hêza xwe êdî xwe bixwe kifş bikin û êdî ew ji wan re bibe temen ku ew xwe bixwe werênina ser ziman di nava civate xwe de û bi ziimanê civate xwe re. Herî zêde, ku jin xwe werênina ser ziman, wê baştir werênina ser ziman. Ew hêz, zanîn, dîrok û qûdreta jinê heya ku xwe werêne ser ziman. Civateka ku xwe bimejiyê jinê re bibînê, wê rastîya xwe bi rasttir bibînê. Heta roja me, bi mejiyê mêr, hatîya nerîn. Ji xwe, temenê hemû pirsgirêkên roja me û ên di dîrokê de jî ev a.

**Ez vê pirtûkê, atfî keça kurd Ferinaz Xosrowanî** ku di **8´ê gûlana 2015**´an de rastî hêrîşa çend rayadarên îranî tê û ew bixwe dawî li jîyane xwe dihêne dikim. **Û di keseyeta wê de hemû jin û keçên kurd, ku rastî destavêtina rayadarên rejima tirk û ya Îranê hatina bibîr tênim û vê pirtûkê atfî rûmeta wan dikim**.

.

**Ferinaz Xosrowanî, wê hertimî di nava tekoşîna rûmet û azadiyê de bijî**

Jina kurd Ferinaz Xosrowanî, li rojhilatê kurdistanê li hotêla ´tara´, ku li bajarê rojhilatê kurdistanê Mihabadê ya, ku rastî hêrîşa çend rayadarên

îranî hat û bo xwe û rûmeta xwe ji destê wan xilas bike dawî li jîyane xwe hanî, gelê kurd ê Mihabadê rakir ser lingan. Ev kiryara bêahlaq û bêrûmet ya rayadarên îranî, di serî de divê ku mirov li ser navê mirovatiyê şermazar bike.. Bi teybetî, tenê îranê, her çar rejimên ku civate kurd û Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin, li hemberî civate kurd hêrîşên bi vî rengî ên bêahlaq kirina. Rejima tirk, weke bûyarên tecewûzê ên li zindana Bozantiyê, li dersim, Sêrt, batman û herêmên botanê jî, mirov dikarê werêne ser ziman.

Berî nûha li Îranê, dîsa hêrîşên din jî bûbûn li hemberê civate kurd û bi teybetî jina kurd. Di sale 2014´an de li Merîwanê jî, çend ciwanên kurd, li wan cilên Jinan li wan kiribûn. Ev kirin, hem bo ku jinên û rûmeta wê bişikênin û hem jî weke hêrîşeka li civate kurd civate kurd kiribûn. Heta roja me jî, hêrîşên cûr bi cûr ên bi vî rengî kirina. Di zindanên rejima Îranê de bi sedan ciwanên jin ên kurd ên weke Şêrîn Elemxolî hena û hatina bi dervekirin.

Ev hêrîşên li jina kurd û bi teybetî li ser jina kurd re ku civate kurd dihên kirin, weke hêrîşna ku divê ku mirov weke hêrîşna ku bi zihniyetî dihên kirin werêne ser ziman. Ti hêrîşên ku li tirkiya bê, li Îranê bê, Li îraq û sûrî jî bê ku li kurdan û civate kurd dibin, ku bi çi rengê bibin bila bibin,, mirov nikarê wan weke hêrîşna ferdî ku çend kesan bi serê xwe kirina werênina ser ziman. Hemû jî, hêrîşên ku li civate kurd dihên kirin in. Hêrîşên ku bi armanca şikandina rûmeta kurd in. Bo ku hêrîşê civate kurd û nirxên bikin û rûmeta wê bişikênin, beşên civatê kifş dikin û li ser wan re dikin. Berê li Merîwanê, weke ku hatibû ditin, li ser çend ciwanên ku li wan cilên jinê li wan hatibû kirin kiribûn. Î ro jî, bi rastrasta bi hêrîşa li jinê bi rengê destavêtinê û hwd re, wê hêrîşê û rengê wê didomênin.

Hêrîşên ku li jina kurd dibin, ku ev rejimên weke rejima îranê, rejima tirk, rejimên îraq û sûrî bin, bi armanca şikandina civate kurd, weke hêrîşna ku li civate kurd dikin in. Yanî, bi gotinaka din, weke hêrîşna bi plan jî, mirov dikarê werêne ser ziman. Heta roja me, di vê çerçoveyê de hêrîş kirina. Gelo wê ev hêrîş bê hêrîşa dawî li kurdan û civate kurd? Na, wê nebê hêrîşa dawî, Ji ber ku aliyekî van hêrîşan bi ´ne çareserkirina pirsgirêka kurd ve girêdayî ya. Ji ber vê yekê, mirov dikarê bibêje ku heta ku pirsgirêka kurd bidomê, wê hêrîşên bi vî rengî rengên cûr bi cûr li civate kurd, andamên civate kurd û rûmet û nirxên wê bikin.

Her mirovê ku piçekî jî, wijdanê mirovatiyê pêre hebe, divê ku li hemberê van hêrîşên bi vî rengî dengê xwe bilind bikin. **Ferinaz Xosrowanî**, keça kurda. Ew jineka kurd ya bi rêz û hûrmet û şefer a. Hêrîşa li wê li hemû Jinan, rûmeta Jinan û tekoşîna azadîya Jinan ya azadî û rûmetê ya. Em vê hêrîşa li Ferinaz Xosrowanî şermazar dikin û di wijdanê mirovatiyê de mahkûm dikin.

o0o

Piştî ku çeteyên DAÎŞ´ê hêrîşî şengalê kirin, trejedîyeka mazin bû. Bi sed hezaran şengalî goçber bûn. Bi hezaran kurdên êzîdî jî hatina qatil kirin. Lê di vê trejedîya kurdên êzîdî de, herî zêde dîsa Jinan û zarokan zirera mazin dît. hertimî, zihniyeta mêtinger ku li gorî ya mêr a, di şeran de jin weke ´genîmetê´ de dîtîya û dest danîya li ser wê. Mixabin, di wê sadsale 21´ê de ku jenosîda kurdên êzîdî bû de, dîsa heman tişt bû. Di jenosîda kurdên êzîdî de, bi hezaran mêr hatina qatil kirin û bi hezaran jin, weke ´genîmeta şer´ hatina berhevkirin û ravandin. Her wusa, destavêtina Jinan, weke kevneşopîyeka vê zihniyeta kujar a.

Di hemû komkujiyên mazin ên ku hatina kurdên êzîdî de jî, destavêtina Jinan bûya. Her wusa, ne tenê di komkujiya kurdên êzîdî de, komkujiyên ku bigiştî hatina serê civate kurd hemûyan de, destavêtina li jinê bûya. Lê di hêrîşên weke ên li beşên civate kurd ên weke êzîdî û hwd de, ev destavêtin zêdetirî bûya. Ji ber ku civate kurdên êzîdî ji aliyê bawerîya xwe ve cuda ya jî, ev cudahîya rengê bawerîya wê bûya sedema destavêtina jinên kurdên êzîdî. Di demên buhurî ên berê de, weke bûyarên ku bûna malê dîrokê jî, bi sedan û hezaran keçikên malbatên êzîdî hatina ravandin. Heta ku di sala 2013´an de jî, ciwanekî misilman, keçikeka ji malbetaka êzîdî ya temen piçûk ravandîya û xwestîya ku bêî dilê wê zawacê bi wê re çê bike û piştre wê ravandinê "meşrû" bide nîşandin. BI sedan rewşên bi vî rengî ên ku hatina hanîn serê ciwanên jin ên ji malbatên kurdên êzîdî hena.

Tevî ku ev rewş hena û di dîrokê de gelek minaqên bi vî rengî hena jî, dîsa saziyên civate êzîdî ji van rewşan ti ders û fêr dernexistina ku di nava civate êzîdî de, komelên Jinan ava bikin û di van waran de têgihiştinê çê bikin û makanizmeyên xwe bi xwe parastinê bo ciwanên jin ên êzîdî ne hatina afirandin û pêşxistin. Î ro, di nava civate kurd de, weke rêxistina jinê a giştî "komên jinên kurdistanê" ´KJK´ hatîya avakirin. Her wusa, "yekîneyên parastina jinê" ´YPJ´ bi leşkerî hatiya avakirin. Ev xwe bi xwe rêxistinakirina jinê çendî rast û giring a, evçendî di nava her beşên civate kurd de bi rêxistin kirina vê rêxistina Jinan û pêşxistina

makanizmayên xwe parastinê jî giring a. Bi teybetî, ev têgihiştina xwe parastinê a jinê, divîyabû ku di nava jinên kurd ên ku bawerîya wan êzîdî, şebekî, yeresanî û hwd de, herî zêdetir biheta pêşxistin. Ku di demên buhurî de, ev birêxistinkirin di nava jinên êzîdî de hatiba pêşxistin, wê î ro ew jinên ciwan ên êzîdî ku ji aliyên çeteyên DAÎŞ´ê ve hatina ravandin, wê î ro di nava wê rêxistina xwe parastinê a jinên êzîdî ên li şengalê de ba û wê xwe parastiban.
Ev bûyar û mijar, divêt ku ji wê pirr zêde ders û fêr were derxistin. Herî wê zêde, pêwîstîya jinê, divê ku xwe birêxistin bike.Ev yek, weke pêwîstîyekê ya. Herî zêde, beşên civate kurd, ên weke êzîdî, şebekî, yeresanî û hwd ku rengê bawerîya cuda ya, divê ku ew rêxistinkirina jinê û makanizmeyên xwe parastinê divê ku di nava wan de werê pêşxistin. Her wusa, jinên ciwan ên êzîdî jî divê ku ji van dîrokên bi êş ders û fêrê derxin û divê ku yekîneyên parastina jinê a şengalê ava bikin, pêşbixin û di navê de cihên xwe bigrin. Bi vê rengê, hem xwe û hem jî civate xwe bitêgihiştin biparêzên. Herî zêde, jin, divê ku xwe birêxistin bike.

Ji vê jenosîda şengalê ku hatîya serê kurdên êzîdî, ders û fêra herî mazin ya dîrokî jî divê ku ev bê ku were derxistin. Bêgûman heta roja me, bi gelek jinên civate kurdên êzîdî, di nava tekoşîna azadîya kurdistanê de cihê xwe girtina û hinek ji wan pekrewan jî bûna. Tenê ku bo bîrhanîna wan jî bê û bo ku mirov layiqî wê bîrhanîna wan jinên leheng ên kurdistanî jî bê, divê ku ev rêxistinîtîya jinê zêdetirî were pêşxistin. Herî zêde, di vê demê de, weke ku li rojavayê kurdistanê, "yekîneyên parastina jinê ên rojava" hena, divê ku bi heman rengî yekîneyên parastina jinê ên şengalê jî were pêşxistin. Jinên êzîdî, divê ku di vê warê xwe de xwe birêxistin bikin. Heta ku jinên ku li male xwe na jî, bo ku di male xwe de xwe biparêzên û bo ku dema ku telûkeyek were serê wan, divê ku di nava wan yekîneyên parastina jinê ên şengalê de xwe bi têgihiştin û perwerde bikin. Ev yek, weke zarorîyekê divê ku were ditin.
Berî nûha, gelek caran xwe xwe parastina şengalê hatîya kirin. Lê mixabin ew, ne hatîya pêşxistin. Ku di demên buhurî de, ew xwe-parastina cewherî ku bi ciwanên êzîdî hatiba avakirin û pêşxistin, wê î ro rewşa şengalê jî ne ev ba. Bo vê yekê, ji van aliyan ve jî, gelek ders û fêrên dîrokî divê ku were derxistin ji vê trejedîya şengalê. Çeteyên DAÎŞ´ê, pêşî ew hêrîşên xwe li rojavayê kurdistanê dan kirin. Li wir, jin û mêran bi hevdû re li ber wê li berxwe da. Li wir, bi serneketin. Lê civate kurdên êzîdî ji aliyên xwe-parastinê ve bêparastin bû. Êdî ji wan aliyên

bêparastin ên beşên civate kurd ve bidest hêrîşê li civate kurd kirin. Minaq, ev rengê xwe birêxistinkirina jinê, herî zêde, divê demê de divê ku li rojhilatê kurdistanê û başûrê kurdistanê divê ku were pêşxistin. Beşên kurdistanê ên ku herî zêde mihtacî wê na, ev in.

Piştî ku hêrîş li şengalê destpêkirin, ´yekîneyên parastina şengalê´ bi navê 'YPŞ´ hatina avakirin. Her wusa, divê ku ev avakirin, dualî bê. Aliyê wê ê jin jî divê ku hebe, Bi wê re jî ne tenê ciwanên mêr ên êzîdî tevlî wê bibin. Divê ku ciwanên jin ên êzîdî jî tevlî wê bibin. Ji xwe, herî zêde, divê ku ew tevlî bibin. Ku demekê berî vê demê, jinên ciwan ên êzîdî, ew birêxistinkirin di nava wan de hatiba pêşxistin di temenê xwe-parastina cewherî de, wê î ro bahse "firotina bi hezaran keçan bi destê DAÎŞ´ê di bazaran de ne hatiba kirin. Civateka weke civate kurd a êzîdî, ku dema ku bahse wê dîroka wê dihê kirin û dihê gotin ku "72 ferman hatina serê wê", ku ji aliyê xwe parastina cewherî ve bêrêxistin bê, mirov tenê dikarê bi qafletekê wê werêne ser ziman. Herî zêde, divîyabû ku î ro, jina kurd a êzîdî ji van aliyan ve xwe birêxistin bikira. temenê vê jî, ji aliyê têgihiştinî ve di nava civate êzîdîtiyê de heya. Di nava rengê bawerîya êzîdîtiyê de "jin, pîroz a." Di vê temenê de, di temenê parastina pîrozîya xwe de, divê ku êdî li mijarê binerê û xwe-parastina were pêşxistin.

Di demên berê de, dema ku kengî hêrîş li civate kurd a êzîdî bûna, hertimî destavêtina jinê jî bûna. Heta ku ev destavêtin, bûya mijare helbestan jî. Mijareka ku vilqasî, dihê zanîn, divê ku di temenê wê de xwe birêxistinkirin jî werê kirin. Jinên ciwan ên êzîdî, li şûna ku wê di wan wergehan de li bendî êşên nû ku werina serê wan bin, divê ku rabina ser xwe û herîn û tevlî "yekîneyên parastina şengalê" bibin. Bi wê tevlîbûnê re, yekîneyên parastina jinê ên şengalê ava bikin. Û bi wê re jî, di xate ´Binevş agal´an de bimeşîn. Binevş Agal jineka êzîdî ku li ber hêrîşên ku hatina ser serê civate wê li berxwe daye û di wê bawerîyê de pekrawan bûya. Bîrhanîna Binevş agal´an bi vî rengî, dikarê werê parastin û jîyandin. Xîreta jina kurd a êzîdî û bi rûmet binevş agal, dîrok nivîsandîya.

Binevş Agal, manisfestoya hemû civatên kurdistanê ên jin a. Lê bi teybetî jî, Binevş Agal, ji ber ku bi koka xwe ji malbetek êzîdî bû, manifestoya jinên ciwan ên civate êzîdî ya. Binevş Agal, rêya rastîyê û qanciyê şanî daye.. Ya ku î ro tenê li ciwanên kurd jê dikeve ku di rêyê de bimeşîn. Binevş Agal, weke keçikek êzîdî, biqaşî wê dayika pîroz a li laleşê ku ji destê wê gezek her êzîdî dixwê pîroz a. jinên ciwan ên êzîdî,

divê ku di vê temenê de li wê xwedî derkevin. Piştî vanqas êş û eleman re jinên ciwan ên êzîdî rabina ser xwe. Ev komkujiya mazin ku di van rojan de tê serê kurdên êzîdî li şengalê, ku em weke "fermane 73´min" bi nav dikin, divê ku ders û fêra herî mazin ya ku ji wê derxin ew bê ku her jinek ciwan a êzîdî bibe binevş agal´elek. Civateka ku andamên ku jin jî bin û mêr jî bin, ku ji dîroka xwe ya ku hatî jinkirin ku ders û fêran dernexin, ew mahkûmên têkçûnê û ji dîrokê çûnê na. Ciwanên êzîdî jî, divê ku wê dersê ji dîrokê derxin. Ciwanên êzîdî ku mêr bê, divê ku di rêya ´dewrêşê ewdî´ de bê û ku jina ciwan bê, divê ku di rêya Binevş Agal de bê. Di van rojên dîrokî û ên bi êş de, her jinên êzîdî divê ku herina nava yekîneyên parastina şengalê, ku hem xwe û warê xwe biparêzên û hem jî bi wê navê jina kurd a êzîdî li dîrokê ku layîqî wê binivîsêne.

o0o

**Li kurdistanê jinek û destanek**

Dema ku mirov bahse êşên gelê kurd bike, divê ku mirov dîrokekê bi wê re werêne ser ziman. Di van rojên dawiyê de navê êşa kurdistanê, rojava, kobanê, şengal û başûrê kurdistanê ya. Çeteyên DAÎŞ´ê bi alikarîya tirkiya û dewletên din ên ku Kurdistan di nava wan de hatîya parvakirin, bidest hêrîşî kurdistanîyan kir. Pêşî ji Musilê bidest hêrîşê kirin. Pêşî cebilxaneyên artişa Îraqê tişî çek hatina kirin. Piştre jî, dema ku DAÎŞ kirina musilê(nînowa) de, êdî ew çek hemû jî hatina xistin li destê wê. Şerê vê çeteya xwûnxwar, weke şerê sedsalê ê bi kurdistanîyan re ya. Şerekî ku wê biketa nava rûpelên dîrokê de ya. Lê berxwedana li hemberî wê jî, wê dîrokî ba. Wusa jî bû. Li Kobanê, piştî ku çeteyên DAÎŞ´ê bidest hêrîşê li kurdistanîyan kirin, kurdistanîyan jî li hember wê, berxwedanaka dîrokî bi jin, zaro, piçûk û mazinên xwe re dana nîşandin.

Berxwedana Kobanê, dema ku mirov bahse wê bike, wê ew dema dîrokî ku dema ku çeteyên DAÎŞ´ê bidest hêrîşkirina li wê kirin, wê werê bîra me. Di wan rojên ku dihat gotin ku wê ´mudahale´ li Sûrî bibê de, li herêmên Sûrî şerekî dijwar û lewitî bi alîkarîya dewletên weke tirkiya ên herêmê destpêkir. Komên ku di bin navê ´muxalif´ de hatina berhevkirin, komkujiyên mazin kirin. Kurdan jî, bo ku şer û pevçûn newina li herêmên wan, di serî de hêza xwe ya parastinê a bi navê YPG'ê pêşxistin, mazin kirin û wê hêza wan jî kir ku sehêt(kontrol)ê li ser herêmên wan çê bike, bo ku şer û pevçûnên bi rejimê re ne pijiqina li herêmên wan. Kurdan, pêşî, di 19´ê temûza 2012´an de destpêkirin û destdanîna li ser rêveberîya bajarên xwe. Piştre, li dûv wê herêm bi herêm, kurdan

rêveberîya bajarên xwe bidest xistin. Yên ku herî zêde ji vê nexweş bûn, rêveberîyên weke tirkiya ku metingerî li kurdistanê li ser serê civate kurd pêş dixistibûn bûn. T. Ardogan, dema ku kurdan rêveberîya bajarê Kobanê bidest xistibû, derketibû berçapameniyê û gotibû, "emê ji rewşek bûyî û bi dawî re nebêjin ´ey welleh´". Piştre, wateya van gotinê hat dîtin û fahmkirin. Herêm bi herêm, li wê bi alikarîya tirkiya komên çete hatina bi rêxistin û ajotina bi ser kurdan de. Pêşî li serêkahnîyê ev bû. Piştre jî, li herêmên din ên li gihiştiya rojavayê kurdistanê ev rewş hat pêşxistin.

Lê kurdan jî, li hemberî wê, bi rêxistiniya xwe re hêza xwe ya parastinê pêş dixistin. Ciwanên kurd, kom bi kom tevlî nava refên hêza parastinê a kurd YPG´ê dibûn. Li rex wê jî, hêza parastinê ya jin a YPJ´ê jî hatibû pêşxistin. Keç û jinên ciwan ên kurdistanî, di nava wê de cih digirtin bo parastina rûmet û welatê xwe.

Kom bi kom keçên kurd, tevlî nava refên YPJ´ê dibûn. Yek ji wan keçên kurd jî Arîn Mîrkan bû. Arîn Mîrkan, keçeka kurd ku ji Afrîna rengîn bû. Malbate wê li Afrînê bikok bû. Lê koka wan bi aşîrî, digihişt herêma botanê ya bakûrê kurdistanê jî. Malbata Arîn Mîrkan, ji ber zor û tûndûtûjîya rejima baasê, bo ku karibin xwe biparêzên û dabara xwe û mala xwe bikin, barî Helebê kiribûn. Li wir jî, dikirin ku jîyane xwe bidomên in. Li kurdistanê, domandina jîyane malbatî, pirr zehmet û zor bû. Vêca nexasim ku dibin şer de bê. Rewşa ku ew di wê de bûn, pirr zêde zor bû. Kurdistanî, ku li rojavayê kurdistanê bin, rastî zora politikayên rejima baasa Sûrî dihatin. Ku li bakûrê kurdistanê bin, rastî zora politikayên rejima tirk dihatin. Ku li rojhilatê kurdistanê bin, rastî zora politikayên rejima îranê dihatin. Ku li başûrê kurdistanê jî bin, wê zordarî û komkujîyên rejima baasê a Saddam bihatan.

Ev rewş, piştî salên 2003´an û pê de, wê li rojavayê kurdistanê, zêdetir xwe bidina dîyarkirin. Ciwanên kurd ên ku dixwestin ku bixwênin, wê zêde mafê jîyanê ji xwe re nebînin. Arîn Mîrkan, wê ciwanek ji wan ciwanên kurdistanî û kurd bê ku wê mafê jîyanê ji xwe re nebînê. Vêca nexasim ku jin bê. Arîn Mîrkan, pirr zêde dixwest ku bixwênê. Hêz xwandinê dikir. Lê di nava jîyanê de hem rewşa ku malbat di wê de bû û hem jî zorîya ku rejimê û rayadarên wê derdixistin li pêşîya jîyane wan, wê nehêle ku ciwanên weke Arîn Mîrkan jî, di xwandina xwe de zêde pêde herîn. ..

Ev jî, wê bike ku ciwanên kurd, li rêyên derketinê bigerihin. Arîn Mîrkan, wê di van salên xwe yên ciwanîyê de wê bi tekoşîna azadîya kurdistanê re di têkiliyê de bê. Wê perwerdeya xwe di nava refên

tekoşîna azadîyê bike ku biqadêne. Arîn Mîrkan jî, wusa kir. Her rewşa xwe perwerdekirinê ku ketîya destê Arîn Mîrkan de, wê kirîya ku bikarbênê. Bikarhanîya jî. Xwe perwerde kirîya. Perwerdeya ku Arîn Mîrkan di nava refên tevgera azadîya kurdistanê e digirt, wê di mejiyê wê de wê bi civate wê, dîrok, felsefe û rastîyên wê yên dîrokî re rû bi rû bihêle û bide nasîn. Ev jî, weke ku pêvajoyeka nû bû di jîyane Arîn Mîrkan de ku destpê dikir. ..

Arîn Mîrkan, piştî ku hêza parastinê a YPG´ê li rojavayê kurdistanê bo parastina kurdistanîyan derket li pêş, wê ew weke keç û jineka kurd a ciwan, di nava wê de cih bigrê û wê derkevê li pêş. Piştre jî, wê di nava baskê wê(´YPG´ê) yê jinan a YPJ´ê de pêşbikeve. Pirr zêde jî, wê derkeve li pêş. Arîn Mîrkan, bi wê xwandavanîya xwe û perwerdeya ku di nava tevgera azadîya kurdistanê de hildayî, wê weke jineka ku êdî jinên nû ên jin di çerçoveya xwe-parastina cewherî de ku perwerde dike, wê xwe bibînê. Arîn Mîrkan, di vê çerçoveyê de wê hin bi hin derkeve li pêş. Ev dema ku ji êgir bû û hin bi hin hêrîşên li ser rojava zêde dibûn, wê jinên weke Arîn Mîrkan derkevina li pêş. Hêrî Zêde wê arîn Mîrkan jî derkeve li pêş.

Piştî ku li rojavayê kurdistanê, kurdistanîyan bo ku şerê li Sûrî ê navxweyî ne pijiqiê li herêmên wan ku dest danîna li ser rêveberîya bajarên herêmên xwe, herkesekî digot ku "kurdan, şoreşek bêxwûn kir." Ev gotina rast a "kurdan, şoreşek bêxwûn kir." wê herî zêde rêveberîyên herêmê ên ku Kurdistan di nava wan de qatkirî ya wê aciz bike. Piştre jî, bo ku wê şoreşa ´bêxwûn´ ku bixwûn bikin, pêl bi pêl hêrîş li ser rojavayê kurdistanê û bajarên wê pêş dixistin.

Bi rastî jî, kurdan şoreşek bêxwûn a demokratîk kiribû. Di wê rêveberîya ku li rojavayê kurdistanê hatibû avakirin de, hemû pêkhateyên li herêmê ku weke kurdistanî û bi kurdan re dijîn, wê di rêveberîya nû ku tê avakirin de, wê care pêşî cih bigrin. Wê mafê xwe bixwe rêvebirinê bidest bixin. Wî nimînêrîya xwe bibînin. Ev jî, wê weke sedemeka din ya ku di temenê hêrîşa li wê şoreşa rojava de bê wê bûba. Çendî ku hêrîş li wê dibûn, wê keç û lawên kurd ên weke Arîn Mîrkan, wê di nava parastina cewherî de li rojava hem xalkên li herêmê biparêzên û hem jî xwe û wê jîyane wan biparêzên. Ev care pêşî bû ku van xalkên herêmê, bi destê xwe rêveberîyek avakiribûn ku xwe di wê de werênina ser ziman û dengên xwe derbixin. Li rojhilata navîn giştî, ezmûna rojava, wê weke ezmûneka nû a dîrokî ba. Ev jî, dîrokî bû.

Li herêmê, çendî ku kurdistanîyan bi wê rêveberîya xwe ya herêmî ku rêxistinîya xwe dikirin û xwe pêş dixistin, wê hêrîş jî li wê bihetana pêşxistin û bibin. Armanca wan hêrîşan jî, ew bû ku pêşîya wê pêşketin û ezmûna ku bi navê ´şoreşa rojava´ ku li herêmê ew care pêşî bû ku xalkên herêmê bidestê xwe pêşxistibûn ji holê rabikin. Bo vê yekê, hêrîşên pirr hov û xadar lê dikirin. Pêşî, li Helebê, li taxên kurdan ên weke taxên Şêx maqsûd û Eşrefîya hêrîş pêşxistin û piştre jî li herêmên din ên rojava ên weke Til-Êran, emûdê, Şerêkahniyê û hwd, hêrîşên komkujîyan kirin. Ev hêrîş, hemû jî armanca wan ew bû ku nehêlin li rojava rêveberîyek kurdistanî a xalkan pêşbikeve bû. Bi wan hêrîşan re jî, weke ku pêşîya hêrîşên mazin ên din jî divekirin. Kurdistanîyên rojavayê kurdistanê û ên li beşên din ên kurdistanê jî, ev rastî di dîtin û fahm dikirin. Bo vê yekê, wan jî, paratina cewherî pêş dixistin. Çendî ku hêrîş li rojava dikirin, ancam bidest bidest ne dixistin. Piştre, êdî bidest hêrîşên goçberkirinê ên bi armanca bêmirovkirina herêmê kirin. Xwestin ku rojava vala bikin ji mirovan. Li hemberî van hêrîşan jî, kurdistanîyan bi hêza xwe ya parastinê bi yek-laşî li hemberî wan hêrîşan sekin in.

Dema ku rejimên herêmê ên weke tirkiya û Îranê, dîtin ku wê bi vî rengê wê ancamê bidest nexistin, êdî bidest pêşxistina DAÎŞ´ê kirin. Bi politikayaka ku bi wê weke ku bixwezin ku kurdistanê ji nûva parve bikin, di bin navê ´dewleta îslamî´ de pêşxitin. Ji Musilê û li ser şengalê û Kerkûkê re û heta ku digihişt rojava û li ser Hesekê, Kobanê û Afrînê re di xatekê de xwestibûn ku DAÎŞ´ê pêş bixin ku şerê wê bi kurdan re bikê. Ev jî, temenê pêşxistina şerekî nû ê bi kurdan re bû. Bo vê yekê, bi carekê re van çeteyên hov, bidest hêrîşî li herêmên başûrê kurdistanên ên weke musil û şengalê û ên rojavayê kurdistanê ên weke hesekê û Kobanê û herêma Cizîrê kirin. Li Musil û Şengalê komkuji pêkhanîn. Piştre, çûna bi ser şoreşa rojava de. Dema ku hêrîşî rojava kirin, hêzên ku li pişt wan bûn, pirr bi bawer bûn ku wê bi ser bikevin. Di dema ku van çeteyên hov bidest hêrîşkirinê li rojava kirin, giranîya hêrîşên xwe dana bi ser Kobanê de. Sedemeka vê jî, ew bû, ku ji ber ku destpêka ´şoreşa rojava´ ji Kobanê destpêkiri bû. Ji cihê ku şoreşa rojava destpêkiri bû, dixwestin ku ji wir pêşî têkbirinê bi kurdan û kurdistanîyan bidina xwarin. Bo vê yekê, hemû hêza xwe li dora Kobanê dane hevdû û bidest hêrîşê li Kobanê kirin. Pirranîya gund û navçeyên li dora kobanê, hêzên kurdistanî ên parastinê ên YPG´ê û YPJ´ê dana valakirin bo ku jîyane sivîlan biparêzên. Piştre jî, bidest berxwedana dîrokî a Kobanê kirin. ..

Ev berxwedana dîrokî, pêşî di nava kurdan de deng vada. Roj bi roj,

çendî ku berxwedanê destpêkir û pê de çû, wê hin bi hin êdî bala cihanê bikişêne. Ti kesekî bawer ne dikir ku wê li Kobanê, berxwedanaka bi vî rengî a dîrokî were pêşxistin. Lê roj bi roj, berxwedan pêşket û dîrok nivîsand. Di rojên 16 û 17´an ên berxwedanê de wê di 7 û 8 êlûna 2014 ´an de wê li bakûrê kurdistanê jî bi yekdengî wê rabûna serpîyan bibê. Li dûv wê, wê li cihanê jî, hemû kurdistanî û dostên wan bi wan re wê rabina serpîyan û dakevina qadan û wê xwepêşandinan li darbixin bo piştgirîya bi berxwedana kobanê re. Berxwedana kobanê, êdî ´stalîngrada kurdan´ bû. Kurdan jî û cihanê jî, wusa binav dikir û şîrove li ser wê pêş dixistin.

Hêzên kurd, çendî ku hêrîş li wan dibûn, berxwedana xwe mazintir dikirin. Bi çekên destî ên piçûk li ber tank û topên mazin li berxwe didan. Hêzên ku digotin ku wê di hundurê seatekê de kobanê bixin, hefta di buhurtin lê ne dikarin ku kobanê bixin. Di nava wê berxwedana jî, Arîn Mîrkan jî, li girê Miştenûrê, weke fermandara YPJ´ê bi rêhevalên xwe re li berxwe dida. Ne dihiştin ku dijmin û çeteyên hov ji wan bi bûhûrin ku bikevina navenda bajarê kobanê de. Çeteyên DAÎŞ´ê jî, bi topbaranan navande kobanê topbaran dikirin. Top li ser topê di avêtina navenda kobanê. Lê çendî ku wusa kobanê û navenda wê, kiribûbûna bin hêrîşeka şitt û xadar de jî, ne dikarin pêde herin û bikevina nava kobanê de. Girê miştenûrê jî, weke girekî stretejîkî bû ku ji wê kobanê dihat parastin. Dema ku ev gir ketiba bin destê çeteyên DAÎŞ´ê de, êdî wê ketiban naveda kobanê de bê. Lê girê miştenûrê jî, girekî wusa bû, çendî ku hêzên çeteyên DAÎŞ´ê heta ku hatina ber wê jî, ne dikarin ku xwe li ber wê bigrin. Arîn Mîrkan û rêhevalên wê, bi bahayê canê xwe girê miştenûrê diparastin. Arîn Mîrkan jî û rêhevalên wê jî, di wê bawerî û zanînê de bûn ku ev berxwedana wan, nêvî bi nêvî parastina kobanê û pêşxistina berxwedana wê bû. Bo vê yekê bû ku çeteyên DAÎŞ´ê jî, giranîya xwe didane bi ser xistina wî girê miştenûrê de.

Çendî ku çeteyên DAÎŞ´ê bi hêzên mazin dihatina bi ser girê Miştenûrê de jî wê Arîn Mîrkan û rêhevalên wê, berxwedana xwe jî mazintir bikin. Arîn Mîrkan û çend rêhevalên wê yên jin bûn ku ew girê miştenûrê diparastin. Di roja 19´ê a berxwedana kobanê de çeteyên DAÎŞ´ê bi hêrîşên mazin giranîya xwe dana bi ser girê miştenûrê de. Arîn Mîrkan, weke fermandar, fahm dikir ku çete dixwezin ku gir bidest bixin. Lê Arîn Mîrkan jî, weke fermandar, dizanî ku dema ku ew gir bikevê wê derbeyek mazin li berxwedana kobanê bikeve. Wê gelek rêhevalên wê, pekrewan bikevin.

Piştre, çeteyên DAÎŞ´î bi hêrîşek mazin û şitt re çûna bi ser Arîn Mîrkan û rêhevalên wê de. Dijmin jî, bi rêya xayînan dizanî ku ew Arîn Mîrkan fermandara YPJ´ê ya. Bo vê yekê, wan jî bi wê bawer dikir ku dema ku wê bikujin, wê derbeyek mazin hem li YPJ´ê bixistan û hem jî wê li berxwedana kobanê bixistan. Êdî bi pêlên hêrîşen mazin û şitt di çûna bi ser girê miştenûrê de. Arîn Mîrkan û rêhevalên wê, di çeperên xwe de li berxwe didan. Çendî ku diçûna bi ser wan de, wan jî li berxwe didan. Ya ku li zora çeteyan diçû jî, ew bû ku dizanîbûn ku ew çend jin bûn û wilqasî mazin li berxwe didan. Ji ber ku hertimî, jin hatibû tafisandin. Hertimî dema ku mêr dengê xwe li wê dirakir, di cih de ew di cihê xwe de dima sekinî. Wan jî, wusa zan dikir ku wê ew dengê xwe bikin û wê ew jin jî bitirsihin. Lê ew jin êdî ne ew jinên berê bûn. Ev jinên ku bi gîyanek berxwedêr ku xwe xamilandibûn bûn. Wan li berxwe dida. Arîn Mîrkan, dizanî ku rewşa wan kritîk bû. Dem bi dem Arîn Mîrkan, weke fermandar, rêhevalên xwe ku xwe digihand wan, ji wan re bahse tekoşîn û berxwedanê dikir. Dixwest ku moralê wan xweş bilind bike. Gotinên rêber APO ji wan re dihanî ser ziman. Digot ku "yên ku şer dikin, xweşik û Azad in, ên xweşik û Azad jî, ên sipahî û tên hêzkirin" in. Vê jina kurd, wateya van gotinan, di mejiyê xwe de kola bû. Bi wê têgînê li berxwe didan. Diçûna bi ser dijminê xwe de. Weke ku bixwezin ku heyf û tola hezaran salan hildin li berxwedidan.
Arîn Mîrkan, weke jineka bizane, dizanî ku wateya wê berxwedana wan çî ya û çendî mazin a. Her wusa, wê dîrok zanî bû. Dîroka civate xwe û ya herêma xwe, zanîbû. Ji dema hûrî û mîtannîyan û heta ku digihişt wê dema wan, wê dîroka kurdistanê xwandibû û derxistibû têgihiştinê.

Arîn Mîrkan, di wê dema ku bi rêhevalên xwe re li berxwe dida de, dihizirî. Di wê kêlîkê de, çend rêhevalên wê pirr biqadr, gihiştin şahadetê jî. Rewşa wan jî, di ancama hêrîşên pirr şitt ên li serê girê miştenûrê de nexweş bûbû. Arîn Mîrkan dihizirî ku çi bikira wê xwe ji wê rewşa nexweş xilas bikiran. Lê Arîn Mîrkan jî, di wê hiş û zanînê de bû, ku çûbûba bila bûba lê divîyabû ku girê miştenûrê neketiba destê çeteyên DAÎŞ´ê de. Ew jî, di wê zanîn û biryardarîyê de bû. Dema ku li dora xwe dinerê, dibînê ku çend rêhevalên wê ên jin, weke ku di xewek şêrîn de xwe dirêjkiribin û razahî bin, dirêjkirî na, dihatina berçavên wê. Arîn Mîrkan, weke dayîkekê ku dayîka wan bê, bi çavna bihêst li wan nerî. Dema ku dinerî, carna ew hîs bi wê re çê dibû ku ew rêhevalên wê ên dirêjkirî, razahî na. Wê jî, di hundurê xwe de herê nedikir ku ev jinên wilqasî xweşik û jinmêr û çengawar, bi destê çend iblisên sedsalê werina

qatilkirin. Arîn Mîrkan, ji 45 rêhevalên wê, çend rêhevalên wê mabû bûn. Lê yên ku mabûn jî, ser 17´an re bûn. Arîn Mîrkan, weke dayikekê, dixwest ku heyf û tola wan keçikên xwe, rêhevalên xwe û xwûşkên xwe hilde. Çeteyên DAÎŞî jî, hin bi hin, dema ku fahmkiribûn ku çend ji rêhevalên Arîn Mîrkan şehîdkiribûn, êdî digotin ku ´me ew xilaskirin´ û bi wê hêstê zor dabûbûna hêrîşê ku herina serê girê miştenûrê. ..

Çeteyên DAÎŞ´ê , çendî ku hatibûbûna ber girê miştenûrê jî, ne dikarin ku herina sêrî. Arîn Mîrkan, di serê xwe de hizirî, ku wê di wê kêlîkê de tiştek nekiriba, wê ew jî û rêhevalên wê ên din jî biketa û wê girê miştanûrê jî biketa. Ev jî, wê bûba derbeyek mazin li berxwedana kobanê giştî jî. Bo vê yekê Arîn Mîrkan, di serê xwe de planak çêkir, ji rêhevalên xwe yên sax mana re got ku ´ezê, bi ber wan ve herim û bila ew we nebînin. Ezê, weke ku xwe radestî wan bikin bi ber van ve herim. Dema ku ez gihiştima wan, ezê çalakiya fedeyîyana bikin.´ Rêhevalên wê pêşî, ev fikrê Arîn Mîrkan herê nekirin, Yên ku ev hizrên Arîn Mîrkan bihîstin, ew red kirin û xwe pêşnîyarkirin. Arîn Mîrkan, ji wan re weke dayikekê bû. Wan hizir ne dikir ku Arîn Mîrkan were şehîdkirin. Lê Arîn Mîrkan, di gotina xwe de pirr bi bîryar bû. Kê çi got û kî li hemberê wê û gotina wê sekinî jî, Arîn Mîrkan bi biryardarîya ew da sekinandin. Arîn Mîrkan, Planak xilaskirina girê miştenûrê di serê xwe de çêkiribû. Piştî ku hemû rêhevalên wê bêdeng man li ber wê, êdî wê ji rêhevalên xwe re got ku "dema ku ez gihiştim dijmin û min çalakiya xwe pêkhanî, win jî bi carekê re wan di bin gûlabaranê de bihêlin. Wan bi tememî ji gir dûr kin. Li ser gotina Arîn Mîrkan, herkesekî xwe, ji kêlîkeka dîrokî re amede kir. Ji zêde derfeta wan jî nebû ku biaxifin û bidina berhevdû. Arîn Mîrkan, care dawî bi dengê xwe yê tişî li pêşîya rêhevalên xwe axift û ev gotin ji wan re hanîn ser ziman; ...

" Em jin in û şoreşa rojava, şoreşa me ya. Em jin in, di destpêkê de Îştar û Lîllîth bûn. Pîroz û xwedewend bûn. Jîyane bû û me afirand. Me dayiktî kir û parast. Em jîyan in. Em hêz û qûdreta afirandina jîyanê ne. Lê me çi dît û çi nedît. Me gelek dewr û dewranên biêş bûhûrand in. Dîroka me, weke dilê me biêş a. Em jinên kurdistanê ne. Em xwedîyê dîrokek pirr biêş û kevn in. Lê me dîrok nivîsandîya. Di destpêka şariştanîyê de dayika îştar em in, ku bo maf û azadîya xwe têdikoşê. Di dema hûrî û mîtannîyan de dayika 'kûpapa´ ne û xwedewend in. Em jinên kurd in. Li welatê me û li ser serê me, êş û zordestî heya. Bindestî û zilm heya. Ez, van gotinan li ser navê hemû jinên di bin navê ´namûs´ê de hatina qatil kirin ji we re dibêjim. Em li vir, li ser navê hemû jinên bidil êş li berxwe

didin. Em li ber hemû zordestî û bindestîya dîrokê têdikoşîn. Em, li hemberî çanda pênc-hezar salî a koledarî û metinger têdikoşin. Em, jinên berxwedêr in. Em jin in û em dayik in. Ev berxwedana me, di rê û xate YPJ´ê de ya û şehîde şoreşa rojava a yekem Silava ya.""

Arîn Mîrkan, weke ku ev gotinên wê ên dawîyê bûn ji rêhevalên wê re di wê kêlîkê de. Arîn Mîrkan, ev gotin ji rêhevalên xwe re gotin û êdî ma sekinî di cihê xwe de bihizir. Rêhevalên wê, weke ku di wê kêlîkê de dengên gûlayan ne dihatina gûhê wan, wusa li ber gotinên Arîn Mîrkan ji xwe çûbûbû bûn. Piştî ku Arîn Mîrkan gotinên xwe bidawîkirin û pê de, ew jî weke ku werina xwe û ji xewekê şîyar bibin li wan hat. Piştre, tenê bi nerînên xwe yên bêdeng re li Arîn Mîrkan nerîn. û hwd. ...

Arîn Mîrkan, piştre çantayê xwe yê mil da rêhevalekî xwe. Piştre, xwe ji çalakiya xwe ya dîrokî re amede kir. Ew çalakiya wê, wê weke çalakiyeka li ser navê hemû hemû jin û xalkên bindest û li hemberî dîroka metingerîyê ba. Wê ew çalakiya wê, li ser navê jinên ku hatina qatilkirin ba. Arîn Mîrkan, di nava axiftina xwe de gotinaka din jî gotibû, Ew jî ew bû ku "şoreşa rojava, şoreşa jinê ya û wê ti kesek nikaribê wê bitafisêne" bû. Ev gotina Arîn Mîrkan, di mejiyê herkesekî de naqş bûbû. Piştre Arîn Mîrkan, ji çepere xwe rêhevalên xwe yên ku wan bi wê re şer dikir ji wir wan dûr kir. Piştre wê jî, weke ku gûleyên wê bidawî bûbûn ma sekinî. Piştre bi awayekî ku xwe amede kirî, destê xwe rakir. Çeteyan jî, wusa bawer kiribû ku ew ketîya. Êdî bi awayekî bi komî bi carekê bi ber wê û cihê wê ku lê ya ve bidest çûyinê kirin. Dema ku ew nêzîkî cihê Arîn Mîrkanê bûn jî, Arîn Mîrkanê bi carekê ji cihê xwe rabû û bi ber wan ve bazdide. Dema ku ew bi ber van ve bazdide jî, gûlan li wan dibarêne. Dema ku gihişt nava wan bi carekê re bombayên ku li ser xwe amede kiribûn ditaqêne di nava wan de û li wir, pirranîya çeteyên dide ardê. Dema ku rêhevalên dîtin ku Arîn Mîrkan bombayên li ser xwe taqandin, êdî wan jî bi carekê weke ku Arîn Mîrkanê ji wan re gotibû, bidest gûla raşandina li ser wan kirin. Li wir, bi carekê re çeteyên DAÎŞ´ê nizanin ku rastî çi tên. Hemû çeteyên ku hatina girê miştenûrê, ew çend jin wan paqij dikin. Çalakiya Arîn mîrkanê ku girê miştenûrê ji ketina xilas dike û bi wê re jî berxwedana kobanê ji xwarina derbeyekê mazin xilas dike jî, ev bû. ...

Çalakîya Arîn Mirkan dema ku di nava rêhevalên wê de tê bihîstin, wê bandûraka mazin li ser wan bike. Wê çalakîya Arîn Mîrkan, bike ku hemû rêhevalên wê, bi can êdî ku bikevina nava tekoşînê de. Bi wê hêsta ku tolê ji dîroka metingerîyê dihildin, wê bidest şer û tekoşîna

berxwedana kobanê bikin. Bi wê çalakiya xwe Arîn Mîrkan, bû navê berxwedana jinên kurd li kurdistanê di nava berxwedana kobanê a dîrokî de di bin navê YPJ´ê de.

.....

## KU MIROV LI KURDISTANÊ JIN BÊ

Herêma çolemergê, heta roja me jî, weke herêmeka kurdistanê ku li wê aşîrî heya û serdest a. Lê bi wê re jî, li herêma çolemergê, kevneşopî, çand û hûnera kurdistanî, bi rengînîya xwe heta roja me xwe dihêne. Di nava jîyane aşîrî de jinbûn, weke mijaraka herî giring a ku mirov wê werêne ser ziman. Ji aliyê civatî ve ku bi aliyê dîrokîya kurdistanê ve dema ku mirov werêne ser ziman, mirov wê jineka bi nirx werêne ser ziman.

Lê di nava jîyane aşîrî de, piştî ku civate kurdistanê, serdestîya xwe windakir û pê de jî, wê rewşa jinê hebûna xwe domand. Di nava wê jîyanê de jin, bi gelek aliyên xwe mirov dikarê wê werêne ser ziman. Li gorî min û hizra min, ku gelek ne azad bê, ez nikarim bêjim ku ez jî azad im.

Di nava jîyane civatî a kurd de, piştî ku bindestbûn bû û pê de, wê tûndûtûjî li ser serê jinê hin bi hin pêş dikeve. Li ser mejiyê jinê, pergal, pirr zêde dileyize. Hê jî dileyizê. Bi teybetî, li herême me ya Çolemergê jin, dema ku mirov bahse wê bike, bi dualiyan mirov dikarê bahse wê bike. Aliyek, bi aliyê wê yê çolemergê û jinîtîya wê ve ya. Ji vê aliyê ve, bi çand, dîrok û kevneşopîya wê re mirov dikarê bahse jinê bike. Lê bi aliyê wê yê din re jî, dema ku mirov bahse jinê dike, bi gelek sedeman re ku mirov dikarê werêne ser ziman, tûndûtûjîya li ser serê jinê ya. Jin, pêşî ji malbatê tûndûtûjiyê dibînê. Piştre jî, ji pergalê dibînê.

Mirov dikarê ji gelek aliyan ve bahse tûndûtûjîya li ser serê jinê bike. Jîyane kurdistanê, pergalê kirîya weke jîyaneka bi tûndûtûjî. Di her qad û warê de di wê de tûndûtûjîyê pêş dixe.

Tûndûtûjîya li ser jinê, bi pergalê re zêdetir bûya. Bi teybetî, tûndûtûjîya li ser serê jinê, bi awayekî sistamatîkî bûya. Jîyan, di kurdistanê de ji jinê hatîya standin. Ez dikarimm bêjim ku kevneşopî, çand û hûnera xwe ya rast najî. Ji ber vê yekê, hertimî dema ku mirov dihizirê, mirov kêmesîyekê bi xwe re û bi keseyetîya xwe re hîs dike. Ew

kêmesî, piştî ku tevgerîya azadîya kurdistanê pêşket û bi wê re têgîna azadîya jinê û felsefeya wê di nava civate kurd de pêşket û pê de, êdî min di xwe de ev zêdetir hîs dikir. Ji ber ku min bi tekoşîna azadîya kurdistanê û ya serok re, rastî dida nîşandin. Çendî ku mirov ew dijî û fahm dikir, mirov rastîya xwe ya esasî baştir hîs dike. Bi çand û kevneşopîyê re rewşa jinê, di mejiyê min de hertimî bûya weke mijaraka ku min li ser wê nîqaş meşandîya. Di çerçoveyaka rast de fahmkirinaka jinê bi civatê, çandê û kevneşopîyên civatî ên dîrokî re weke aliyekî giring a. Dîrok, gelek tiştan bi têgînî dide me. Bi başî û ne başîyan re mirov fahm dike.. Mirov, wan şîrove dike.. Dahûr dike. Bi wê re rastîyê, mirov kifş dike. Di vê çerçoveyê de ji hevdû cudakirina rastiyê û ne rastiyê, weke aliyekî giring ê vê têgînê ya.

Mirov, hertiştî di nava jîyane kurdistanê û tekoşîya azadiyê de bi keseyetîya xwe re hin bi hin kifş dike. Mirovekê ku ji dil di nava nêzîkatîya de bê, hem li xwe û keseyetîya xwe û hem jî li hewirdora xwe bê, wê ew mirov weke mirovekî herî xwe ku xwe perwerde dike bê û hem jî wê çerçoveya xwe perwerde dike bê. Jîyane me kurdîstaniyan, ev rastî, pirr baş da fahmkirin û an jî kû dide fahmkirin.

Jina kurd, çend carî, pirsa gotina ´fahmkirinê´ li xwe kirîya´. Wê çawa gotina fahmkirinê fahm bike` Wê çawa hilde li dest? Weke van pirsan mirov dikarê gelek pirsan bike. Li ser wan re mirov dikarê têgîneka rast bi xwe re hem di nava malbatê de û hem jî di nava jîyane civate de fahm bike. Bidest xistina fahmkirinaka rast, wê mirov bi xwe re bike nava tekoşîna wê ya azadiyê de jî. Minaqa vê jî, ew a ku çendî ku mirov di nava tekoşînê de fahm dike, mirov hem afrîner dibe û hem jî tekoşînê mazin dike. Li kurdistanê, weke ku serokatî dibêje, ´mirov, li kurdistanê, hertiştî di kirinê de dibînê û fahm dike.´ Ya min jî, wusa bûya. Bi gotinakê mirov dest pê dike. Piştre dem bi dem li wê gotinê zêde dibe. Li wê gotinê, hin bi hin zêdetir dibê. Bi wê re jî, keseyet, bi demê re pêş dikeve. Diafirê. Piştî ku keseyet afirî û pê de, wê êdî xwe naskirin û bi wê re jî fahmkirin pêş bikeve. Fahmkirin, temenê hertiştî ya.

Jina kurd li kurdistanê, hertimî pêşengtî kirîya. Di nava tekoşîne de jî ya herî fedakar ew bûya. Wê xwe daya li pêş. Minaqa Arîn Mîrkan li berçav a. Arîn Mirkan, minaqa, bizaneyî ya sedsala 21´ê a jina kurd a ku di nava tekoşînê de pêşketîya ya. Ez dikarim weke manîfestoya felsefîkî ya jina kurd jî werênima ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku ez werênima ser ziman ku jina kurd, xwe afirandîya.

Mijara me, wê li ser jina kurd a li Çolemergê bê. Rewşa jina kurd a li çolemergê bê. Rewşa jina kurd a li çolemergê, divê ku mirov di vê perspektifê ve lê binerê û wê fahm bike û werêne ser ziman. Têgîna berxwedanîya jina kurd a li Çolemergê bi kevneşopî heya. Bo vê yekê, pergalê(rejima tirk) jî, ev aliyê jina kurd a li çolemergê kifşkirîya. Bi teybetî, di nava ciwanên jin de, wê çawa pîsîtiyê pêş bixin, li ser wê dixabitin.

Li herêma çolemergê, bo ku wê civatîtîya kurdî ji hevdû belav bikin, pergalê destavêtîya ciwanên jin. Bi rêya li xwe ´aşîq kirinê´ bê û bi rengên din ên xistinê bê, sîxûrî di nava wan de pêşxistîya. Ev rewş, weke rewşna teybet in, ên ku divê ku mirov li ser wan bisekinê.

Bi teybetî, ji salên 1990´î û pê de, ciwanên ku nezanin, wan wê çawa bixabinin, wê bi rêya qizinckirinê bidest bixin. Piştre wê, bi rêyên şantajê û hwd, wê bikina sîxor. Di vê çerçoveyê de rejima tirk, hizir dikir, jinê bi lawitêne û bi wê re civatê bixe. Pêşî jin, di bin navê ´evîn´, ´hêzkirin´, ´têkilî´ û hwd, li ser van gotinan re, têkilî bi ciwanan jin re didanîn û ew dixapandin. Li ser wan re rejim, dikeve malan de. Andam(rayadar)ên rejimê, bi ciwanên jin re dikevina têkiliyê de, wan ji aliyê wan ê herî zayif ve bi xwe ve girêdidin.

Gelek ciwanên jin, bi vî rengî, li herêmê hatina xapandin, di bin navê ´hêzkirinê´ de. Piştre, ew ciwan, dijmin, bi wan re têkilî danîna, û ew piştre ew têkilîya xwe ya bi wan re dikirina ´wîdîyo´yan de û ew weke ´şantajê´ bikardihanîn. Êdî, digotina wan ciwanên jin ”ku win tişta ku em dibêjin weke me nekin, emê van wîdîyoyê we di internettê de biweşênin. Ev alîyê civate kurd ku li rûmeta xwe pirr dihizirê, weke ku bi vî rengî li hemberê wan dihat bikarhanîn.

Bi teybetî, malbat, kifş dikirin. Bandûra malbatan kifş dikirin. Bi teybetî, wê destavêtiban, ciwanên jin ên wan malbatan. Bi wê re, wê hewldaban ku biketan, nava malbatê de. Wê malbat, bi vî rengî ji navikê bikiran bin kontrolê de.

Li herêmê, gelek malbatên kurd ên li herêmê, bivî rengî bi ´şantajê´ bi xwe ve girêdana. Tişta ku xwestina bi wan kirina. Heta ku, kirina cerdewan jî. Bi teybetî, malbatên kurd, li ser têkiliyên bi vî rengê ên bi andamên wan re ku dihatin danîn re li ser wan têkiiliyan re ew dixistin. Kontrola xwe li ser wan çê dikirin. Malbatên mazin ên ku bi dewletê re kar dikirin, gelek jii wan, di van rengan de û bi rengna din ku tişt bi andamên malbatên wan kirina û weke ´şantajê´ li hemberê wan hatina

bikarhanîn. Li ser wê re ew didana ardê. Tişta ku dixwestin bi wan didana kirin.

Minaqên bi vî rengî pirr çêbûna ku pêşî, ciwanên jin ên malbatan dişopandin. Diçin kûderê û li kûderê dimênin. Hemû tişt di derbarê wan de fêrbûn. Piştre, ew hemû li cem xwe qayd dikirin. Piştî ku qayd diikirin, dibakirina wan li qarakolan. Di qarakolan de, li ser wan zanyarîyan re ew dixistin. Piştî ku dixistin, piştre, ew weke ´şantajê´ li hemberê wan bikardihanîn.

Bi teybetî, piştî ku tekoşîna azadiya kurd li kurdistanê, bidest tekoşîan çekdarî kir û pê de, êdî ev leyistikên dijmin li ser malbatan zêdetir bûn. Hinekî jî, ev herêm weke herêmna teybet bûn. Hem herêmên ber sînor bûn. Hem jî, herêmna ku di wan de çanda kurdî pirr zêde pêşketî bû. Di vê çerçoveyê de pêşî li ser jinê re xwestin ku wê ji hevdû bifelişênin. Sîxûrî, xistin û kontrolkirina malbatan, di vê çerçoveyê de pêşî xistina wan ya bin kontrolê de bi wan têkiliyên wan ên bi ciwanên jin ên kurd re dikirin. Minaq, di sale 2002-3´an de oparasyonên ´fihoşê´ ku li çolemergê dikirin û keta çapameniyê jî, di wan de hemû kesên ku ew fihuşî didan kirin, polîs bûn. Xabatkarên pergalê bûn. Ev ne tiştekî vêşarî jî ya, ku ketîya çapameniyê de jî. Gelek ciwanên ku di çapameniyê de diaxiftin piştî van rewşan, ku bahse xistina xwe ya ji aliyê polîsan ve dikirin, di vê çerçoveyê de bahse kirinên rayadarên pergalê dikirin. Di wê çerçoveyê de, ez divê ku vê jî bibêjim ku ciwanên jin, ku weke ´hemşîre´ jî li nexweşxaneyan kar dikirin, bi wan re têkilî didanîn û weke ´têkilî´ û hwd, dakû karibin ku ji wan her agahiyê ji nava nexweşxaneyê û hewirdora wê bidest bixin û kesên ku welatparêz jî kifş bikin. Bi vê rêyê, dixwestin ku kî alîkarî dide û an jî kû kî baş bû, kifş bikin û piştre bigrin. Ev rewş, hemû, weke rewşna bi plan, ku rayadarên rejimê li herêmê di nava jîyane herêmê de dikirin bûn. Jîyane herêmê, di vê çerçoveyê de dikirina bin kontrolê de. Dijmin, li ser ciwanên jin re, daxilî jîyane malbatên herêmê dibû. Ew dixistin. Û hertiştê xwe bi wan dida kirin.

„

**”Bo ku civate tûna bikin, destdirêjî jîyane jina kurd dikin.”**

Rejima tirk, hertimî bo ku civate kurd tûna bike, jina kurd kirîya armanc. Hertimî hêrîşî wê kirîya. Rejima tirk, weke rêyeka ji hevdû xistina civate kurd û tûna kirina wê, kontrolkirina jina kurd kirîya armanc. Di vê çerçoveyê de gelek minaq hena. Minaq, di sale 2014´an de

Şaradarê AKP´yî ê Rîzê Halîl Bakircî, dibêje «herin, ji rojhilat jina xwe ya duyem ji kurdan bênin.» Yanî, weke «hewî»´yê li wê dihizirê. Li vir, di aslê xwe de, armanc, di çerçoveya hêrîşkirina bîolojikî a li civate kurd de dihê kirn. Di vê çerçoveyê de bi teybetî, pirranîya hêrîşên ku li civate kurd dihên kirin, jina kurd di navende wan de ya.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku mijara ´kêm hanîna dunyê a zarokan di nava kurdan de» jî, weke projeyeka MGK´ê bû ku AKP´ê di hinek waran de kiribû merîyetê de. Her wusa, di vê çerçoveyê de mijara «zêdebûna civate kurd», weke mijaraka «telûka» jî, MGK´ê hildabûbûna rojava xwe. Ji xwe, faşîştên weke Halîl bakirci, li ser van politikayên dewşîrmekirinê ên li ser jinên ciwan ên kurd re ku kirina meriyetê de li ser wê re van gotinan dibêjin. Serokfermandar YJA-STAR Zozan cewlîk jî, bal kişandibû li ser vê rewşê ku çawa li ser civate kurd dihê leyistin.

Zozan çewlîk, hanîbû ser ziman ku di bin navê «Încîyên sûkê» de ku dixwezin ku keçên kurd, bikina sîxor, polîs û hwd, ku di vê çerçoveyê de jina kurd, li dijî civate kurd bikarbênin. Di vê çerçoveyê de jina kurd, weke laşê wê weke ku kirina armanca vê projeya tûna kirina civate kurd de.

Her wusa, weke ku Zozan cewlîk jî dihêne ser ziman, di nivîsa xwe ya ku di Azadîya welat´ de ku di 10 ´**kewçera** 2011´an de ku di vê nivîsa ku me ji wê minaq da de ku bahse ´încîyên sûkê´ dike de, di heman nivîsê de dihêne ser ziman ku çawa ku «di rewşê ku di bin navê aşqê de dixaapênin», û hwd, weke van gelek rewş hena. Lê li vir, divê ku ez vê jî bibêjim ku weke Zozan çewlîk jî dibêje, herême çolemergê weke «herêmek pîlot» ji van kirinan re hatîya bijartin.

Piştre, ku dem têve diçê û tê heta roja me, ya sale 2015´an de jî, mirov heman rewşê dibînê. Keçên kurd, di bin navê «aşqê» û hwd dixapênin. Wan digirina wîdîyan û ji wan re dibêjin ku «win, tişta ku weke ku em dibêjin ku win nekin, emê vê wîdîya we bidina malbate we.» Yanî dibêjin « ku win weke me nekin, emê di internettê de biweşênin.» Di vê çerçoveyê de wan bi şantajê, di xapênin. Gelek keçên kurd, ku di dem û dîrokên cûda ku dawî li jîyane xwe hanîna bi «întîxarê» di vê çerçoveyê de serborîyên wan hena.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku jina kurd, weke ku çawa, di serî de di armanca hêrîşan de ya. Li vir, divê ku mirov mijarên tecewûzê ên ku rayadarên rejimê û leşker ên li kurdistanê dikin jî li vir bibîr bike. Ev hemû di vê çerçoveyê de bi plan, li ser jina kurd re li dijî

civate kurd tên kirin. Bi teybetî, gelek «mirovên teybet» ku weke ´ên şerê teybet in´, weke mirovna asayî dikevina nava jîyanê û bi ciwanan re weke ciwanan tevdigerihin. Piştre, weke ku «hêz» wan bikin, dibêjin «em hêz we dikin.» Di vê çerçoveyê de wan, dixapênin. Piştre jî, wan dibina malên xwe. Wan dikişênina wîdîyan de, bi wan re êdî wan şantaj dikin. Ew jî, êdî bi wê rengê, weke ku hatin xistin li wan tê. Di vê rewşê û çerçoveyê de, ev jinên ciwan ên kurd, yan wê întîxar bikin û dawî li jîyane xwe bênin bo ku ji wê rewşê xilas bibinin û yan jî, wê qabûl bikin û tişta ku ew dibêjin wê weke wan bikin. Û wê bibina sînorê wan. Yanî, di vê çerçoveyê de dikevina xafka wan de.

Gelek jinên ciwan ên kurd li kurdistanê, di vê çerçoveyê de hatina xapandin. Her wusa, gelek ji wan(jinên kurd ên ciwan) ên ku ji kurdistanê ku goçî metropolên tirkiya kirina jî, di vê çerçoveyê de dikevina nava lapên wan de. Yanî, di vê çerçoveyê de weke ku jinên ciwan ên kurd, di çerçoveyek armancek teybet de, dihên xistin armanc. Di vê çerçoveyê de divê ku ez vê jî bibêjim ku politikayên li ser jinê bi gelek rengên din jî hena. Bi teybetî li herêma çolemergê, divê ku mirov vê jî werêne ser ziman ku ji aliyê bîolojikî jî ku gelek mudahaleyên li jinê ku bo bûna zarokan li laşê jinê jî kirina hena. Ev jî, di nava xalkê de pirr zêde bahse wan tê kirin.Em divê ku hinekî li ser vê jî bisekin in.

Bi teybetê divê warê de ev tê gotin ku gelek jinên kurd, ku dema ku diçina nexweşxaneyan, rastî hinek mudahaleyên bîolojikî tên, bo ku zaroyên wan çê nebin. Ev jî, bi awayekî vêşarî tê kirin. Her wusa, di nava jinan de bi teybetê, bahse «derzîyekê» ku di bin navê hinek nexweşîyên din de ku li jinan dixin,» ku ev derzî, êdî qisirtiyê pêş dixe ku êdî zarok çênebin. Yan jî, zarokên ku çê bibin, yan ji roja ku di bin de bi hinek pirsgirêkan re werina dûnyê û yan jî, piştî ku bûn bi çend salan û yan jî, di demna xwe yên ciwanîyê de ku rastiyê hinek nexweşîyên ku keseyetîya wan ji dest bixe tên. Di vê çerçoveyê de, di nava xalkê de întîbayaka mazin bi vegotinî heya. Her wusa, gelek mirovên ku bi xwe çûna nexweşxane, di vê çerçoveyê de hanîna ser ziman. Em divê ku gotina van mirovan jî, weke minaq û birhan li vir bidina nîşandin.

Rewşa jinê, di vê çerçoveyê de di çerçoveya hinek politikayên dewletê de lê tê nerîn. Piştî ku ji nava MGK´ê, bahse «zêdebûna hijmara andamên civate kurd» hat kirin û pê de, di vê çerçoveyê de hinek politikayên ku li ser laşê jinê bi awayê biolojikê hatina pêşxistin. Întîbayaka bi vî rengî, bi teybetî, di salên 2013´n 2014´an û hwd de, pirr zêde derketina li pêş. Piştre, ji xwe, hin plan û politikayên dewletê li ser

hijmara kurdan derket li holê. Plana, 2024an jî hebû. Heta ku di vê çerçoveyê de di nava belgeyên dewletê de derketibû li holê û hatibû ser ziman ku «hijmara kurdan, wê di sale 2024´an de zêdetir bibe.» Di vê çerçoveyê de wê çawa kêm bikin, li ser wê plan, proje û politika pêşxistina. Li ser navê politikayên civakî, politikayên kêmkirinê êdî pêşxistin. Ev planên dewletê ên li ser hijmara kurd, di çapameniya tirk û kurd de jî cih girt. Di vê çerçoveyê de, weke ku di heman rewşê de bû, herêma çolemergê û botanê, weke herêmna «pîlot» hatina bijartin û li wan di bin navê projeyên civatî» û «projeyên jinê» de hatina sekinin.

Politikayên li ser jina kurd, di vê çerçoveyê de dema ku ez li wê dihizirim, di dema komkujiya Dersimê de tişta ku hanîbûbûna serê jinên ciwan ên kurd tê berbîra min. Di vê demê de jî, gelek jinên kurd ên ciwan, di dema komkujiyê de berhevkiribûn û biribûbûna rojavayê tirkiyê û firotibûbûna malbatên leşker û hwd. Di wê çerçoveyê de jî, gelek ji wan bi tirkan re hatibûbûna zewicandin.

Li vir, divê ku ez vê jî bibêjim ku di vê çerçoveya vê politikaya jenosîdê a li ser serê civate kurd de divê ku em li van politikayên rejimê ên li ser jinê binerin. Jinên dersimî, gelek ji wan di dema komkujiyê de hatibûbûna windakirin. Ew jinê ciwan ên kurd ku ji dersimê hatibûbûna birin. Piştre hatibûbûna windakirin. Heta dema me jî, ti kesek li ser wan ne xwediyê ti agahiyê ya. Li ser navê wan jinên ciwan ên kurd ên dersimê, ´belgefilmek» jî bi navê «keçên dersimê ên windayî» hatibû çêkirin. Di vê belgefilmê de, aqûbeta wan keçên kurd ên dersimî hatibû lêpirsîn. Jina kurd, bi gelek awayan di vê çerçoveyê de di armanca hêrîşan de ya. Weke ku çawa ku di wan demên buhûrî ên weke di dema komkujiya dersimê de bû, di vê demê de jî, bi proje, plan û politikayên nû, bi heman zihniyetê politika li ser jina kurd hatina pêşxistin.

Politikayên rejimê, ên tûna kirina civate kurd, ji ser jinê destpê dikin. Di dema Hikimetên AKP´ê de, ev politika zêdetirî hatina pêşxistin û hatina kirin li meriyetê de. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku jina kurd, di dema hikimetên AKP´ê de zêdetirî bûya armanca politikayên tûnakirinê.

Hikimetên AKP´, aliyê civaknasî ku li ser olê û camaatan re kirîya bin kontrolê re ew tenê aliyekî piçûk ê li berçav a. Lê divê ku mirov politikayên rejimê ên li ser jinê tenê bi van aliyan re bi sînor ne hizirê. Ji wê zêdetirî jî hena. Jina kurd, bo ku hebûna civate kurd, hem were ji hevdû felişandin û hem jî pêşîya pêşketina wê were girtin, bi teybetî jina kurd kirina armanc di van çerçoveyên politikayên xistinê de.

Rejimê, bi hezaran ´mirovên şerê teybet´, di bin gelek navan de şandina nava kurdan. Her wusa, weke mirovna ku heya wan ji tiştekî tûnayî tevdigerihin. Bi wê rengê, pêşî dixwezin ku têkiliyên bi mirovên di nava civatê de dênin. Bi teybetî jî, di armanca van kesan de jinên ciwan ên kurd hena. Yan, wê di nava civate kurd de wan bi hinek şêweyên weke rût û ankû şêwayna din ku wan dikina wîdîyo de û şantajê li wan dikin ku bikarbênin weke sîxûr. Yan jî ku wan ji kurdistanê bikişênina rojavayê tirkiya û li wir, wan di nava jîyanek ´xirabûyî a yoz" de bicih bikin. Di vê çerçoveyê de armanca pêşî ew a ku ppêşîya hizirkirina wê jinê ku li civate wê bigrin a. Armanca dûyemin, ew a ku wê jinê bikina bin kontrolê de ya. Armanca sêyemin, ew a ku wê jinê ji civate wê û rastîya wê dûr bikin a. Armanca çaremin jî, ew a ku wê jinê, êdî di vê çerçoveyê de bikina xizmetna xwe yên din de.. Li ser wê re jî, wê çawa bikin, hertiştî dihizirin. Jinên ciwan ên kurd, bi teybetî, ên ku rewşa wann ya aborî kêm a, wan dikin ku bişênina nava rewşê bi vî rengî. Di serî de, di nava jinên ciwan de du beş, weke armancên sereka na. Beşa yekem, a malbatê ku rewşa wan ya aborî ne zêde baş in a. beşa duyem jî weke ku li herêmên weke çolemergê û botanê dibê ku ji malbatên ku dixwezin ku wan bikina bin kontrolê û bikarbênin de ji malbatên wan keç jinên ciwan dinaqênin û wan dişopênin û bi wê şopandinê re hertiştî di derbarê wan de fêr dibin û piştre jî, wan dixin. Her wusa di vê çerçoveyê de diçina bi ser civate kurd de. Herêma çolemergê, bi teybetê jî jina kurd a çolemergeyî, weke armancek sereka ya van politikayên sereka ên xistinê na. Polis, weke bi cilên sivîl, diçê dike ku bi wan re pêşî weke ku "hevaltiyê" bike. Lê di aslê xwe de, di vê çerçoveyê de wê çawa wan bixe di wê çerçoveyê li gorî politikayên xwe nêzîk dibin. Gelek jinên ciwan ên vê herêmê, di vê çerçoveyê de ketina nava lapên wan polisên sivîl û ankû ´mirovên şerê teybet" de. Piştre bi wan re têkilî danîna. Li ser wê têkiliyê re ew xistina. Weke mînaq jî, oparasyona ´fihûşê´ ku li herêmên çolemergê ku hatibû kirin û di wê de yên ku ev dikirin ku hemû polis bûn ku derket li holê bû.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku dewlet û rayadarên wê, van kiryaran dike. Lê piştre weke ku li herêmê wan oparasyon kirî dide nîşandin. Armanc, pêşî ku navê herêmê bi vî rengî bi bikina rojevê de. Armanca duyem jî, ku weke rêbazekî hêrîşkirinê ê bi destê dewletê jî mirov dikarê werêne ser ziman.

"

**Bi têgîna ”zêdebûna civate kurd” ya MGK´ê ku weke ´metirsîyekê ´ dihêne ser ziman re ´zêdebûna mirina zarokên kurd´ li kurdistanê.** ..

Li vir, divê ku ez li ser gûmanaka pirr xort ya di serê her kurdan de ku heya, bahse rewşekê bikim. Bi teybetî, li kurdistanê di nava kurdan de heta roja me jî, mirina zarokan pirr zêde heya. Her sal, bi deh hezaran zarokên kurd, hê ku di zikê dayika xwe de na ku hê ne hatiina dûnyê, dimirin. Bi heman rengî bi deh hezaran zarok, di dema ku dihên dûnyê de jîyane xwe ji dest didin. Dîsa bi heman rengî, bi deh hezaran zarokên kurd, piştî ku hatina dûnyê, ji roja ku hatina dûnyê û heta pêncsalîya xwe dijîn û piştre jîyane xwe ji dest didin.

Ev rewş û gelek rewşên din hena ku divê ku mirov werêne ser ziman in. Ji salên 1990´î û pê de, rayadarên dewletê mal bi mal li malên kurdan digerîyan û tembîh li wan dikirin ku zarokan newênina dûnyê.Heta ku ew mirovên ku mal bi mal digerîyan, zor didan jinên kurd ku ´habên ku pêşî çêbûna zarokan digrin´ belaş jî didana wan. Her wusa, gelek tiştên din jî, ku wan jinên kurd ku pirranîya wan ne dizanîn didan wan ku bikar bênin. Ji wan re digotin ku ”ev ji we re baş in bo tendûrîstîya we.” Jinên ku dibistan ne xweandina bi van gotinan bawer dikirin û ew dermanên ku wan didana wan bikardihanîn. Piştre jî, li ser wan dermanan re, weke ku heta roja me, di nava xalkê de tê ser ziman bi girseyî, ´qisirbûn´ bi wan re pêş diket. Ev rewşên ku di nava xalkê de li ser wan dihên axiftin, di nava xalkê de weke ”rewşna ku bi wan mudahaleyê bîolojikî ên li laş û bedena jinê jî di nava kurdan de dihên ser ziman.”

Ev rewşên weke ”rewşna ku bi wan mudahaleyê bîolojikî ên li laş û bedena jinê jî di nava kurdan de dihên ser ziman” dihên ser ziman, tiştekî hanîn bîra min. Di dema hikimeta Bilent Ecewît de ku partîya MHP´ê hevkarê wê bû û wezereta tendûrûstê di destê MHP`ê de bû, wî gelek derziyên ku di bin navê ´derzîyên tatanozê´ û ankû weke ku di nava kurdan de dihên ser ziman ku weke ´derzîyên sorika´ dihên bi navkirin, ku dişênina nava kurdan û di ancama wan derzîyan de bi hezaran ciwanên kurd ên zarok ku saqat man û ankû jîyane xwe ji dest dan, hanî bîra min. Ev rewş, piştre, tenê bi hinek nîqaşan re ma. Piştî ku li herêma Rehayê ku gelek zarok felcbûn û piştre, li ser wan felcbûnan re hatibû

rojevê.. Lê piştre, ti tişt li ser wan rewşan ne hat kirin. Weke rewşna sergirtî man.

Ev rewş û gelek rewşên weke van ku di nava kurdan de li ser wan dihê axiftin hena. Lê tenê, ji ber ku ti belgeyên fermî di destê wan de tûna na, êdî ev tenê weke hizrekê û ankû gûmanekê dimênin.

Lê bi wê re ez vê jî divê ku werênima ser ziman ku di vê çerçoveyê de weke ku di ti deman nebûya di van deman bi deh hezaran zaroyên kurd, dimirin. Gelek ji wan, di nava xalkê de weke «îhmaliya li nexweşxaneyan» jî dihên ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku bi deh hezaran zaroyên kurd ên pitik ku dimirin, miirov çawa dikarê bi ´îhmalekê´ re werênina ser ziman?

Di nava kurdan de weke gûmanaka din jî, heya. Ew jî, pirr bi xortî heya. Ew jî, ew a ku tê gotin ku «di wan derzîyên ku li herêmên kurdan li kurdan dixin, di wan de hinek madeyên ku bi wan saqatbûnê û ankû pêşîya çêbûna zarokan digirin hena.» Di demên dawiyê de ji ber bikarhanîn dermanan, bi deh hezaran jinên kurd ên ciwan ku qisirbûna, ma mirov çawa dikarê werêne ser ziman? Ev bi deh hezaran qisirbûna jinên kurd, van rewşên ku di nava civate kurd de weke gûmanan dihên ser ziman, di cih de dihênina bîra mirov.

Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku dewlet, ku politikayaka wê ya di vê çerçoveyê de li ser mudahaleyên biolojikî û hwd de hebê, wê nehêle ku ti birhan(kanit) di jîyanê de di derbarê wan de hebin. Her wusa, weke ku çawa ku di derbarê komkujiyên hatina serê kurdan ên weke komkujiya zilanê, komkujiya dersimê û hwd ku hatina tûna kirina. Tişta herî baş bo dewletan, ew a ku newê birhankirina. Di vê çerçoveyê de nêzîkî mijaran dibin.

Piştî salên 2014´an û pê de, bi teybetî ji aliyê rayadarên dewletê ve hanîna li ser rojevê ku ´hijmara civate kurd zêde dibê´ jî, di vê çerçoveyê de weke nîqaşekê dimêne. Lê ev tenê nîqaşaka? Li gorî van nîqaşan û ankû weke projeyên ku li ser wan re ev nîqaş dihên kirin, çi plan û proje hena? Ev nîqaş, bêgûman belesebeb nayêna kirin. Divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman.

Lê li vir divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku mijara zêdebûna hijmara civate kurd, ji ber ku weke «telûkeyekê» dihê dîtin, êdî ev nîqaşkirin li ser wê re dihê kirin. Ev nîqaş, di vê çerçoveyê de weke ancama hin projeyna jî mirov dikarê werêne ser ziman.

Di salên dawî de zêdebûna mirina zarokên kurd, divê ku mirov biteybetî weke mijarakê li vir werêne ser ziman. Gelek kurd, weke ku di

dema wezirê tendûristê ê MHP´yî di dema hikimeta Bilent Ecewît de ku derzîyna ku saqat dihêlin ku şandina herêmên kurdan û di ancama wan bi hezaran mirov saqat man û jîyane xwe ji dest dan, hizir dikin ku rewşna bi vî rengî ên ku dewlet wan dizanê lê rastîya wan nayêne ser ziman hena. Ev gûmana di serê kurdan de, weke gûmanaka ku di temenê bêbawerkirina li rayadarên dewletê û doktorên wê ya. Her çend ku di wezire tendûristê ê dema hikimeta Bilent ecewît ê MHP´yî, piştre hanîn ser ziman ku «me ew derzî berhevkirin ji pîyasayê» jî, gelo ev çendî rast bû? Di nava kurdan de, ggûmana ku di vê çerçoveyê de dihê ser ziman, ew a ku «bo ku bêjin me berhev kir û hwd, ew gotin hanîn ser ziman. Lê piştre weke ku dîsa dinava kurdan de dihê ser ziman, li ser ancamên wan derzîyan, ti lêkolîn û hwd ne hatina kirin û ti rapor jî ne hatina weşandin. Rastîya vê rewşê jî, bi vî rengî vêşarî ma. Çend ku gelek ji wan diçina doktor jî, bi wan bêbawer in. Bi wan bawer nakin. Weke van sedeman, gelek sedemên ku bi wan bawer nakin di serê mirovên kurd de hena. Bi teybetî, heta roja me jî, ku her roj, ku roj her ku diçê hijmara wê zêde dibê ya ´zêdebûna mirina zarokên kurd´ û ´qisirbûna jinên ciwan ên kurd´ di vê çerçoveyê de weke du rastiyên ku dixwezin ku rastiya li pişt wan fahm bikin a. Ji ber çi ev rewş, bi rêjaya pirr bilind pêş dikevin? Bersiva vê pirsê di serê ti kurdî de tûna ya. Ya di serê wan de weke gûmanekê pirr xort a û ew jî di çerçoveya wê gûmanên xwe de aqil dimeşênin. Lê li ser wan gûmanên xwe re êdî hertimî dikin ku birhan (qanit)na bibînin. Rewşa ´zêdebûna mirina zaroyên kurd´ di dema zaroktiya xwe de, hê jî, weke mijaraka ku divê ku rastîya wê were fahmkirin a.

”

**Weke polîtîkayaka dewletê tecewûz. ..**

Li vir, divê ku mirov bi teybetî li ser politikayên dewletê ên li hemberê civate kurd bisekinê. Politikayên dewletê ên ku li hemberê civate kurd, bo tûnakirina hebûna civatîtîya wê bû. Di nava civatê de wê çawa ´jîyaneka yoz´ pêş bixe, di wê çerçoveyê de nêzî dibû. Di zindanan de bê, di sûkan de bê, di bin çavan de jinên ku hatina girtin û destavêtina wan, û hwd, bi gelek rewşên din re divê ku mirov werêne ser ziman.

Pêvajoya xistinê heya. Dema ku mirov dîroka dewletê a li kurdistanê binerê, di vê çerçoveyê de bi politikayên wê ên li hemberî civate kurd mirov wê rastîya wê bi kirinên wê re bibînê û kifş bike. Jina kurd, weke

jineka bi kevneşopî ya. Wê çawa wê ji wê kevneşopîya wê bikin, di wê çerçoveyê de nêzîk dibûn.

Zihniyeteka tecewûzkarî hebû. Ew gotina ku di çapameniyê de jî cih girtîya ku rayadarên AKP´ê dihanî ser ziman a bi rengê ”bila ew bênina dûnyê, wê dewletê lê binerê”, weke zihniyetê ya. Ev gotina ”bila ew bênina dûnyê, wê dewletê lê binerê”, rayadarên AKP´ê li ser kirina tecewûzê, hanîbû ser ziman. Di dema ku hinek jinên ciwan ku ji aliyê hin rayadarên dewletê ve rastî tecewûzê hatibûn û ku hinek ji wan jinan bi haml mabûn, piştre ku ketibû rojevê de ku ew jin, naxwezin ku wan zaroyan werênina dûnyê, rayadarên AKP´yî derketibûn û ber çapameniyê û gotibûn ”bila ew bênina dûnyê, wê dewletê lê binerê.”

Ev zihniyeta tecewûzkar, li kurdistanê, li hemberî civate kurd, bo ku rûmeta jina kurd bişikênin û wê ji tekoşîna azadiyê bikin, hatibûbûna pêşxistin. Ev weke hin politikayên dewletê bûn. Li bajarên kurdistanê ên weke dersimê, Sêrtê, Cizîrê, batmanê, Çolemergê û hwd, hema bêja li hemû bajarên din jî, bûyarên tecewûzê ku bi destê rayadarên dewletê hatibûbûna kirin hebûn. Teybetîya hemû teecewûzên ku li kurdistanê dihatina kirin, bi destê rayadarên dewletê dihatina kirin. Weke ku çawa ku li Bosna-hersekê, ku sirbîyan, sing li zikê jinan dixistin û zarok derdixistin, heman politika rejiam tirk piştî salên 1990´î li hemberî kurdan kir. Di aslê xwe de ev politikaya dewletê ya singkirina zikê jinê û ji wê derxistina zarokan, weke politikaya dewleta tirk, ku me di dema komkujiya dersimê de jî dîtibû bû. Di nawala qûtiyê ya dersimê de, leşkerên tirk, di dema komkujiya dersimê de, sing bi ser tifingên xwe ve dikirin û li zikê jinan dixistin.. Bi vir ve girêdayî, mirov dikarê vê jî werênina ser ziman ku ´leşkerên tirk, li ser zaroka ku di zikê dayika xwe de diketina pêşbazîyê de ku ka keça û ankû law a. Yên ku ew dem dîtibûn, ev bi vî rengî, pirr bi êş dihanîn ser ziman. Digotin ku ´zikê me qûl dikiirin, bo ku zayende zarokên me bizanibin.´. Di vê çerçoveyê de li ser zayende zaroka ku di zikê dayika xwe de leşker diketina îdîayê de. Piştî ku **îdîa** dikirin û pê de, wê sing li zikê dayikê bixistan û zarok derxistan û dîtiban.

Ev politikayên dewletê, piştre jî, bi rengna din li hemberî kurdan doman. Politikaya tecewûzê, mirov dikarê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Gelek jinên ciwan, ku hatina xistin binçavan de, rastî destavêtina rayadar û polisên tirk hatina. Li kurdistanê, di nava civate kurd de, her rayadar, polis û mirovên şerê teybet Ên rejima tirk ku kar dike, sûcên

dijmirovî li hemberî civate kurd kirina. Hemûyan jî, sûcên li dijî mirovatiyê li kurdistanê kirina.

Jinên kurd ên ciwan, gelek ji wan ji aliyê polisên sivîl ve di vê çerçoveyê de hatina xapandin. Weke ku ´hêz hevdû dikin´ nêzîkatî li wan kirina. Lê ev hemû, weke politikaya dewletê kirina. Gelek ji wan jinên ciwan, heta ku ji wan re gotina, ´em hêz we dikin´, ´emê bi we re bi zewicin´ û bi wî rengî gelek keçên ciwan hatina xapandin û ew keç bi wan re ketina têkiliyê de. Piştre ew keç jî, hinek ji wan jî, bi haml jî mana. Lê piştre, ew tenê wusa di nava civate xwe de mana. Ev jî, weke politikaya dewletê bû. Di vê çerçoveyê de, ew ´întîbaya´ destavêtinê ku di mejiyan de li ser wê re bidina civatê, di wê çerçoveyê de ew rewş pêşxistina. Ji xwe, piştî ku ew întîba hati afirandin, êdî weke gihiştibibina armanca xwe êdî tevdigerihin. Yên ku li vir û di vê rewşê de weke u hatina ´îstîsmar´ kirin, ew jinên ciwan diman. Bi wê hêsta ciwanîyê û bi nezaniya xwe re bi wan bawer dikirin ku ew ´hêz´ wan dikin. Lê ew nizanin ku ew weke politikayakê ya li wan. Her çend, hinek ji wan zewicî jî bin bi wan re, di navbera du sê salan de ku rastîya wan dîtina û fahmkirina, yan întîxar kirina û yan jî, vegerîyan kurdistanê, li malbatên xwe. Yanî, hevdû berdana.

Piştre jî, ev jinên ciwan ku wê rastîya wan dibînin, êdî bo wan pirr dereng dibê. Gelek ji wan, êdî tenê rêya dawî li jîyane xwe hanînê ji xwe re dibînin. Li kurdistanê, weke rastîyeka biêş divê ku mirov werêne ser ziman ku pirranîya keçên kurd ku dawî li jîyane xwe dihênin bi ´întîxarî´, di vê çerçoveyê de ketina nava lapên polis û mirovên şerê teybet ku xwe weke ”heval” û ankû weke ku ”hêz” wan dikin ku xwe dana nîşandin in. Rewşa van jinên ciwan ku bi gotinên weke ”hevelatiyê” û ”hêzkirinê” ku hatina xapandin, weke rewşa zarokên kurd ên li zindana ´bozantiyê´ ya. Ew zarokên kurd, ku di bin 18 salîya xwe de ku hê zarokin ku hatina girtin, ku çawa hatina îstîsmarkirin, di vê çerçoveyê de û weke wê divê ku mirov rewşa van jinên ciwan jî werênina ser ziman.

Gelek mirov, dema ku li wan jinan dinerin, dibêjin ku ”ew bûna korbanê nezaniya xwe”. Lê di aslê xwe de, mirov nikarê tenê rewşê bi vî rengî bi hesanî bi çend gotinan werênina ser ziman. Ji ber ku jin, bi teybetî, weke ku armanc hatiya girtin. Bûyara tecewûzê a li dersimê ku heft leşkerên tirk destavêti bûbûna keçeka ciwan û tecewûzî wê kiribûn, mirov dikarê di vê çerçoveyê de weke minaq bide nîşandin. Ji xwe, dadgeh û dad jî, wan tecewûzkaran diparêzê. Piştî ku bûyara tecewûzê a li dersimê ket rojevê û saziyên jinan ku xwepêşandin bo şermazar kirina

wê kirin û pê de, dadgehê bo ku ´pêşîya bertekan bigrê´ tenê leşkerek girt. Piştre bi heyvekê re jî, dema ku fahmkir ku bertek kêmbûn û êdî zêde bertek nayêna ser ziman, ew leşker jî berdan. Di vê çerçoveyê de bi vî rengekî bi vî rengî dadgeh jî, bo parastina sûcdaran kar dikin. Yanî tecewûzkaran diparêzên. Ji ber ku ´tecewûz weke politikaya dewletê ya.´

Li vir, dixwezim ku vê yekê jî, werênima ser ziman ku li şûna ku dadgeh, wan sûcdaran ceza bike, wê jinên ku rastî tecewûzê hatina wê ceza bike. Gelek bûyarên bi vî rengî ku li dadgehê doza wan hatîya vekirin, di dadgehê de hatîya gotin ku ”ew bi dilê xwe bi wan re ketîya têkiliyê de´ û bi vî rengî tecewûzkar mafdar derxistina û ”baraata” wan dana. Êdî, jinên ciwan ku rastî tecewûzê hatina, bi wê êş û hêrîşa ku li wan bûya re bi teneserê xwe re mana.

Weke minaqa tecewûzê ku li batmanê, ser 22 rayadarên dewletê ku tecewûzê keça zarok û ciwan dikin. Doza wan, dadgeh bi salan dide domandin. Piştre, wê çawa baraata wan bide, li wê digerihê. Dadgeha dewletê, naxwezê ku tecewûzkarê xwe bide mahkûm kirin. Ji ber ku ev weke politikayaka dewletê li hemberê wê civatê hatiya kirin. Her çendî, ku gelek saziyên jinan û ssivîl ku vê dozê dişopênin jî, lê bîryaraka bi wijdan ji wê dadgehê derneket.

Heman rewş, di bûyara zindana ”bozanti´yê de jî bû. Bi dehan zarokên kurd ku temenê wan bin 18 salîyê re bû, bi hêncetên ku kevir avêtina di xwepêşandinan de hatibûbûna girtin. Piştre jî, ew kiribûbûna zindana ´bozanti´yê de. Li wir, gelek ji wan zarokên kurd, rasti îstîsmara rayadarên tirk ên girtîgehê hatibûn. Piştî ku bûyar hata bihîstin û ket çapameniyê de, bo ku ser bûyarê bigrin û binûxûmênin, hemû zarokên girtî ên li zindana bozantiyê sewkî zindana sincanê a ankara kiribûn. Li wir jî, bo ku nikaribin rastiyê bigihênina derve, ew zarok yek bi yek kiribûbûna şane(hucre)yan de. Di wan şaneyan de jî, li wan êşkence dikirin. Ev rewşa, tecewûzê ku weke politikayekê tê meşandin, armacca wê ew a ku wê çawa rûmeta civatî ya civate kurd bişikênina. Bi wê re jî, armanca din ya duyem jî, ew a ku wê çawa pêşîya tekoşîna civatî ya kurdistanê bigrin a. Lê li vir, divê ku ez vê jî di dewama wê de bibêjim ku ew rojnemavana ku ew bûyara bozantiyê derxistibû li holê, ji ber ku ew bûyar derxistibû li holê hatibû girtin. Ew rojnemavan jî, ji ber ku ew bûyar hanîbû rojevê ji aliyê rayadarên dewletê ve hatibû girtin.

Ev rewşa tecewûzên ku li kurdistanê ku rayadarên dewletê ku kirina, mixabin, saziyên jinan ên li bajarên tirkiya û ankû weke ´feminist´ û saziyên sivîl li hemberê van rewşan kêm bertek dana nîşandin. Hinek

sazîyên kurdistanî, li hemberê wan bertek dana nîşandin. Lê gelek saziyên jinan ên li tirkiya li hemberê wê bêdeng mana. Ev nerîna saziyên jinan ên li tirkiya, divê ku mirov bi teybetî hilde li dest. Ew saziyên jinan ên li tirkiya, hertimî nêzîkatîyaka wan ya şaş li rewşên li kurdistanê ku bûna, bûya. Gelek saziyên jinan ên li tirkiya, dema ku ji wan re hatîya gotin ku ”jinên kurd, di nava sûkê de li wan dihê xistin”, ”li dardê, bi ardê ve tên xişiqandin” û hwd, bersiva ku dana ew a ku ”ew jin, bi bîrdozî li wir in”a. Ev nêzîkatiya ku di bin navê ´**feminismê**´ de li hemberê jinên kurd hatîya dayîn nîşandin, bûya weke nêzîkatîya objektîf ku piştgirî daya wan tecewûzkar û êşkencekarên li kurdistanê jî. Dibêt ku gelek ji wan jinên femistên tirk, ew di nîyeta wan de nebê, lê di fîlîyetê de, ew bi wan gotin û bêdengîyên xwe re bûna alîkarî ji wan şûcên li hemberê jinê ên ku li kurdistanê ku hatina kirin. ..

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di serî de, bi gotina ´ew jin, bi bîrdozî li wir in´ û vê gotinê kirina weke hênceka ku li hemberê wan kirinên tûndûtûjî ku li hemberê jinên kurd ku dibin ku bêdeng bimênin, di fîliîyetê de ev nêzîkatî bûya sedema tûndûtûjî û domandina tecewûzê û hwd. Yanî, ev nêzîkatî, bûya sedema ku ev nêzîkatîyên tecewûzê ku bi destê hin rayadarên dewletê ku bidomê û domandina wê tûndûtûjîya li ser serê jinê jî. Di vê çerçoveyê de, ev nêzîkatîya femistên tirk, mirov dikarê weke nêzîkatîya çapên tirk ên berê jî werêne ser ziman. Her wusa, çapên tirk ên berê, gelek ji wan piştre bi zanebûnî bê û ne bizanebûnî bê, weke ku li ser navê dewletê li hemberê tekoşîna azadîya kurd bertekên dijber jî dana nîşandin. Her wusa, di filîyetê de bûna alikar ji kirinên dewletê de. Piştre jî, gelek ji wan, di nava dewletê de bûna rayadarna bi maaş jî.

Em divê ku vê nêzîkatîya femistên tirk, bi rexneyî werênina ser ziman. Ev nêzîkatîya femistên tirk, weke nêzîkatîyaka pasîf û lawaz maya. Her wusa, weke ku çawa li hemberê destavêtinên li kurdistanê û tûndûtûjiya ku li hemberê jina kurd ku bêdeng mana, bi heman rengî li hemberê gelek rengên tûndûtûjiyê ên hatina serê jinên tirk jî, bêdeng mana. Ji ber vê yekê, êdî ew di nava civatê de pêşneketina. Di aslê xwe de pêşneketina wan, ji ber bêperspektifiya wan a. Gotina wan ya ku dema ku li jinên kurd tûndûtûji ji aliyê rayadarên tirk û rejimê ve dihê kirin û ew dibêjin ku ”ew jin, bi bîrdozî li wir in”, rastîya wan ya bêperspektifîya wan jî radixe li berçav. Ji xwe, dewlet nexwezê ku ti tevgerên jinan ên weke ku tevgera azadîya kurdistanê ku di nava jina kurd de pêşxistiya, di nava jinên tirk de pêş bikeve. Di vê çerçoveyê de, ev têgîna femismê ya

hin jinên tirk, weke têgîneka ku di vê çerçoveyê de weke ku li gorî têgîna rayadarên tirk a di vê çerçoveya vê xwesteka wan de ya.

, **Li** vir, divê ku mirov di dewama vê de hinekî din jî bahse rewşa tevgerên ´feminist´ ên li bajaran tirkiya jî bike. Ev di çerçoveyê de weke ku ev weke pêwîstîyekê ya. Li vir, mirov dikarê gelek rastiyan jî kifş bike.

Bi teybetî, divê ku mirov werêne ser ziman ku saziyên jinan ên tirk, çend ku weke ku li ser mijara jinê tevgerîyan jî, lê dema ku mijar dibû mijara jinên kurd, wê xwe di nava bêdengîyekê de mitandiban. Wê bêdeng maban. Ev, aliyekî wê yê piçûk ji nezaniyê dihat. Lê aliyê wê yê mazin jî, ji wê dihat ku ne dixwestin ku bi dewletê û rayadarên wê re newene berhevdû bû. Ji ber vê yekê, pirranîya tûndûtûjîya ku dihata serê jinên kurd, li ber wê bêdeng diman. Yanî, dema ku ji wan dihat bipirsîn, wê bigotan ku ”ew jin, bi bîrdozîkî li wir in” û wê êdî li ber wê bêdeng maban. Bi têgîneka ku tevgerîyan ku ´weke ku tişta ku pergalê dikir li ser serê jina kurd û civate kurd ´mafdar´ didîtin. Gotinên wan, ev rastî derdixist li holê. Dihizirin, ku polîsê ku hêrîş kirîya, mihaqaq sedema wê heya. Ku rayadarên dewletê hêrîşkirina, sedema wê heya. Di vê çerçoveyê de li mijarê dinerin. Di vê çerçoveyê de êdî wê deng dernexistiban.

Lê piştî bi tevgera azadîya kurdistanê re ku pêşketin bû û tevgerên jinê ên kurdistanî pêşketin û pêde, êdî weke ku hinekî di wê çerçoveyê de heyîderî pêşket. Lê ew heyîdarî jî, pirr kêm û lawaz bû. Dîsa, ew tevgerîyên ku li bajarên kurdistanê û ên tirkiya ku diafirandin, wê pirannîya wan jinên kurd ên ku êdî hêdî hêdî xwe birêxistin dikirin bûn. Jinên kurd, bi tevgera azadîya kurdistanê re û bi ´”dahûrîyên rêberê gelê kurd birêz ocalan re” xwe bi rêxistin dikirin. Tevgera jinê YJA-STAR, piştre pêşket. Tevgera jinê YJA-STAR, wê di sale 2014´an de kongira xwe ya giştî çê bike û bi navê ”tevgera jinên kurdistanê” yanî bi TJK´, wê xwe jinûve birêxistin û nû bike.

Ev, bi teybetî, divê ku mirov werêne ser ziman ku wê bandûra serhildana kobanê û serkevtina wê jî di wê de hebe. Ji ber ku di berxwedana kobanê de berxwedana jinê jî, êdî weke tevgereka navnetewî pêşket û bû malê dîrok û cihanê. Di çapameniya cihanê de jî, êdî bi awayekî pirr cidî, xwe birêxistin dike. Di vê çerçoveyê de ev pêşketina bi tevgerîya jina kurd re, wê bandûra wê li qadên tirkiya ên rojava jî bibe. Bi vê bandûrê, wê êdî hin bi hin deng ji nava jinên tirk jî derkeve. Lê tevî vê jî, ji ber ku tevgerên jin ên tirk, xwe ´bêperspektif´ hiştin û tenê di wê

rewşeka ´marjînal´ de hiştin. Hewldanên tevgerîya azadîya jinê a kurd TJK´ê jî, wê zêde têrê nekê ku tevgerîyaka mazin di nava jinên tirk de pêş bixe. Lê bi tevgera kurdistanê YPJ´ê ku li rojava bidest tekoşînê kir û deng veda li cihanê, êdî i tirkiyê weke ji kurdistanê, bale herkesekî kişand û bi hezaran jin, herikîn bersînoran weke ku li ber sînor ´pîrsûsê´ kombûn dibû û hwd. Sedema zêde pêşketineka tevgerên jinên tirk jî, hinek sedemên wê hebûn. Sedemên wê jî, ew bûn ku ji ber ku ´nîjadîtî´ esas digirtin. Aliyê duyemin jî, herêmîtî esas digirtin. Aliyê din jî ê sêyem jî, ew bû ku ji ber ku ji bin wê bandûra zihniyeta rejimê xwe xilas nekirin. ..

Ev aliyê sêyemin, ê weke ´xwe ji bin bandûra rejimê xilas nekirinê´, wê weke pirsgirêkeka ku li pêşîya pêşketina çapa tirk jî bê. Çapa tirk, xwe ji bandûra rejimê xilas nekir. Heta ku, ´ji çerçoveyekê ´kemalîstî´ xwe xilas nekir. Ev pirsgirêka giştî ya li pêşîya pêşneketina çapa tirk, wê weke pirsgirêkeka ku xwe li pêşîya pêşketina tevgerên jinên tirk jî xwe bidê dîyarkirin. Gotinên weke ”kemalîsm, bi jinê re wekhevî hanî” û ankû ”mafê hilbijartinê kemalismê hanî´ û hwd, wê weke bendna ku wê nehêlin ku tevgerên jinê ên li tirkiya ku bi tevgerên civate kurd re bigihijina hevdû û bi hevdû re ku pêş bikevin. Gelek gotinên bi vî rengî ku weke gotinên ´pêşketî´ dihatina ser ziman, bi armanca manipûla kirin û pêşîya pêşketina wan girtin bû. Her wusa, ya ku male çapa tirk viritand û ew ´marjinal´ kir jî, ev rastî bixwe bû. Ji ber ku tevgerên jinên tirk, di destpêkê de xwe ji vê bandûrê xilas nekirin, êdî di destpêkê de weke tevgerna ´marjînal´ jî man.

Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov, ev zihniyet û têgîna ku ew marjînal dikirin, pêşîya nêzîkbûna wan ya li tevgera jina kurd jî girtibû. Heta ku, li ser têgînek ´nîjadî´ û ankû ´nîjadperestî´ ku ew jî dibêt ku ne di farqê de bûn, ew li hemberê bûyarên li kurdistanê ên li ser serê civate kurd bêdeng dihişt. Minaq, keçika bi **”desmala sor”** ku bi tirkî weke ”kirmizi firarli kiz” jî dihat nasîn, wê ti hêvîyê di nava tevgera jinê a tirk de nebînê, wê tevlî refên tevgera jin a kurd bibe û li ser navê jinên tirk jî tekoşînê bike. Sedema wê, nêzîbûna li jinê a rast, û nêzîatîya biwijdan, dad û wekhevî ya tevgera azadiya kurd bû.

Weke vê rewşê, mirov dikarê gelek minaqan bide nîşandin. Ev minaq, wê hem, bi xwe re astengiyên zihniyetî ên li pêşîya tevgerên jin ên tirk bide nîşandin û hem jî, zihniyeta pêşîya gihiştîna tevgerên jin ên tirk li yên kurd ên jin ku digirê jî wê wê bide nîşandin. Wê hertimî xatekê di navê de bide çêkirin. Her wusa divê ku ez bibêjim ku tevgerên jin ên tirk,

di mejiyê wan de, li ser tirkitiyê û kurditiyê re di mejiyê wan de xateka sor heya ku bi zihniyetî nikarin ji wê derbas bibin. Ev yek, weke aliyekî ku rejim jî, hertimî dixwezê ku biparêzê ya. Yanî, rejim, nexwezê ku tevgerên jinan ên tirk, bi yên jinan ên kurdan re bigihina hevdû û bi hevdû re tekoşînaka hevpar bidin. Ev xate ku li ser tirkitiyê re di mejiyê wan de hatî xizkirin, wê di vê çerçoveyê de di temenê marjînalbûyîna wan de jî bê. Ev rewşa marjinal mayîna tevgerên jinan ên tirk, wê hertimî temenê ji partîyên rejimê ên weke AKP´ê re bide çêkirin ku ”jinên xwe” bidina afirandin. Yanî, jinên ku li gorî zihniyeta wan tevgerihin, cilan li xwe dikin û weke wan dihizirin û hwd, wê bide afirandin. Pirsgirêka marjînaliya tevgerên jin ên tirk, di vê çerçoveyê de ji rejimê re pirr zêde weke temenekî ku ji wê sûd digirê ya. Ji ber vê yekê ya ku rejim, nexwezê ku tevgerên jin, bi tevgera azadiya kurdistanê re were cem hevdû. Rejim, hertimî ji ber vê yekê dixwezê ku tevgerên tirk ên jin, xatekê di nava xwe û tevgerên kurdîstanî ên jin û her wusa ên din de çê bikin. Ev rastîya tegerên jin ên tirk, wê weke rewşeka berê ya tevgerên çap ên tirk jî bê. Her wusa, wê di çerçoveya nîjadperest de ew werina zantkirin. Tevgerên çap ên tirk, ji ber vê yekê, piştî salên 1980´î û pê de, wê êdî dem bi dem bi awayekî pirr zû wê marjînal bibin. Ji ber ku vê rewşê ne hişt ku ew zihniyetekê xwe ya rastî ya çapî pêş bixin. Têgîna kemalismê a dewletî ku li ser çapan re hat pêşxistin, wê di çerçoveyek nîjadperest de weke pirsgirêka çapên tirk jî bê. Her wusa, piştre, weke ku em di pirsgirêkên jinan û tevgerên jinên tirk de em dibînin ku bi heman rengî ev bi wan re jî, weke pirsgirêkekê ya. Ev, di serî de li vir, weke pirsgirêka zihniyetê xwe dide dîyarkirin.

Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku rejimê û rayadarên wê, ji ber ku weke têgîneka kurdistanî ya, têgîna tevgerên jin ên kurdistanî û têgînên tevgerên azadiyê ên kurdistanî, hertimî weke ´dijber´ dîtina û hewldaya ku kriminalize bikin. Ev hewldanên kriminalizê kirinê, weke ku çawa ku di nava kurdan de, bi hinek kurdan re xwe dide nîşandin ku ew ´xwe di rewşa xwe de ji tevgera azadiyê dûr digirin´, wê bi heman rengî bandûrê li tevgerên jin û hin tevgerên çap ên tirk jî bike ku ji xwe tevgera azadîya kurdistanê dûr bigrin û ankû dûr bidina nîşandin. Wan jî, hertimî li ser vê esasê û temenê, hertimî bendekê di nava xwe û tevgerên kurdistanî ên azadiyê de bizihniyetî, bi têgîna ´nîjada serdest´ û derûnî danîna.

Ev bendên zihniyetî û derûnî, î ro, herî zêde di vê çerçoveyê de xwe dide dîyarkirin. Jinên tirk jî, di vê çerçoveyê de xwe hiştina. Yek bi yek,

ên ku rastîya vê zihniyetê ku çawa rastîya tevgerên jin û ên çap jî dorpêç kiriya ku fahmkirina, êdî çare di nava tevgera azadiyê a kurd de dîtina. Li vir, di serî de di vê çerçoveyê de bi teybetî divê ku mirov binxat bike ku rejima tirk û rayadarên wê, hertimî di nava hewldanaka mazin de bûna ku perspektifên tevgera azadiya kurd û rêberê gelê kurd birêz Ocalan ku di nava civate tirk, çapa tirk û tevgerên jin ên tirk de pêşnekevê, ketina nava tevgerîyekê de. Hertimî, hewldana ku pêşîya wê bigrin. Di vê çerçoveyê de krimînalize kirin, weke dijber nîşandan û her wusa hertimî gotina ”terorê” bo kurdan û tevgerên kurd bikarhanîn û hertimî hewldana parastina vê ”întîbaya terorê” li ser serê civate kurd û sazî û tevgerên kurd ên kurdistanî” di vê çerçoveyê de jî ji wê re bûya weke aliikariyekê. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jinên kurd, pirranîya wan,  ev pirsgirêk buhûrandina. Têgîneka azadiyê ya pêşketî ya demî di nava xwe de pêşxistina.

Jinên kurd, xwestina ku bi tevgerî, wê pêşketina xwe di nava jinên tirk de jî bicih bikin û bikina malê wan jî. Di vê çerçoveyê de li bajarên tirkan jî, tevgerên jinan kurd ên jinan xwepêşandinên wan û hwd, bûna. Lê kêm jinên tirk, tevlî wan bûna. Em dikarin, minaqa ´dayikên şemiyê´  ku heta vê roja me 528 hefteya ku bênavber didomê, bidin. Pişti sale 1995´î, bi çend kesan re destpêkir. Î ro, ev tevgera jin, bi hezaran û deh-hezaran tekoşînê didin. Ev jî, serkevtina jinên kurd a ku di ancama isrera wan ya azadiyê de bûya ya. Her wusa, kêm jinên tirk, ew bende derûnî ya ku rejima tirk di mejiyê wan de çêkiriya derbas kirina. Lê pirranîya wan, ew bend derbas nekirina. ..

Di vê çerçoveyê de ez weke jineka kurd, divê ku vê yekê bibêjim ku tevgerên jinan ên civate tirk û her wusa tevgerên çapa tirk jî di nav de, divê ku ez bibêjim ku divê ku xwe bi zihniyetî û derûnî di vê çerçoveyê de di berçav de derbas bikin. Divê ku pêşî, vê rewşa xwe ya ku î ro ew di wê de na ku bi bend û hêtên derûnî ên rejimê ku hatîya afirandin û pêşxistin, divê ku wê înkar bikin û derbas bikin. Ya ku wê ji wan re bê temenê pêşketina civatî jî wê ew li xwe rexnekirina wan ya cewherî bê.

Di ser de divê ku ez bibêjim ku tevgera azadîya kurdistanê, di temenê wê de têgîna rexnekirin û rexne li xwe girtin, di temenê pêşketina wê de kifşkar a. Bi rexne li xwegirtinê re hemû pirsgirêkên xwe di berçav de derbas dikirin. Li ser wê re di zihniyetek civatî ya kurdistanî ya nû de gihiştina li hevdû.

Di aslê xwe de, di nava jinên kurd de bo ku pêşîya vê rengê pêşketina jina kurd bigrin, rejima tirk li ser partîyên wê ên weke AKP´ê û hwd re bi

rêya olê re hertimî xwestîya pêşîya wê bigirê. Her rêbaz bikarhanîya ku pêşîya wê bigirê. Hêstên olî ên civatî îstîsmar kirina. Ji destpêka komarê û heta roja me, di vê çerçoveyê de her partîyên rejimê ên ku hatina û bûna desthilatdar, ev rêbaz bikarhanîna bo ku pêşîya pêşketina civate kurd bigrin.

Her wusa, lê jina kurd, bi xwe kifşkirina xwe ya li ser temenê xwe re êdî temenê tekoşîna xwe ya civatî pêşxistîya. Ji ber vê yekê ya ku weke rêbazaka rejimê ya pêşîya wê girtinê ya ku dixwezê ku, pêşî jina kurd ji rastîya wê û ji rastîya wê ya civatî, dîrokî û felsefîkîya wê dûr bike. Çendî ku li gorî xwe ew kir, wê pêşîya pêşketina civate kurd jî bigirê. Saziyên camaata fethullehçîyan, saziyên jinan ên AKP´îyîyan û hwd, di vê çerçoveyê de pêşxistina û bikarhanîna. Heta ku weke ku çawa di nava tevgerên jin de pêşxistina û gotina wan, ku win xwe ”ji bîrdozîyê û tevgera azadiyê a kurdistanê dûr bisekinin û tenê ´weke jin´ saziyên xwe ava bikin. Bi heman şêwayê, bo ku tevgera azadiya jina kurd ya kurdistanî bi navê civatê wê ku lawaz û zayif bike, bi teşwîkan hewldana ku têgînekê bidina pêşxistin ku tevgera jin, divê ku xwe ji tevgera azadîya kurdistanê dûr bike û dûr bide nîşandin. Di vê çerçoveyê de bo ku bi marjînalî bimêne, ev rêbaz hertimî kirna. Hin malên jinên kurd ên li kurdistanê, weke ku li amedê, Wanê, herêmên din ên Serhedê û botanê û hwd, ku xwe ji tevgera azadiya kurd dikin ku dûr bidina nîşandin, di vê çerçoveyê de di bin vê bandûrekê de na. Û ji ber vê yekê jî, tenê li ser tabelê navê wan heya.  Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî bibêjin ku ev tevgerên ku rejim hertimî bi navê wan dixwezê ku wan di rewşek nepêşketî û marjînal de bihêle, wê her cûre alikarîya aborî jî bide wan. Heta ku rêberê gelê kurd birêz Ocalan jî dibêje ku ”her sazî ku saziyên jin bin û yên civatî bin, ku xwe ji rastîya azadiya civatî dûr bikin û nêzîkî rejimê bin, wê her cûre alikariyê bide wan.” Lê ku ne di vê çerçoveyê de bê ku bi têgîneka azadî ya civatî û jinê karîger(aktiv) bê, û kar bike û pêşketinê bide çêkirin, wê di serî de rejimê û rayadarên wê li hemberê xwe bibînê.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku rejim, weke ku çawa di nava civate tirk de dixwezê ku sazîyna ku ew wan herê bike û bi pejirêne werina afirandin û avakirin, biheman rengî, dixwezê ku di nava civate kurd de jî, saziyna ku ji civate kurd mirovan nêzî rejimê dikin û bi wê re hin bi hin kar dikin û bi vî rengî rewşekê ku pêşdixe, saziyên wê ava dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de, di aslê xwe de ev rengê avakirina saziyên jinan û ên civatî ku li gorî rejimê, mirov dikarê wan jî weke

rengekî şerê rejimê ê bi têgîna civate kurd re werênina ser ziman. Li ser van sazi û malên weke malên jinê ku li gorî rejimê ava dibin û heta ku alikarîya aborî jî bêsînor didina wan, saziyên rejimê li ser wan re li kurdistanê di nava civate kurd de pêş bikevin û hin bi hin li ser wê re bişavtinê yanî asimlasyonê ku pêş bixin. Her wusa, li ser van saziyan re jî rejim xwe dide jîyandin. ..

Heta ku li ser van saziyan re dikin ku pêşîya pêşketina statûya kurd jî ku bi navê civate kurd ku pêş bikeve digrin. Pêşîya maf û azadîya civatîya kurd jî bi wê re dikin ku bigrin. Ji xwe, li ser van saziyan, bi xwestekên maf û azadiyê ên civate kurd re şer û tekoşînê dide.

"

**Li ser rengê hêrîşên li jina kurd re li civate kurd**

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku weke rengê hêrîşên li ser jinê re ku li civate kurd dibin jî, divê ku mirov li vir li ser wê bisekinê. Ev mijar jî, bi serê xwe weke mijarekê divê ku werê hildan li dest. Di nava sînorê her çar rejimên weke rejimên tirkiya, îran, sûrî û îraqê û hwd de, wê herrtimî dem bi dem bi perîyodikî wê hêrîş li ser serê jinê bibin. Di aslê xwe de, hêrîşên li ser civate kurd, wê bi hêrîşên li ser serê jinê re wê rewşeka hê xirabtir ji jinê re bi afirênin. Yanî, di vê çerçoveyê de dema ku andamên civatê di çerçoveya hêrîşên ku tên serê civate kurd, xwediyî ast û giraniyekê bin, wê ev hêrîş li ser jinê bina bi du ast û giraniyê. Yanî, ev hêrîş wê li ser jinê re bina du qatî. Li vir, di dewama vê de, divê ku ez balê bikişênima li ser vê ku yê ku hêrîşî keça kurd **Ferînaz Xosrowanî** kirî, mirovekî ku andam(rayadarê)ê îstîhbarata îranê bû. Berî nûha bi demekê keçeka din ya kurd bi navê **´Reyhan Cebbarî** jî bû, ku ev jî keçeka kurd ku bi aslê xwe kurd bûya, rastî destavêtina andamê îstîhbarata îranê hatibû. Gelo mirov dikarê, vê hertimî destavêtina bi destê andamên îstîhbaratê weke rasthatinek(**tesedûfekê**) werêne ser ziman? Bêgûman, mirov nikarê weke rasthatinê werêne ser ziman. Ji ber ku ev bi plan dihên kirin. Li vir, divê ku mirov weke zihniyeteka teybet ya bi rayadarên îranî re werêne ser ziman. Jinên ku rayadarên îranî, wan dikujin, wê pêşî di bin çavan de û ankû di zindanan de tecewûzî wan bikin û piştre, wê wan bi derve bike.

Ku ew jin, ne zewicî, wê yan, bi formalite bizewicênin û yan kû destbiavêjina wê û tecewûzî wê bikin û piştre bikujin. Ev aliyê mijarê pirr bale min kişand. Bo vê yekê, hinekî li ser wê min lêkolîn kir û min dît û fahmkir ku ev têgîn bi rayadarên îranî re weke têgîneka bawerî jî ku hatîya pêşxistin ku ´dema ku keçikeka destlêneketî ku were kuştin, wê herê bihûştê. Li gorî wan, divê ku dest bêavêtin li wê û tecewûz kirin, bo ku neçê bihûştê. Yanî, destavêtina xwe di min maskeyeka bi vî rengî de divêşêrên. Lê di aslê xwe de, ti têkilîya wê, bi ol û bawerîyê re tûna ya. Tenê, bo ku tecewûzê ´meşrû´ bikin û xwe bi derûnî li ser wê tecewûza ku kirina xirab hîs nekin, ev gotinên bi vî rengî li ser olê re jî hanîna ser ziman. Û her wusa, bo ku wê tecewûzkirinê, di nava civate de jî ´meşrû´ bidina nîşandin jî wê gotinê dikin. Di aslê xwe de, mirov li şûna ku van gotinan li ser olê re werêne ser ziman, divê ku mirov bi derûnîya van mirovan re werêne ser ziman. Ji ber ku dema ku van mirovan tecewûz kir û yekî ji wan re got, ´weke tecewûz kir´ û ew xirab dane nîşandin, wê xwe xira hîs bikin bi derûnî. Bo ku ev bi wan re nebê, van gotina dibêjin. Yanî, bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku van gotinên bi vî rengî hem bo ´meşrû´ dayîna nîşandina wê tecewûzê ya, hem bo di nava civatê de ku nehêlin ku li hemberî wê bertek derkevin û hem jî bo ku ew xwe bixwe êdî xwe bi derûnî xirab hîs nekin di dema ku ew tecewûz kirin de, van gotina pêşxistina.

Me li jor, bahse destavêtinên ku bi rayadarên tirk ku li Dersimê, herêmên botanê, Sêrt, batmanê û hwd hanîbû ser ziman. Di wê de çawa ku rayadarên dewletê, destavêtina jinê çawa dikin, me hanî ser ziman. Ev rewş, her wusa, wê ne tenê li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk tenê dike wê bin. Wê li her çar beşên kurdistanê wê bibin. Her çar rejimên ku civate kurd û Kurdistan di nava wan de hatî qatkirin ên weke rejima tirk, rejima îranê, rejima baasî ya îraq û Sûrî û hwd, wê di nava sînorê de ku bi hevdû re di ahengekê de wê vê rewşê bikin. Minaqa vê jî, herî dawî li rojhilatê kurdistanê ku li bajarê Mihabadê ku li hotêla ´tara´ ku di 8´ gûlana 2015ê de ku çend rayadarên îranî dikin ku dest biavêjina jineka kurd. Ev jina kurd jî, navê wê Ferinaz Xosrowanî bû. Vê jina kurd, piştre ji ber ku xwe û rûmet û şefera xwe rizgar bike, xwe ji şebekeya hotêlê ve diavêje xwerê û dawîyê li jîyane xwe dihêne. Piştî ku ev rewş di nava kurdistanîyên Mihabadî de hat bihîstin û pê de, wê di cih de hemû ahlê mihabadê dakevin qadê û li dora **hotêla ´tara´** bicivin û heta ku wê vê hotêlê jî bidina agir û bişawitênin. Ev, wê weke ancama hêrsa kurdistaniyên mihabadî bê.

Ev rewşa keça kurd ya li Ferinaz Xosrowanî, rewşeka teybet ku em dikarin bi wê re gelek rewşên ku rayadarên îranî di rojhilatê kurdistanê de bo tafisandina dengên kurdistanê ku dike, fahm bike. Wê ev rewş gelek rewşan bi me bide ravakirin. Ev rewş, wê her wûsa bi xwe re du tiştan bi teybetî bide dîyarkirin. Yek, ku weke ancama zihniyeta mêr a zilm û rewşa jinê ya. Her wusa ku di nava civatê de jin hertimî di bin çi xatarîyan û zordariyan de dijî ya. Aliyê din ê duyemin jî, weke aliyê civatî ku mirov dikarê werêne ser ziman a. Ev alî jî, bi wê re mirov dikarê werêne ser ziman ku çawa li ser serê civatê bi desthiilatdarîyekê metingerîyek heya. Her wusa bo ku wê desthilatdarîya bidina domandin, her rê û rêbazê ji xwe re ´mubah´ û ´rast´ dibînin.

Rewşa civate kurd, di vê çerçoveyê de dema ku mirov wê hilde li dest, divê ku mirov ji du aliyan ve bi teybetî hilde li dest. Aliyê pêşî ji aliyê jinê û rewş û hêrîşên li laşê wê ya. Aliyê din jî, her wusa aliyê civatîya ku çawa hêrîş li civatê dihên kirin in. Hêrîşên li civate kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku hertimî di vê çerçoveyê de dualî na. Li bakûrê kurdistanê, ji ber ku em li bakûrê kurdistanê dijîn, zêdetirî, em dikarin bûyarên rojana ên weke hêrîşên li civate kurd û bi teybetî li jinê jî ku ji aliyê rayadarên tirk ve dihên kirin, mirov dikarê werêne ser ziman. Pirranîya hêrîşên ku li bakûrê kurdistanê bê, li rojhilatê kurdistanê bê, li başûr û rojavayê kurdistanê bê, ku li jinê dibin, bi destê rayadarên wan rejimên metinger ên serdest dibin. Mirov nikarê van weke rasthatinna werêne ser ziman. Di rewşa bûyarên kurdistanê de, mirov nikarê ti bûyarê jî, weke rasthatinna werêne ser ziman. Hemû bi plan dihên kirin. Nûqta û cihên ku wê lê hêrîş bikin û ji wê ve hêrîş bikin, wan jî didina dîyarkirin. Wan kifş dikin û ji wan ve hêrîş dikin. Di wê çerçoveyê de hêrîşî civate kurd û yan jî li jina kurd dikin.

Ji vê aliyê ve dema ku mirov li tekoşîna azadiya kurdistanê binerê, divê ku mirov werêne ser ziman ku çendî weke bertekeka mazin ya jina kurd a. Tekoşîna azadiya jinê a li kurdistanê, ji vê aliyê ve jî divê ku mirov li wê binerê û wê werêne ser ziman. Divê ku mirov weke bertekeka civatî ya jina kurd jî ku bi civatî werêne ser ziman. Jina kurd, dema ku mirov tekoşîna wê ya azadiyê ku dike fahm bike, divê ku mirov kevneşopîyên wê ên bi dîroka wê ya civatî re ku hena, li wan jî binerê û werêne ser ziman. Her wusa, Di nava tekoşîna azadîya kurdistanê de weyn û rola jinê giring û kifşkar a. Ji **sakîneyan bigra û heta Besêyan** û Ji **Şêrîn Elemxolî**yan bigra û heta **Arîn Mîrkan**an, mirov dikarê werêne

ser ziman. Her wusa, li rojhilatê kurdistanê, tekoşîna jinê, zêdetirî temenê wê yê pêşketinê heya. Jinên kurd ên weke Şêrîn Elemxolî dema ku diçina ber bi sêdarê ve bi serbilindayî diçin. Ew dizanîn ku tekoşîna çi didin. Dizanîn ku bo çi tên bidervekirin. Ew, vê jî dizanîn ku wê tekoşîna wan ya azadiyê bidomê. Ji xwe, li rojhilatê kurdistanê, piştî şêrîn Elemxolî re wê bi sedan jinên kurd tevlî tekoşîna azadiyê bibin. Her wusa, jinên weke Ferinaz Xosrowanî jî, ku ew zanîn, têgîhiştin û zanîna şêrîn Elemxolîyan gihiştiya wan û dimejiyê wan de bicih bûya, rejima Îranê û rayadarên wê, wê dibînin. Di aslê xwe de, dema ku jinên kurd ên weke şêrîn Elemxolî dibina sêdarê û dema ku hêrîşî jinên kurd ên weke Ferinaz Xosrowanî dikin û ku ew jî heta ku bi destê xwe dawî li jîyane xwe dihênin, wê di vê çerçoveyê de bi têgîn bê.

Têgîna tekoşîna azadiya jinê, herî zêde di vê demê de li rojhilatê kurdistanê di nava jinên kurd de gavên giring bixwe re diavêje. Pêş dikeve. Her wusa bi van hêrîşên bi vî rengî, pêşî dikin ku pêşîya wê tekoşînê bigrin. Hemû hêrîşên ku bi teybetî rayadarên tirk li bakûrê kurdistanê li jinên kurd dikin ku bi rêbaza destavêtinê û hwd bê û hêrîşên ku rayadarên îranî li rojhilatê kurdistanê ku bi rêbaza destavêtinê û hwd bê ku dikin, bo ku bi wê pêşîya tekoşîna azadîya jina kurd bigrin dikin. Jin, weke ast û azadîya civatekê jî mirov dikarê wê werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku jina kurd, weke aliyekê giring ê wê, ew a ku tekoşîna azadîya civatî ya jinê bi hevdû re gihandiya astaka mazin ya giring. Di vê çerçoveyê de hêrîşên ku li jina kurd dibin, di vê çerçoveyê de wê çawa pêşîya wê bigrin, di vê çerçoveyê de hêrîş dikin. Bo vê yekê, divê ku mirov hemû hêrîşên ku li jina kurd dibin, divê ku mirov bi plan bihasibêne. Di dema ku çeteyên DAÎŞ´î hêrîşî civate kurd dibin, pêşî, wê bi bêrûmetî û bêahlaqî hêrîşî Jinan bikin. Piştî ku hêrîşî herêma başûrê kurdistanê a şengalê dikin, wê ser 5 hezaran re jinên kurd ên êzîdî berhev bikin û bi xwe re bi ravênin. Her wusa, ev jî, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Çeteyên DAÎŞî, dema ku hêrîşî rojava dikin, pêşî dikin ku jîyanê û temenê jîyanê xira bikin. Di vê çerçoveyê de hêrîş dikin. Li Kobanê, Hesekê û hwd, li hemû herêmên din ên rojavayê kurdistanê jî divê ku mirov di navê de werêne ser ziman. Li rojavayê kurdistanê jinên kurd, li hemberê wan hêrîşên hovana di bin navê YPJ´ê de xwe bi rêxistin kirin. Tevgerên xwe yên bisazî ên sivîl û leşkerî avakirin. Di cihanê de, ev yekemin a ku jinên civatekê, tevgerên xwe yên sivîl û leşkerî di nava civatê de bo parastina xwe û civate xwe ava dikin a. Her wusa, di vê

çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Weke dîmenekî civatî ê tekoşînê xwe bi rêxistinkirin û avakirina sazî û tevgerên xwe yên sivîl û leşkerê ku jina kurd ava dike di nava civate xwe de, hinekî bi asta hêrîşên li ser serê civate kurd ve jî girêdayî na. Divê ku mirov bi hevdû ve girêdayî jî werêne ser ziman. Hertimî ji gelek aliyan ve rejimên herêmê ên weke rejima îranê û rejima tirk, hêrîş birina biser civate kurd de. Di vê çerçoveyê de jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku hemû hêrîşên ku kirina jî, weke hêrîşna ku li hebûna civate kurd in. Wê çawa hebûna civate kurd ji hevdû bi felişênin, di wê çerçoveyê de wan hêrîşan dikin.

Rewşa jina kurd li rojhilatê kurdistanê, girantira. Ev jî, hinekî ji qarakterê rejimê tê. Rejimê, bi zihniyetek mêrî xwe di çerçoveya rejimekê olî de birêxistin kiriya. Di vê çerçoveyê de, azadîya civate û bihebûna wê re dorpêç kiriya. Her wusa di nava wê de jî, herîşî civatê û jinê dike. Li rojhilatê kurdistanê, destavêtin û qatilkirina Jinan, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring divê ku mirov werêne ser ziman. Hebûna civate kurd a rojhilatê kurdistanê, divê ku mirov weke mijaraka teybet wê hilde li dest. Her wusa, rewşa keça kurd a bi navê **Ferinaz Xosrowanî** ku di **8´ê gûlana 2015**´an de rastî hêrîşa rayadarên îranî tê û ew bixwe dawî li jîyane xwe dihêne, di vê çerçoveyê de giringîya fahmkirina rewşa jina kurd a li rojhilatê kurdistanê dihêne li holê. Her wusa, di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku çendî ku ev hêrîş, biarmanca şikandina tekoşîna civatî ya kurdistanî û ya jinê bişikêne dihên kirin, biheman rengî divê ku li hemberî van hêrîşên bi vî rengî tekoşîn were zêdetir mazin kirin. Divê ku ev kirin û kiryar werina kirin, weke sedema mazinkirina tekoşînê. Divê ku ev bûyar û jinên kurd, bi serborîya xwe re bibina temenê pêşxistin û pêşketina têgîn û têgihiştinaka civatî ya zayendî ya civatî jî. Her wusa di vê çerçoveyê de, êdî tekoşîn were mazintir kirin. Divê ku tekoşîn, were bilindtir kirin.

Rewşa van jinên kurd, divê ku mirov bi teybetî hilde li dest. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku di keseyetîya Şêrîn Elemxolî de dihê ditin, wê jinên ku bi zanebûna, wê werina kifşkirn û wê hêrîşî wan bikin. Bi teybetî, jinên ku zanebûna wan pêşketîya, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku weke ku bo rejimê weke "telûke" dihên ditin. Di vê çerçoveyê de hêrîşî wan dikin.

Zanîna zayendî ya di nava civate kurd de, di aslê xwe de temenê wê bi dîrokê re heya. Dema ku em li rengê pêşketina bawerîyên civatî ên dîrokî ên kurdistanî diinerin, em dibînin ku jin di nava wan de weke

´nirxeka pîroz´ dihê hanîn li ser ziman. Minaq, di nava Bawerîya kurdistanî ya ´yazdanî´ û ankû ´êzdayî´ de, jin weke nirxeka pîroz dihê ditin. Çend ku di van serdemên dawiyê de, ev têgîna weke nirxeka pîroz dîtina jinê ku weke li şûn hatibê hiştin jî, lê di demên buhurî de, ev wûsa bûya. Her wusa jin, kevneşopîyên wê ên civatî ku di nava civate kurd de hena, dema ku mirov li wan dinerê, her wusa, di vê çerçoveyê de mirov vê rastiyê pirr bihesanî kifş dike. Kevneşopîyên weke kevneşopîya şahmaran, divê ku mirov weke kevneşopîyên kurdistanî ên jina kurd werêne ser ziman. Jina kurd, kevneşopîya şahmaran bi pîrozî pêşxistîya. Ev kevneşopî, di xate bawerîyê ya kurdistanî a êzdayî de pêşketîya. Li ser wê re, bi bawerî jî, di nava nirxên kurdistanî de pîrozî, di nava kevneşopîyn kurdistanî ên jinê de pêşketîya. Li vir, divê ku mirov bibêje ku sad-mixabin ku ev jina kurd ku xwediyê van kevneşopîyên bi vî rengî ên pîroz a, ku î ro bi vî rengî mirov rengên hêrîşên li wê dibînê, mirov pirr xamgîn dibê. Mirov ji mirovatiya xwe fihêt dike.

Divê ku mirov werêne ser ziman ku jine kurd, dîroka wê ya ku bi civatê re hatî nivîsandin, divê ku mirov bi destpêka wê re werêne ser ziman. Li vir, cihê xamginiyê ya ku jina kurd, heta roja me, bi zimanê civate xwe dîroka xwe di nava civatîtîya xwe de ne nivîsandîya. Di aslê xwe de, ev ne nivîsandina dîroka xwe di nava civate xwe de û bi zimanê civate, ji hinek aliyan ve temenê gelek hêrîşên ku li wê û li laşê wê dibin jî ya. Jina kurd, bi xwe bêdeng kirinê re weke ku temenê hêrîşên li xwe bi zimanê xwe diafirêne. Di aslê xwe de, bi zimanê serdestê xwe, nivîsandin û hanîna li ser ziman, zêdetirî dibê temenê hêrîşên ku li jinê û li civatê bibin jî. Ji ber ku zimanê serdest û rejimê, zimanê hêrîşkirinê ya. Êdî, li gorî wê rastkirin, ddewşîrmekirina wan nivîsandinan jî bizihniyeta xwe re dike. Ev jî, ji gelek aliyan ve wê tekoşîna wê ya azadîyê, dike ku vala derxe. Û heta ku vala derdixe jî.

Lê dema ku jina kurd, bi zimanê xwe û bi zimanê civate xwe nivîsand, wê temenê pêşketina xwe ya di nava civate xwe de werêne ser ziman. Her wusa, wê ev temen, wê di nava civate wê de xort bike. Piştre, wergerandina wan nivîsên wê li zimanê serdestê wê hingî wê bandûra wan nivîsan zêdetir bike. Wê di çerçoveya parvekirin û tekoşînekê de ancamê bidin. Di demên bûhûrî de, jinên kurd, hertimî bi zimanê xwe hertimî xwe hanî ser ziman. JI ber vê yekê ya, ku heta roja me, tê gotin ku ´jina kurd, bi zimanê civate xwe re xwe hanî ser ziman.´ Di dema wê de tê gotin ku ´jinê, civat û zimanê civatê parast.´ Ya ku jin bihêzkir û kir ku van parastin û pêşxistinan di nava civatê de bike, ew hanîna wê ya li

ser ziman a bi zimanê civatê wê bû. Her wusa, kevneşopîyên civatê, di vê çerçoveyê de dem bi dem hatina pêşxistin. Kevneşopîya şahmaran, minaq, kevneşopîyeka bi vî rengî ya jina kurd a ku di nava civate kurd de bizimanê civate kurd hatîya pêşxistin a. Ev, bûya temenê xwemalî(orjînalîya)ya ya bi civatîîya wê re jî. Ev, bûya temenê her afirandinên wê ên bi xwemalî ên bi civatîtîya wê re.

Her wusa, li vir, divê ku mirov bi ´sêgoşa´ jin, ziman û civatê re li rengê pêşketina wê ya civatî bihizirê. Her wusa, ev hersê ling, wê di temenê pêşketina wê de bin. Jina kurd, ku rast jina kurd bê, divê ku bi zimanê civate xwe hertimî xwe werêne ser ziman û jîyane xwe ya civatî ava bike. Ya ku wê di temenê pêşketina wê de bê, wê ev bê. Ya ku wê, wê bike hêz jî, wê ev bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku weke bi hêrîşên ku rejima tirk û rejima îranê li jinê dike, hemû jî di temenê wê de armanckirina pêşketina jinê a li gorî civate wê ya. Wê çawa, wê civatîtîya jinê ji holê ra bikin, wê dikin ku tûna bikin. Li wê hêrîşê dikin. Di vê çerçoveyê de hêrîşên ku li jinê dibin, weke ku rayadarên îranî bi bi dervekirina şêrîn Elemxolî û qatilkriina keça kurd a Ferinaz Xosrowanî û hwd re, xwestiya ku pêşîya wê pêşketina jina kurd ya bi civate wê re bigrê. Li bakûrê kurdistanê jî, weke ku li dersimê ku heft leşkerên tirk dest diavêjina keçeke kurd û her wusa hêrîşên ku li jinê li Sêrtê, batmanê, herêmên din ên botanê û bakûrê kurdistanê û hwd jî, di vê çerçoveyê de weke hêrîşna ku li hebûn û rastîya jinê ya civatî na. Jina kurd, çendî ku tekoşîna xwe ya zayendî di nava têgîna civate xwe de xorttir û tundrewtir kir, wê ewçendî bi wê re hem xwe û hem jî civatîtîya xwe biparêzê. Lê weke pirensibeka civatî ku nebê nabê ya, divê ku bi zimanê civate xwe, di nava civate xwe de xwe bêne ser ziman û pêşve bibe. ..

”

**Jin di jîyanê de. ..**

Mirov dema ku bahse jinê bike, divê ku mirov bahse wê ya di jîyanê de bike. Pirsgirêkên herî mazin di jîyanê de derdikevina ber wê. Her wusa, di jîyanê de nêzîkatîyên ku li wê dihên kirin, divê ku mirov kifş bike. Dema ku mirov bahse jinê di jîyanê de bike, divê ku mirov rastiya jinê di nava jîyanê de hilde li dest.

Di aslê xwe de, dema ku mirov bahse jinê di jîyanê de bike, divê ku mirov bi dîrokê re bahse wê bike. Divê ku mirov dîrokekê hilde li dest û bi wê re werêne ser ziman. Dîroka jinê a di jîyanê de, wê rastîya wê raxê

li berçav. Heta roja me, di çerçoveya jîyane şariştanî û civatî de pêşketina ku bi wê re bûya, mirov bi wê re dikarê werêne ser ziman.

Di nava jîyanê de têgîna ´pirsgirêka jinê´ hatîya afirandin û pêşxistin. Li vir, dema ku mirov bahse jinê dike, û her wusa nêzîkatîyên li wê û bi wê re jî gotinên weke ´pirsgirêka jinê´ dihiilde li dest, mirov ya ku kifş dike, ew a ku jin çawa hatîya salixkirin, weke pirsgirêkekê mrov rastî wê tê. Salixkirina jinê di nava jîyanê de wê temenê afirandina wan pirsgirêkên ku ku bi jinê re diafirin û dihên derxistin li holê bê. Berî vê bûyara ku li rojhilatê kurdistanê ku çend andamên îstîhbarata îranê dikin ku dest biavêjinê de Ferînaz Xosrowanî, wê berî wî li Pakistanê jî, bi hênceta ku ´kuran, şawitandîya´ wê jinên were kevirkirin û piştre wê bi awayekî hovana were qatilkirin. Piştre çend li ser bertekên ku ji nava rayagiştî a navnetewî ku hatina rayadarên Pakistanî wan mirovên ku ew jin kuştina cezayê ´îdamê´ jî dide wan, lê wê ev rastiyeka ku li vir divê ku mirov wê kifş bike wê werêne ser ziman. Li vir, li ser van minaqan re mirov rastî pirsgirêkeka zihniyetî ya ´afirandina pirsgirêkê´ tê. Pirsgirêk, çawa tê afirandin û barî pêşarojê tê kirin, mirov wê kifş dike. Wek, tê zanîn ku dinava bawermendên îslamî de, çend ku pêxemberê ola îslamê gotîya ´bihûşt, di bin lingê dayikan de ya´ jî, wan jîyanek ji dojehê ji jinê re li dûnyê afirandîya û pêşxistîya. Bi zihniyetî ku bi bawerîya xwe re jî diikevina nakokî û dijberîyê de ´dijberî´ û ´dijminatîyek´ bi zihniyetî li ser olê re afirandina û kirina malê olê û li ser wê re hertimî yan jinê dikujin û yan jî, yên ku jin kuştin hem ji nedîtî ve tên û hem jî li ber wê bêdeng dimênin. Ew jî, wilqasî, di vê çerçoveyê de ji rastîya jîyanê û ol û bawerîya ku dibêjin ew ´ji wê na´ dûrketina, edî wan bixwe jî, ji ji bîrkirina ku jinekê na û jinekê dayika wan hanîya dûnyê, wê jinê di mejiyê xwe de weke”iblisê sedsalê” werênina ser ziman. Lê belê, mirov bixwe jî û ankû ew mirovê ku wê weke ´îblîsê sedsalê´ dide nîşandin, ew bixwe ji ji wê ya. Ku ew îblîsê sedsalê bê, wê çaxê, ew zaroya wê ya mêr jî, îblîsê ku ji wê hatîya dûnyê ya. Û ankû ´şaytanê´ ku hatîya dûnyê ya.

Meleyên îranî, ti carî ew rastî ne dîtina. Wan wilqasî, di nava vê zihniyetê de xwe windakirina, tevî jinekê ew hanîna dûnyê, dikarin, bi wê întîbaya ku ´ti carî ne ji jinekê na´ xwe werênina ser ziman û destavêtinê, tecewûz û her cûre bêrûmerîyê li jinê ´rast´ bibînin. Wê vê jî, di bin ´maskeya olê´ de bivêşêrên. Wê xwe oldar bidina nîşandin. Oldarî, weke ku berê û î ro jî, di nava kurdan de heya, wate wê ew a ku mirov bi ahlaq bê û ´tişta ku ji xwe re rast dît, ji yê li hemberê xwe re jî rast bibînê ´ ya. Vajî wê, ´ ya ku ji xwe re rast nedît, ku ji yê li hemberê xwe re jî rast

nebînê.´ Lê di roja me de, bi gelemperî, wusa ya? Ne, em nikarim vê yekê bibêjin. Bila, ew oldar, dayika wî pêxemberê xwe yê ku bi wî bawer dikin, ku pêxemberê wan musa bê, Îsa bê û ankû Mihemed bê, bila dayika wan li şûna wê keça kurd Ferînaz Xosrowanî û ankû wê jina ku bi hênceta ku kûran şawitandîya li Pakistanê bihizirin.

Ew pêxemberên ku hatina dûnyê û ew afirandina jî, di zikê dayikakê de bûna, mazinbûna, hatina dûnyê, li dûnyê jîyane û piştre ji dûnyê çûna. Gelo, kîjan mirov û ankû zindiyê li dûnyê ev pêvajo ne jîna`? Divê ku mirov vê pirsê li li hemû mirovên ku bawermend bin û ankû ne bi bawermend bin, li hemûyan bike. Ankû jî, divê ku hemû mirov, vê pirsê ji xwe bikin.

Li vir, divê ku mirov ji aliyê zihniyetî ve, van aliyan hemûyan bike berlêpirsînê de. Her wusa, divê ku mirov, vê yekê bi başî kifş bike.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî bi zihniyetî bibêjim ku di serdemên buhurî de, çend ku em weke ku di roja me de dibêjin ku ´serdeme me ji wan serdemên buhurî pêşketîtira bi aqil´ jî, lê di aslê xwe de bi zihniyetî, ew dem li pêşîya roja me ne. Di roja me de, jin bi gotina ´pirsgirêkê´ re dijî. Gotina pirsgirêka jinê, her cûre têgînên sedsale me, li ser wê têgînek û aqilek afirandîya. Lê di serdemên buhûrî de, weke ku em bi `Îştar´, ´Eşnûna´ û hwd re dibînin, pîrozî bi navê jinê re hanîna li ser ziman. Ev, weke pirsgirêkê pêşxistina jinê, gelo ancama pêşketina aqilê me ya? Em î ro, dema ku serdemên ku di wan de aqil zêde pêşneketîya ên weke ´neolîtîkê´ ku şîrove dikin û weke minaq ji serdeme re dihênin ser ziman, her wusa, em bi întîbayakê wê dihênin ser ziman ku ev pirsgirêk, hemû jî li ser têgîne zihniyetê re ancama aqilên me na.´

Li vir, dema ku mirov di nerîneke bi vî rengî de dinerê, bi awayekî xwezayî, aqil jî, bi hebûna xwe re weke gotinaka ku dikeve berlêpirsînê de dibê. Bi aqilê mirov re aqil dikeve berlêpirsînê de. Rastîya aqil, li vir, divê ku mirov bike berlêpirsînê de. Aqil, bi teybetî jî serdemên aqil bi jîyane civatî û şariştanî, ku mirov li wan dihizirê, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke serdemna aqilî ku êdî bi pirsgirêk jî mirov dikarê wan werêne ser ziman in.

Rastîya aqil, li vir, divê ku mirov pirr zêde li ser zihniyetê û têgîna zihniyetê re bike berlêpirsînê de. Her wusa, rengê zihniyetê, awayê wê pêşketî ê bi dîrokê re û hwd, hemû jî divê ku mirov bi awayekî gûmanbar lê binerê. Divê ku mirov bike berlêpirsînê de. Ev yek, weke aliyekî ku divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê û ku mirov divê ku wê kifş bike ya. Her wusa, têgîna zihniyetê, li vir, weke têgîneka ku mirov divê

ku mirov bi dîrokê re li ser wê bisekinê ya. Bi civatê re zihniyet, li ser kevneşopîyan re xwe dide dîyarkirin. Li ser aqil re jî, bi têgînên bîrdozîkî û hwd re xwe dide dîyarkirin.

Di jîyanê de jin, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku weke aliyekî bi pirsgirêk ê ku divê ku mirov bi aqilê zihniyetî re ku werêne ser ziman a. Aqilê zihniyetî, weke ku bi kevneşopîyên civatî û têgînên bawerî ên bîrdozîkî û hwd re, li ser rengên salixkirin, bi watekirin û her wusa hanînên wan ên li ser ziman re wê xwe bide dîyarkirin. Li rojhilat, di nava hinek ´çand´an de ´rast´ dîtina lêdanê li zarokan jî li vir, divê ku mirov werêne ser ziman. Dema ku ji wan dihê pirsin ku çima, win wê dikin, wê bersivekê bidin û bibêjin ku ”bavûkalên me jî, ev dikirin´. Ev gotin, wê weke asta rast dîtinê jî bê. Wê êdî lê newê lêpirsin. Li vir, divê ku mirov wê werêne ser ziman ku têgîna zihniyetê, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê vê mijarê ya ku divê ku mirov werêne ser ziman a.

Di nava jîyanê de mirov dema ku bi aqil bijî û kirinên bêaqilî bike, mirov divê ku bi nêzîkatîya wî ya li jinê re baş werêne ser ziman. Her wusa, mirovekî hemdem ku ´bêrêzîya li hemberê jinê´ ji xwe re weke ´maf´ dibînê´, Oldarek, tevî di zikê jinekê de bûya û mazin bûya û piştre mirîya û çûya, wê piştre karibê, wê jina ku ji wê bûya, bikujê û ´lenet´ bike. Ev çi zihniyet a´? Divê ku mirov li wê bipirsê.

Ku em bahse di nava aqil de jîyandina bi bêaqilîyê bikin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bahse wê bike. Her wusa, ew mirovên ku kuştina jinê û ankû destavêtina wê dikin ku ´maskeyek bawerîyê´ jî li wê bikin, divê ku mirov pirr zêde bike berlêpirsînê de. Ev, wê aliyekî giring ê ku divê ku mirov werêne ser ziman. Bi zihniyeteka ku tefsîra ´xwûdê´ jî ku li ser mêr re dihê kirin de wê çawa mirovatî di çerçoveyek weke hevdû de pêş bikeve? Li vir, divê ku mirov divê ku vê pirsê bike?

Li vir, ez divê ku weke jinekê vê pirsê li hemû bawermendan bikim, ku ev cihû jî bê, xirîstîyan jî bê û misilman jî, Gelo Musa jî, Îsa jî û Mihemed jî ne ji zikê jinekê derketin? Dayika wan nebû? Yên ku rêz û hûrmetê ji dayika pêxemberê ku dibêje ku ez bi wê bawer dikin re ku nedê nîşandin, çawa dikarê bibêje ku ji wî pêxemberî re dide nîşandin? Bi wê re jî, yê ku rêz û hûrmetê ji hemû jinan re nedê nîşandin, çawa dikarê bibêje ku ez bi rêz û hûrmet im û ankû ez rêz û hûrmetê didima dayika xwe û an jî kû ku rêz û hûrmetê didima dayika wî pêxemberê ku ew bixwe ji wê bûya û ez bi wê bawer dikim? ..

Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku em divê jinê weke hîmê jîyanê werênina ser ziman. Weke çavkanîya jîyanê werênina ser ziman. Jin,

weke ku kurdên berê dibêjin ´**jîyan** a.´. Dîsa weke ku dibêjin ´**bêjin, jîyan nabê**.´

Li vir, rastî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov bi dîrokê re dike ku wê hilde li dest, mirov bi rastîyên dîrokî re wê kifş dike. Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke ku me li jor hanî ser ziman, di demên buhurî ên şariştanî de çawa ku jin, bi pîroz dihê dîtin û çawa ku piştre ev hat û têkçû? Ev rewş hemû, di çerçoveya jîyane civatî û rastîya wê de, rewşên ku divê ku mirov bi lêpirsînî ku li ser wan hûr û kûr bihizirê û bike ku fahm bike na.

Dayiktî, weke çavkanîyaka zindiyî ya ku di temenê hemû hebûnê de ya. Em dema ku li xwezayê jî dinerin, ya ku em dibînin, ew a ku her zindî, xwe ji hevdû diafirêne. Mirov jî, xwe ji mirov diafirêne. Yê ku wê diafirênê jî, jin a. Mirov di zikê jinê de diafirê û tê dûnyê. Piştre jî, jîyane xwe dijî heta ku dimirê.

Têkilîya di nava jin û bûyina mirov a di zikê wê de, wê xwe bi dayikîtîyê û têgîna wê re werêne ser ziman. Em li vir, divê ku vê yekê jî bi teybetî kifş bikin û werênina ser ziman ku jin, di vê çerçoveyê de weke ´xwûdawendê jîyanê ya.´ Di demên bûhûrî de, di nava bawerîyên kevn ên kurdistanî de, weke ku di xate yazdanî de dihê dîtin, wê jin, bi pîrozî bahse wê bê kirin û ew were hanîn li ser ziman. Di vê çerçoveyê de wê şîroveyên bi wê re werina pêşxistin. Di nava civate kurd de ku di vê çerçoveyê de pêşketina, kevneşopîyên civatî ên weke ´kevneşopîya civate kurd a şahmaran´, ´kevneşopîya civate kurd a hamawîyê´, ´kevneşopîya civate kurd a dayiktiyê´ û hwd, mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa, ev kevneşopîyên pîroz ên civatî na. Li gorî, kevneşopîya civate kurd a hamawîyê, dema ku dijminatîyek û ankû şerkirnek bû, ku jinek her û di nava wan de bisekinê û ankû hamawîya serê xwe ya rengînî ku biavêje nava wan, wê ew êdî bi hevdû re şer û pevçûnê nekin. Wê êdî bi hevdû re aşîtîyê bikin. Wê êdî dawî li şerê ku dikirin û ankû wê bikiran wê bênin. Di vê çerçoveyê de, li ser vê rewşa jina kurd re ya bi kevneşopîya wê a hamawîyê re, hertimî jina kurd, weke ´parastvanê aşîtiya navxweyî ya civatî´ jî hatîya dîtin û hatîya hanîn li ser ziman. Di dîrokê de jî wusa bûya. Jinê, bi rewşa xwe re hertimî parastvanîya aşîtî û aramîya navxweyî ya civatî kirîya. Hebûna jinê, ne hiştiya ku şer û pevçûn di nava wê de bibin û biafirin.  Dema ku em dîroka civate kurd jî lê dikolin û dihênin ser ziman, her wusa mirov vê rastîyê biawayekî vekirî kifş dike û dibînê.

,**Li vir**, di dewama mijarê de divê ku mirov bi rewşa jinê û civatê re jî bahse jinê di jîyanê de bikin. Jin, di nava jîyanê de, pirsgirêkên ku derdikevina pêşîya wê, bi wan re têdikoşê. Dema ku mirov bahse rewşa jinê di jîyanê de bike, wê rewşa jinê ya di nava jîyane civatî de bi giringiyekê derkeve li ber me. Her wusa, rewşa jinê di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jin di jîyanê de bi serborîya wê re wê bi gelek têgînên giring re xwe bide dîyarkirin.

Di nava jîyane civatî de weke ku me hinekî li jor bahse wê kir, wê bi kevneşopîyên civatî re xwe bide dîyarkirin. Di nava jîyane civatî de nêzîkatîyên ku li jinê û hwd, wê bi wan kevneşopîyan re bibe. Bo vê yekê, ev kevneşopî, weke nirxandinna civatî jî di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Di aslê xwe de kevneşopî, rengekî nirxandinî ê têgîna civatî ya.

Jina kurd, di nava jîyane civatîtîya xwe de weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov bahse wê bike û werêne ser ziman. Kevneşopîyên wê ên ku hena, divê ku em hinekî bahse wan bikin û wan bibîr bikin. Li ser wan re divê ku mirov wan werêne ser ziman. Kevneşopîyên jina kurd, bi têgîna wê ya civatî re me hinekî li jor bahse wan kir. Lê li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku fahmkirina jinê, weke nirxxeka civatî ya.

Têgîna civatê, dema ku em li ser wê dihizirin, em dibînin ku jin di temenê wê de pirr kifşkar a. Di serdemên berê ên neolotîkê de jin, wê di wê çerçoveyê de bi wê kifşkarîya wê ya ku heya, wê pêşketina xwe bi ber jîyane dema şariştanîyê de bide çêkirin. Minaqên jinê ên ku em wan kifşkirin ji pêşketinên di nava rûpelên dîrokê de, wê vê rastiyê bidina dîyarkirin li berçavên me.

Jîyane civatî, wê bi wê kifşkarîya bi jinê re wê pêşbikeve. Piştre jî, wê êdî bi demê re pêşketina xwe bide dîyarkirin. LI ser wê rewşê re wê zanebûn, pêşketin û avabûna bi malbatî û hwd, pêşbikeve. Em dema ku jîyane civatê şîrove dikin, em di van çerçoveyan de wê kifş dikin û dihênin ser ziman. Her wusa, li vir divê ku miirov werêne ser ziman ku dîroka jinê ya di nava jîyane civatî de di çerçoveya kifşkarîya wê bi dîrokê re de mirov wê dibînê.

Fahmkirina jinê, wê di destpêkên pêvajoyên jîyane şariştaniyê de ku pêş dikevin, wê bi nerîne jinê re bin. Piştre wê dem bi dem wê pêşketinê bi xwe re bidina çêkirin. Jin, wê ew kevneşopîya wê, wê li hemberê wê kevneşopîya mirovê mêr ê kal, bi demê re li berxwe nede. Wê li ber wê bikeve asta dûyemin de. Piştre wê bi demê re kevneşopîya mirovê mêr ê kal, wê derkeve li pêş û serdest bibe. Her wusa, ev kevneşopî, dema ku

em rewşa jinê û pêvajoyên dîroka wê ya di nava jîyane civatê û şariştanîyê de werênina ser ziman, divê ku mirov weke pêvajoyna kevneşopîkî ên giring werêne ser ziman.

Kevneşopîya mirovê mêr ê kal, wê bi demê re di çerçoveya jîyane civatî de serdest bibe. Di nava jîyane civatê de wê weke kifşkarê civatê, mirovê kal bi kevneşopîya xwe re derkeve li pêş. Ya ku wê jinê bi kevneşopîya wê re li şûn bide hiştin û wê heta ku weke ku bike rewşek bindestiyê de, wê ew kevneşopîya mirovê mêr ê kal bê. Pêvajoyên pêşketin mirovê mêr ê kal, biqasî yên kevneşopîya jinê kevn in. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov van aliyan bi hevdû re baş hilde li dest û fahm bike. Çerçoveya têgîna jîyanê, divê ku mirov bi van herdû aliyan re ji nû ve hilde li dest û şîrove bike. Têgînên li ser esasê dijberîyê, wê bi xwe re bi heman rengî dijberîyê û rengênn pêşketinê bênin. Di aslê xwe de, dijberîtî, ku baş were ditin, wê weke xafkeka ya mirovê ku lê dijberî dihê kirin jî bê. Yanî bi awayekî xwezayî ev rewş derdikeve li holê.

Li vir, dema ku mirov hewl bide ku rewşê fahm bike, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotina ´dijberîyê´ baş şîrove bike û werêne ser ziman. Li vir, ezê dû gotinan bi teybetî binxat biikim û werênima ser ziman. Yek, gotina ´dijberîyê´ ya û ya din jî wê gotina ´red kirinê´ bê. Li vir, em divê ku wateya van gotiina herdûyan ji hevdû cûda bikin. DI serî de red kirin ku di temenê wê de felsefeyek hebe, wê bi têgînekê û têgihiştinekê were kirin. Her wusa, wê di vê çerçoveyê de tişta ku red kirin, wê li şûna wê weke ´artarnatîf´ ku çi were bicihkirin, wê ew were ditin. Bi heman rengî, mirov dikarê gotina ´dijberîyê´ jî, wê bike. Lê gotina ´dijberîyê´, deronîya wê ya ku heya, dikarê pêşîya dîtinek rast bide girtin.

Mirov, di nava jîyane de ku jîyane dijî, bi wê jîyandinê re wê diafirêne. Her wusa afirandin, xosletekî giring ê bi tevgerên di jîyanê de re ya. Ew tevger hemû jî, li ser aqilê mirov re weke zêhnî bi wate na. Têgîna jîyanê, li vir, ku temenê wê li ser esasekê afirandinê bê, wê çawa mirov wê pêş bixe, di wê çerçoveyê de pîvanên mirov ê jîyanê dibin. Bo ku mirov ji jîyanê bikeve û nikaribê jîyane xwe biafirêne, mirov ji jîyanê dihê xistin. Pîvanên afirandinê, divê ku mirov li ser têgîna dîtinî re bi nerînî werêne ser ziman. Her wusa li vir, pîvan, weke gotineka giring, divê ku mirov werêne ser ziman. Li jor, gotina ´red kirinê´ ku me hanî ser ziman, di vê çerçoveyê de bi têgîna ´pîvanê´ re wê bi jîyanê me re xwe bide dîyarkirin.

Em li vir, divê ku vê yekê di serî de werêne ser ziman ku jin, çendî ku ew di vê çerçoveyê de xwediyê têgînekê ya, ew çendî wê karibê, bibe xwedîyê perspektifa xwe ya jîyanê. Bi wê re jî, mirov dikarê wê jî werêne ser ziman ku çendî xwediyê persoektifê ya, ewçendî xwediyê heyîneka afrînerî ya. Afirandin, li vir, li ser têgîneka felsefîkî ya jîyanî re bi wate ya. Di serdema ku aqil pirr zêde pêşketîya de têgîn û perspektifa jîyanê, giring a ku mirov wê werêne ser ziman.

Di vê çerçoveyê de wê jîyan, were pêşxistin. Têgîna jîyanê, wê bi rengê pêşketina mirov re xwe bide dîyarkirin. Di serdemên buhûrî de têgîna jîyanê xwe bi vî rengî bi jinê re bide afirandin. Destûrên nivîskî ên îştar, Esnûna, Lêlîth û hwd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Rewşa jinê, di roja me de çawa ya, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi perspektifî hewl bide ku werêne ser ziman. Di roja me de, herî zêde pirsgirêka têgînê heya. Di nava nerînên ku weke têgînna kifşkar dihên ser ziman, wê temenê afirandina pirsgirêkan bin. Weke ku çawa ku bi destûrên netewkî ên roja me re ku çerçoveya wan hatîya kifşkirin, wê bi wan civat werina birin ji dîrokê, wê bi heman rengî rewşa jinê, di çerçoveya têgînek ji dîrokê birinê de wê xwe bide dîyarkirin û werêne ser ziman. Jin, dibêt ku temenê ji wê yê weke civatekê ji dîrokê çûnê nebê. Lê ew têgîneka wê ya rast ya bi navê wê, ew hatîya ji dîrokê birin. Di vê çerçoveyê de, weke ku çawa ku mirov dikarê li ser civatan re bahse têgîna jenosîda civatî ya fizîkî û bi têgînî weke çandî, zimanî, felsefîkî û hwd bike, bi heman rengî li ser jinê re jî mirov dikarê bi têgîna zihniyetê re bahse wê bike. Her wusa, rewşa jinê, di vê çerçoveyê de wê xirabtir bibe.

Jin, weke kirdeyeka jîyanê ku di her şert û mercê de dide kifşkirin a. Her wusa, mirov, nikarê wê bi tememî tûna bike û jîyane xwe bide domandin. Ji ber ku bi awayekî zayendî, mêr bi mêratîya xwe re li wê hoyandî ya. Lê wê, di çerçoveya têgîneka bi vî rengî ya jenosîdî de wê, êdî di wê çerçoveya wê têgîna mêratîya xwe de wê jinê bi têgîhek metîngerî bike ku hertimî di bin dest de bigrê. Vê jî, wê bi ajo, hîs û her wusa xwestekên xwe re bike ku bike.

Ji vê aliyê ve mijara jinê, li ser zihniyetê re di çerçoveya pêşketina aqilê mirov de, dem bi dem weke ku pêdîvîya şîroveyek zihniyetî ya rast heya. Dema ku mirov rastîya zihniyetê, di vê çerçoveyê de nekê bin lêpirsînê de mirov wê baş fahm nekê. Weke ku me hiinekî li jor bi têgîna civatê re bahse jinê kir, ku li vir bi vî rengî mirov li ser têgîna civatîtîyê

re li rewşa jinê ya ku dihê afirandin binerê, hingî ew têgîna bindestiyê ya metingerî baştir dihê ditin. Kuştina rewşa jinê, dibê tûnakirina rewşa jîyane civatî jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi rastîya jinê û jîyane wê re li rewş û jîyane civatî jî binerê.

,,,,

**Jin û tûndûtûjîya li ser wê**

Li ser mijara jinê, dema ku mirov dihizirê, mirov gelek aliyên wê ên ku divê ku mirov wan werêne ser ziman, mirov wan kifş dike. Di sedsale me de, ku weke sedsalaka ku biaqil pêş dikeve dihê hanîn ser ziman jî, dema ku navê jinê dihê hanîna li ser ziman, di cih de gotina ´tûndûtûjiyê´ û ya ´ pirsgirêkê´ û ankû ´pirsgirêka jinê´ di cih de di mejiyê mirov de zindî dibê û dihê berbîra me. Ev têgîh, bi serê xwe dike ku mirov bi navê jinê re mijara tûndûtûjiyê bi serê xwe hilde li dest.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku mijaraka jinê, weke mjaraka derûnî, civaknasî, civatî, dîrokî, felsefîkî û hwd, divê ku mirov ji gelek aliyan ve wê werênina ser ziman. Her wusa, dema ku mirov ji aliyê têgîna gotina ´tûndûtûjiyê´ ve lê bihizirê, her wusa divê ku mirov bi van gotinan û gotinên weke van ên civatî û zanistî û hwd ve jî, şîroveyê bi navê jinê re pêş bixin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike têgîna tûndûtûjiyê, weke navê jinê pêşketîya. Herî zêde, mijaraka jinê, weke miijaraka ku li ser wê weke ku hatîya sekinin a. Ankû, li ser wê ne hatiya sekin, lê ew întîba hatîya afirandin. Di nava ol û bawerîyan de jî, şîroveyên ku bi navê jinê re hatinakirin hena. Her wusa, hemû şîrove jî, li gorî, têgînna hatina kirin. Di nava ol û bawerîyan de, şîroveyên ku li ser jinê hatina pêşxistin, ew mirovên ku bi wê ol û bawerîyê bawerdikin, di derbarê wê têgîna di derbarê jinê de ne xwediyê zanînekê na. Nîşanaka wê ya ku ew ne xwediyê ti zanebûnê na û ew nikarin hizrekê û têgînekê werênina ser ziman û ankû rastîya wê fahm bikin, wê êdî bi navê ´xwûdê ´ re werênina ser ziman. Lê di aslê xwe de, ew gotinên ku bi navê ´xwûdê ´ re dihênina ser ziman, ti eleqeya wan bi navê xwûdê re tûna ya. Tenê, hizirna, wan mirovan ên ku xwestina ku bi mirovan bidina herêkirin a. ..

Pirsgirêka jinê, dema ku mirov ji van aliyan ve werêne ser ziman, wê bi zihniyetî, pirr zêde derkeve li ber me. Her wusa li vir divê ku mirov werêne ser ziman ku mijaraka jinê, heta roja me jî, di aslê xwe de weke

mijaraka ku di bin nepeniyê de maya ya. Çend ku gelek zane, rewşenbîr û saziyan, xwe weke ên ku li ser mijaraka jinê ku lêkolînê dikiin ku dane nîşandin jî, ku gelek ji van sazî, zane û rewşenbîr jî bin, tişta ku hanîna li ser ziman, pirr kêm a. Di wê de jin, bi çend gotinên ´razber´ hanîna ser ziman. Li ser wê re jî, bahse ´hanîna li ser ziman´ kirina. Lê di aslê xwe de jin, bi rastîya xwe, ne hatîya hanîn ser ziman. Bi wê hêst, raman û zanîna ku mejiyê jinê bi wê dihizirê ku ew xwe bixwe newerêne ser ziman, ew pirr kêm a. Ji xwe, di temenê gelek pirsgirêkan de jî ev rastî heya. Pirsgirêka vînê li ser vê rewşê re xwe dide dîyarkirin.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku jin, di roja me de bi fîzîkî jî û derûnî jî û civaknasî jî, rastî tûndûtûjiyê tê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev tûndûtûjî, ji gelek aliyan ve divê ku mirov werêne ser ziman.

Oldar û bawermendekî misilman, dem bi dem ku bûya temenê tûndûtûjiyê li ser serê jinê, bi zanebûna xwe re ti carî, nikarê wê bibersivêne. Ew jina ku bi navê "recm"´ê ku hatîya kevirkirin û kuştin, ew jina ku ji ber sedemên din bi heman rengî ku hatîya qatilkirin, bersivê dixwezêt. Çend ku ew jin ku î ro ne li jîyanê jî bê, ew ji ber çi rastî wê hêrîşa xadar hatîya divê ku were hanîn li ser ziman. Yên ku kuştina jinê di nava olê de, bi vî rengî "meşrû"kirina, wan "kuştina mirovatiyê" meşrû kirina. Cihê wê ti carî di nava ti olan de tûna ya.

Têgîna ´recm´ê, divê ku mirov li vir li ser navê mirovatiyê bike berlêpirsînê de. Ev têgîn, çend têgîneka ku hemû têgînên bi bawerî jî bin ku bi navê mirovatiyê bin wê mahkûm dikin, divê ku rastîya wê were hanîna li ser ziman. Recm´ , care pêşî li Hz. Mihemed hatibû kirin. Dema ku ew hizrên xwe dihêne ser ziman, wê pêşî ew were kevirkirin. Wê kevirkirina Hz. Mihemed, mirov dikarê weke recme pêşî jî werêne ser ziman. Î ro, ew recm´kirin, di nava olê bixwe de jî, hatîya bicihkirin. Gotina ´recmê´, gotinaka tûndûtûjiyê ya ku pêşî li jinê û piştre di keseyetîya jinê de ku li hemû mirovatiyê ya. Divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Têgîna ´recm´ê, têgînaka ku mirov nikarê bi ti felsefeyên mirovatiyê wê werêne ser ziman a. Ji xwe, cihê wê di ti felsefeyê de jî tûna ya. Di aslê xwe de, cihê wê di bawerîya îslamê de jî tûna ya.

Di roja me de li welatên arab, îran û afganîstan û pakistanê û hwd, recm hatîya kirin. Her wusa, li gelek deverên din jî, ev hatîya kirin. Li welatên weke tirkiya jî, bi derûnî, civaknasî û hwd, wê recm´kirinê bi zuhniyetî dike. Ji ber ku ev bi têgîneka olî jî hatîya kirin, êdî ev ne hatîya

xistin berlêpirsînê de. Çend ku mirovan bi zanebûna xwe re jî dizanî ku ne li gorî ol û bawerîyê ya û ne rast a, lê wêra nekirina ku wê hizra xwe werênina ser ziman. Têgîna recmê, mirov dikarê weke varsîyonaka wê ya din ya duyemin jî ku li Îranê heya û dema ku jinek were bidervekirin, wê pêşî destavêtina li wê bikin û ankû wê bi awayekî ´formalîte´ wê bizewicênin û piştre biderve bikin. Mantiqê vê jî, ev a ku tê gotin ku "divê ku jin, destlêneketî nemirê, ku bi wê rengê bimirê wê herê bihûştê.´ Li vê zihniyetê binerin. Yên ku xwediyê wê zihniyetê na ku ´bihûştê´ layiqî jinê nabînin ku ew herîyê de, ew bixwe jî ji zikê jinekê derketina.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku tûndûtûjiya li ser jinê, divê ku mirov di serî de weke ku me hinekî li jor hanî ser ziman bi zihniyetê re divê ku mirov werêne ser ziman.

Di sedsale me de çend ku em di wê de bahse pêşketinaka mazin ya bi aqil dikin jî, lê di vê demê de ku em di wê de bahse aqil û pêşketina aqil dikin de jî, tûndûtûjî, pirr zêde li ser serê jinê hatîya pêşxistin. Her wusa, weke ku bi çeteyên hov ên DAÎŞ´î re ku hat ditin ku hêrîşî herêman dikin, weke ´ganîmet´ jinê berhev dikin û dest diavêjinê de. Her wusa, destavêtinê dikin. Komkujiyê Jinan dikin. Van jî, dikin ku bi navê olê "meşrû" bidina nîşandin. Ev, tenê minaqake. Weke wê, bi dîrokê re bê û ankû di roj me de bê, mirov dikarê gelek minaqên ku mirov dikarê werêne ser ziman hena. Navê jinê û tûndûtûjî, êdî wusa lê hatîya ku hevdû bi hevdû re dihênina bîra mirov. Wilqasî, tûndûtûjî, li ser serê jinê hatîya pêşxistin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di nava sînorê welatekî de, dema ku mirov li rengê sîyesetkirina wê binerê, mirov wê bi gotinên wê ên ku di wê sîyesetkirinê de re di hênina ser ziman de mirov wê hebûna temenê tûndûtûjiyê jî bibînê. Her wusa, gotinên ku bi zihniyetî di vê çerçoveyê de dihênina hanîn li ser ziman, wê rengê tûndûtûjiyê jî bidina dîyarkirin. Li kurdistanê, dema ku mirov li rengê sîyeseta rejima tirk, dinerê, mirov biawayekî vekirî wê dibînê. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, dûbare werêne ser ziman ku çendî destavêtin û hwd, bi destê rayadarên rejima tirk bûna, ew rayadar bi kirinên xwe re ne hatina darazandin. Ev jî, bûya weke aliyekî ku hertimî ew destavêtin û temenê wê bê domandin. Li kurdistanê, destêavtinên ku bi destê rayadarên tirk bûna ên weke li dersimê, herêmên botanê, herêmên serhedê ên weke Sêrt, bedlîs, batmanê û hwd ku bûna, hemû jî, dadgeha tirk, wê çawa ser bûyara bide nûxûmandin, di wê çerçoveyê de tevgerîya ya. Herî dawî jî, minaqa vê jî, ew a ku li Dersimê ku 8 leşker tecewûzî

keçeka kurd a piçûk dikin û piştre dadgheha tirk biryarê dide û dibêje ku ”bi rizaya keçikê pêkhatîya.” Ev jî, bûya temenê domandina van kiryarên bi tûndûtûjî ên li hemberê li ser jinê. Tecewûz, destavêtin û her cûre tûndûtûjî politikaya dewletê ya. Weke ku li dersimê bû, pêşî 8 leşker tecewûz û destavêtin dikin û piştre, bo ku wan paqij derxe, dadgeh dibêje ”bi rizaya keçikê ya.” Gotina ´bi rizaya keçikê ya, rengekî politikaya dewletê ku bi dixwezê hem tecewûz û destavêtinê bi rengî bi destê rayadar, leşker û polîsên dewletê bide domandin a û hem jî, êdî ku bi vê gotinê piştî ku ev tecewûz hatina kirin, êdî ku werênina ser ziman û ku bi wê temenê domandina wê politikaya destavêtin û tecewûzê bidina domandin a. 8 leşker, dema ku destbiavêjin û tecewûzê bikin, çawa dibê ”bi rizaya keçikê”?? Yênk u nesibê xwe ji mirovatiyê negirtina û zihniyeta ne zihniyeteka mirovî ya, tenê dikarin wê detavêtin û tecewûzê bikin û bi vî rengî bibêjin ´bi rizaya keçikê ya.´ Di hemû bûyarên tecewûzê ên ku bi destê rayadarên dewletê, leşker û polîsên dewletê bûna de, ev gotina ”bi rizaya keçikê ya” hatîya bikarhanîn û bi wê re tecewûzkar hatina parastin. Piştre jî, ev rewş, bûya temenê bûyîna rewşên ên weke yên tecewûz û destavêtinên li deverên din bi destê van rayadarên dewletê, leşker û polîsan.

Ya rastî, li vir ew a ku divê ku mirov werêne ser ziman ku destavêtin, tecewûz û hwd, li ser serê civate kurd, weke politikayekê dihê meşandin a. Ne tenê rejima tirk, rejima îranê jî, di vê çerçoveyê de destavêtinê weke politikayekê pêş dixe. Rewşa keça kurd di van rojên ku ez van rêzan dinivîsênim de ku di rojevê de ya, rewşa keça kurd ferînaz Xosrowanî, minaq, nîşanak û birhana vê yekê ya. Her wusa, bûyarên destavêtinê ên ku rayadarên tirk li bakûrê kurdistanê li herêmên weke botanê, sêrt, bedlîs, batmanê û hwd kirina, minaq, nîşanak û birhana vê yekê ya. Her wusa, rewşa zarokên kurd ên girtî ku li zindana ´bozantiyê´ jî li vir divê ku mirov bi teybetî binê wê xat bike û werêne ser ziman. Minaqe herî mazin ya tûndûtûjiyê ya bidestê rayadarên rejimê ya. Zarokên kurd, bi hênceta kevir avêtina di xweşandinan de, wê werina girtin bi armanca tafisandin û bêdengkirina wan di nava civatê de û wê di zindana de bicih bikin û wê wê tûndûtûjiyê li wan bikin weke ku li zindana bozantiyê kirin û hwd. Di rojên ku zindana bozantiyê ket rojevê de, hikimeta tirk, bo ku pêşîya bertekan bigrê, ragihand û got ku "me, heyetek mufettişan akirîya û wê herê girtîgehê û wê raporê amede bikin.´ Li ser vê ragihandinê re, herkesek li bendê bû ku heyet raporê amede bike û li ser raporê re doz were vekirin û sûcdar werina derizandin. Lê ew

heyet, piştre hebûn û ankû nebû, pirr nepenî ma. Rapor amede kir û ankû amede nekir, ew jî, piştre hat dayîn ji bîrkirin. Piştre jî, bûyar, hat xwestin ku ti kesek li ser wê neaxivê û newêne rojevê û ser wê were nûxûmandn. Piştre jî, ya ku bû ev bû.

Di bin politikayên rejimek weke rejima îranê û rejima tirk ku hertimî komkuji û zilmê dikin de, wê êşa herî mazin bahre Jinan bê. Ji xwe, tiştên ku dihêne serê jinên kurd ku li rojhilatê kurdistanê ku rejima îranê kiribê û ku li bakûrê kurdistanê ku rejima tirk û hwd kiribê, nayêna rojevê jî.

Ji xwe malên ku weke "malên parastinê" ku rayadarên rejimê(li bakûrê kurdistanê, ku rayadarên rejima tirk avakirina) vekirina ku qaşo jinên ku rastî tûndûtûjiyê hatina ku di wan de bicih bikin, weke cihna ku di wan de rayadarên rejimê bixwe jî, hem destavêtinê dikin û hem jî tûndûtûjiyê di wan cihan de dikin. Her wusa, li vir, rewşa jinê, hatîya xistin rewşeka wusa de ku di her beşên jîyanê de li wê tûndûtûjî, bi fizîkî, derûnî, civaknasî û hwd dihê kirin. Di aslê xwe de ´malên parastinê ên jinê´ ên ku rejimê vekiribûn û her wusa bi wê re jî, malên parastinê ên bo zarokan´ ên ku qaşo bi navê weke ”sevgî evî” û hwd, ku rejimê vekiribûn, malna ku di wan de destavêtin û tûndûtûjî hebû bûn. Ji wê zêdetirî jî, malna wusa bûn ku mirovên ku diketina wan de êdî weke ku winda dibûn li wan dihat. Çi ji wan dihat, ti kesekî ne dizanî. ..

,,

**Hêza jinê**. ..

Evîn, weke hêzeka gerdûnî ya bêsînor jî, ku mirov wê bişibêne, wê rast bê. Ev hêza bêsînor, salixkirina wê ku hatiba kirin, weke ku bi atomê re dihêkirin, wê bi wê mirov gihiştiba hêzek pirr mazin ya gerdûnî. Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku hertimî, mirovên ku aqil meşandina, kirina û xwestina ku weke têgînekê rastîya evînê têbigihin. Bo vê yekê, li ser wê pirr serî wastandina.

Serî wastandina li ser heyîna evînê, di çerçoveya têgînek zindiyî de ya. Di vê çerçoveyê de fahmkirina cewherê hêzkirinê û rastîya wê ku weke ´rastteqînîyekê´ dihê têgihiştin, wê di temenê vê fahmkirinê de bê. Rastîya evînê, bi hêzek civaknasî ya civatî re ya. Her wusa, li ser wê re bi têkilîyeka ku mirov wê bi xwe re pirr zêde hîs dike ya. Hîskirin, her wusa, di temenê wê de hem zindîbûna mirov û hem jî aqil û zanîna mirov

heya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi rastîya wê re fahm bike û werêne ser ziman.

Rastîya evînê, her wusa, weke hêzeka ku di cewherê pêşketina yaqînîyê de ya. Bi dîrokê re mirov dibînê ku gelek zanyer, dikin ku li ser rastîya dil re bi evînê re famkirinekê bikin. Îştar, Eşnûna û hwd, hinek ji vê rastiyê na. Her wusa bi wê re jî divê ku mirov werêne ser ziman ku li ser xatên bawerîyê ên êzdayî re ku heta ku digihijê Manî û hwd jî, mirov kifş dike ku li ser evîn û dil re dikin ku fahmkirinê bi jîyanê re bikin. Têkilîyaka baş, di vê çerçoveyê de şîrove dikin.

Hewldana fahmkirina hêza evîn û hêzkirinê, wê hewl bê dayîn ku were fahmkirin. Her wusa evîn hêzkirin, çawa dikarê ji dil bide têgihiştin, li ser wê re fahmkirinê bi xwe re dihêne. Têgîna "dema ku tû baş bê, wê yê li hemberê te ji te re bi wê re baş bê." hinekî, di vê çerçoveyê de wê têgînekê bide me. Felsefeya evîn û hêzkirinê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov balê bikişêne li ser wê. Her wusa felsefeya evîn û hêzkirinê, bi têgîna ´ya baş´ û ankû ´ya qanc´ re xwe dihêne ser ziman. Ya baş û ankû qanc, ya ku ji mirov re baş a, wê nîşan dike.

Ya rast û ya baş, di nava felsefeyên ku mêya xwe ji xate êzdayîyê digrin de li pêş a. Her wusa, felsefeyên weke ên Bûda û hwd, di vê çerçoveyê de mirov dikarê minaqê bide nîşandin. Piştre jî, ev felsefe, çendê ku hinekî ´deforme´ bi wan re hatîya pêşxistin jî, lê dîsa di vê çerçoveyê de wê karibin têgînekê bidina me.

Herî zêde, di vê warê de dema ku mirov li nava civate kurd dihizirê, têgînên bi vî rengî, pirr zêde mirov rastî wan tê. Gotinên weke ´qancî bi qancîyê´, weke gotinna ku em bi têgînî di civatên kurdan de dibihîzîn a. Her wusa ev gotin, têgîneka evîn û hêzkirinê di temenê xwe de di xwe de dihawênin. Her wusa, di çerçoveya têgînekê de bi têgînî hertimî li ya ´baş ´ û ´ya qanc´ lêgerîn, divê ku mirov li vir bi teybetî wê werêne ser ziman ku mirov dibînê ya. Di nava civatên kurdan de ´evîn´, weke gotinaka navdar a. Pirr zêde bahse wê hatîya kirin. Li ser wê re weke helbestên evînîyê ´mamik´ bi kurdî pirr zêde hatina gotin ji nava lêvên ciwanên jin ên kurd.

Heta roj tê roja me jî, em vê yekê di vê çerçoveyê de dibînin. Her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku rastîya evînê, weke ku hewl hatîya dayîn ku were salixkirin. Têgîna evînê, weke ´vejenekê´ û ankû ´hêzek´ ku ne hatî salixkirin li wê hatîya lêhizirîn. Di vê çerçoveyê de weke hêzeka di gerdûnê de ku ne hatî salixkirin li evînê hatîya hizirîn.

Têgîna ´başî´ û ankû ´qancîyê´, divê ku mirov bi teybetî li wê

bihizirê. Her wusa, li ser van têgînan re pirr zêde li wan hatîya hizirîn û salixkirin. Hizirkirina li evînê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke hizirkirinaka bi têgîna baş û ya qanc jî lê hatîya hizirîn. Ev hêz, dema ku mirov li wê dihizirê bi zindiya mirovî re weke têgîneka nirxî ya şîrovekirina rengê jîyanê ya. Mirov, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku evîn, rastîyeka ji dil a. Weke hizreka ji dil a. Her wusa, weke ´hizîrîneka ji dil´ a.

Em dikarin vê ´weke hizirîna ji dil´, bi rengî dîtina bi dil jî bixwênin û werênina ser ziman. Dîtina bi dil, bandûra wê, hertimî hatîya hîskirin di jîyanê de. Her wusa, gelek gotinên civatî ên civate kurd bi kurdî hena ku bi wan dihê gotin ku bi wan tê gotin ku "tu dikarê bi qanciyê mar jî ji qûla wê derxe." Ev gotin û gelek gotinên ku weke vê ku bi heman şêwa û têgînê hatina gotin, rengekî ku bi wan dihê ku bandûra hêze evînê were hanîn li ser ziman a. Hewldana salixkirina ´hêze evînê´ her wusa di vê çerçoveyê de bi têgînî li ser aqil bûya. Lê têgîna aqil, weke hêz û vejeneka razber, hertimî di temenê lêgerînên mirov de ya. Ew têgîna hêz û vejene evînê, weke têgînek ´rastteqînî´ jî ku li wê hatîya hizirîn, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bi rengê dîtina mirov re di çerçoveya têgîna ´başî´û ankû ´nebaşîyê´ û hwd de xwe dide dîyarkirin.

Hêza evînê, weke ku çawa fîzîkvanek li ser atomê re li vejene atomê digerihê û wê kifş dike, wê têgînên bi bawerî jî, bi heman rengî li têgîna hêza evînê bi zaneyî û ankû ne bi zaneyî bê, wê lê bigerihê. ..

**Bêgûman**, dema ku mirov weke ku me di mijara li ser vê ya bi navê ´jin û tûndûtûjiyê´ de hanî ser ziman, rewşa tûndûtûjiyê a li ser serê jinê ku mirov li wê dihizirê, mirov rewşek pirr xirab dibînê. Ev aliyên tûndûtûjiyê, destavêtinê û ´îstîsmarkirinê´ hwd, mirov dikarê weke ancamna zihniyetê jî werênê ser ziman in. Lê li vir, divê ku mirov beremberê vê tûndûtûjiyê û hêrîşa li ser serê jinê re wê hêza jinê jî ku karibê bi wê li hemberê wê bisekinê jî werêne ser ziman. Jin, hêza jîyanê ya. Her wusa ku mirov wê wusa werêne ser ziman, wê ne şaş û xelat bê. Hêza dil û hêstîyarîyê, dibê ku em nikaribin, wê bi şenberî î ro bi dest bigrin. Lê em divê ku werênina werênina ser ziman ku î ro di temenê ´aqilê hêstîyar´ de ew têgîna bi dilî û evînî ya dilî heya. Her wusa, ev jî, malzaroka wê jin û ankû dayikîtîya wê ya.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov jinê bi rewşa wê ya jîyanê re kifş bike. Her wusa rastîya wê werêne ser ziman. Rastîya jinê, li vir, weke mijaraka herî giring ya jîyanê a ku divê ku mirov fahm bike û werêne ser

ziman a. Fahmkirina mirov a bi jinê re ku li ser temenekî rast bê, wê di çerçoveya derûnîyek baş, rast û dûrûst de wê bi civaknasîyeka têgihiştî a di jîyanê de wê temenê gihiştina li hevdû biafirêne. Hizrên ku li ser xweşikatiyê dihên hanîn li ser ziman, wê hêza dilê jinê bi xwe re di temenê xwe de dihawênin.

Têgîna xweşikatiyê, hizrên dilî weke evîndarîyê û hwd, weke aliyna ku mirov divê ku wan bi teybetî hilde li dest in. Her wusa, hizrên evîndarîyê, hêzîyekê bi xwe re di çerçoveya gerdûnîya mirovî de dihênin ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku jin, hertimî weke rastîyeka jîyanê ya afrîner a. Di serdemên buhûrî de bi îştar, eşnûna û hwd re, pîrozkirina weke xwûdawendekê û hwd, di vê çerçoveyê de li ser bidil dîtinê re bûya. Bi dil dîtinê re, rastîya jinê ji aliyekî wê yê mazin ve dihê ser ziman. Ev, weke aliyekî nirxî ê ku mirov wê binirxêne jî ya. Nirxandin, rengê fahmkirina mirov a li ser esasê hêstî, dil, bawerî û hwd re ya. Her wusa, têgîneka hêstîyarîyê, weke ku li ser zimanê kurdî re jî mirov wê kifş dike, ji hîskirinê bi ber rastîyê ve xwediyê pêvajoyek fahmkirinê ya.

Têgîna jinê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke aliyekî giring ê jîyanê ya. Dema ku mirov bahse jinê bike, ji van aliyan ve mirov dikarê ji gelek aliyan ve wê werêne ser ziman.

Hizirkirina li jîyanê, mirov di nava wê de bi fahmkirina mirov û hişkirina di derbarê wê de re dibê. Hişkirin, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna bi dîtinê ya fahmkirinê ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku fahmkirin aliyekî giring ê ji jîyanê ê bi jîyandina mirov re ya. Jîyandin, li ser esasê zîndîbûna mirov a. Her zindî, dibê û tê dûnyê. Mirov, wilqasî ji rastîya dûrketîya û beyenîbûya, weke ku nexwezê ku li vê rastîyê û aliyê bihizirê. Dema ku li bûyînê û temenê bûyînê binerê, wê di jîyanê de bi şenberî ku wê dike, wê rastî jinê û heyîna wê were.

Hêza jîyanê ya afrîner jin a. Mirov divê ku vê yekê, bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku mirovê ku bo bûyîna xwe ya ji jinê, ku divîyabû ku lê minnettar ba, zilma ku li wê dike had û hasabê wê tûna ya. Î ro, tenê ku mirov li gotina ´pirsgirêka jinê´ bi xwe jî binerê û nîqaşên ku li ser vê gotinê re ku hatina kirin jî ku mirov li wan binerê, mirov wê vê rastiyê bibînê. Di aslê xwe de, gotinên weke ´pirsgirêka jinê´ û hwd, ancama mejiyê mirov ê nexweş a. Her wusa, pirsgirêkên civatan, ku bi destê

desthilatdarîyan diafirin jî, mirov dikarê bi heman rengî werêne ser ziman. Mejiyê nexweş ku ne ji jîyanê re dinerê, lê ku tenê ji têgînek bîrdozîkî re dinerê re, mirov bi wê re vê yekê kifş dike.

Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku mejiyê roja me ê ku bi têgîna mêr re bûya desthilatdar, ev mejiyê nexweş a. Hemû pirsgirêk, ji wê tên. Ji xwe, mirovê ku lê ajoya wî serdest ê egoîst û mazosist, û ya keseyetîya desthildatdar ku hertimî dike û dixwezê ku bibe desthilatdar, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman.

Ez li vir, divê ku vê yekê werênima ser ziman ku hêza evînê, hêza herî jîyanî ya xort a. Ev hêz, weke hêzek nirxî ya jîyanî ku mirov dikarê weke hêza afrînerîya mirov ya jîyanê jî werêne ser ziman a. Evîn, hêstîyarîya di nava têkiliyên mirov de ku pêş dikeve ya.

Têgîna jinê, li vir, dema ku ez li wê dihizirim, ez vê yekê bi awayekî vekirî dibînim ku hêza afrînerî û ya evîndarî jî, bi jinê re na. Ya ku di aslê xwe de temenê desthilatdarîya li jîyanê na jî. Ya ku mirov di jîyanê de dike kirde jî, ev in. Her wusa têgînên ku şerê wan bi jinê re dihên dayîn jî, ev in.

Dema ku mirov rastîya jîyanê dihizirê, her wusa, mirov wê têgînê hîs dike ku mirov ku bi jîyandinî nebê, wê jîyanê jî nebê. Ev weke întîbayakê û têgînekê bi mirov re diafirê. Lê li vir, divê ku mirov dûbare bi wê re jî werêne ser ziman ku jin, bi hanîna li dûnyê, yanî bi bûna dayik û dayikatiya wê re, her wusa wê afrînerîyê çê dike. Ew ji wê ya. Evîn ji dilê wê ya. Bûyîn, ji laşê wê ya. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de gotina ´dayika jîyanê´ bi tememî rastîya wê, di vê çerçoveyê de dihêne ser ziman.

Mirov, hemû kirin û kiryarên xwe li hemberê dayika xwe û ankû wê ´dayika jîyanê´ kirina. Û ankû dike. Heta roja me, hemû hêrîşên li bedena jinê û her wusa li mejiyê wê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov bibîr bixe. Jin, hertimî, weke kirdeya jiyanê, gotinaka wê ya li jîyanê heya. ew dide jîyanê û her wusa dide jîyandin. Çawa wê were jîyîn, ew wê fêr dibê. Li vir, çendî ku jin, ji aliyê zihniyeta baviksalarî ve were bindestkirin jî, dîsa wê fêrbûnê bi xwe re dike û wê jîyanê, weke kirdeyekê ji hîmî ve dide kifşkirin û pêşxistin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi gotinî bê û ankû bi fîzîkî û hwd bê, her hêrîşa li jinê, li hemû rûmeta jîyanê ya. Di serî de divê ku mirov binê vê xat bike û vê werêne ser ziman.

Li vir, ez dixwezim ku gotinekê ji aliyê mêr ve jî bibêjim. Di sedsala

me de bûya weke gotinaka ′moda′ ku hertimî dihê gotinê ku ′mafê jîyanê.′ Lê rêz û hûrmet jî, ji vê gotinê re nayê dayîn. Her wusa, mirov weke mêr, hertimî li wê mafê jîyane xwe digerihê. Lê li vir, tiştekî ji bîr dike ku yê ku ew mafê jîyanê dayî wî jî, ew jin bixwe ya. Di serî de divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman. Ew mafê jîyanê ku jinê dayîyê de, ′bahse wê dike. Lê ′ew kesa ku weke dayik ku ew jîyan dayî wî û ew jî bi gotina ′mafê jîyanê′ re ku wê diparêzê, mafê wê dayikê ê jîyanê, rêz û hûrmetê ji wê re nagrê. Wê naparêzê.

Ku mirov, bi awayekî rast û pak bihizirê, bi gotina ′jîyanê′ re jin dihê berbîra me. Ya ku afrîner û dihêne dûnyê ew a. Ya ku di vê çerçoveyê de rêz û hûrmeta afirandinê bi maf dike jî ew a. Di serî de divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ya ku jîyanê diafirêne ew a.

Di serdemên buhûrî de weke xwûdawend hanîna li ser ziman jinê bi keseyetîyên weke îştar, eşnûma û hwd, hinekî ew hêza afrînerîyê ya ku bi wê re re dihat ditin re ev dihat ser ziman. Lê çendî ku ev hêza jinê ya afrîner hat ditin û jîyan afirand û adiland, piştre di wê jîyanê de şerê xwe jîyankirinê ê mirov jî bi wê re destpêkir. Ev şerê desthilatdarîya li wê jîyanê bû.

Ew şerê desthilatdarîyê ê bi jinê re ê di nava wê jîyanê de heta roja me didomê. Di roja me de, jin bi tememî ji jîyanê hatîya dûrkirin. Ew afirandina wê jî, mafê gotin gotina wê jî li ser wê ji wê hatîya standin. Di roja me de jin, li şûna bi wê afrînerîya xwe re rêz û hûrmetê bibînê, weke ′pirsgirêk′ dihê hanîn li ser ziman. Her wusa, heta ku weke ′dagera xirabîyê′ lê dihê nerîn. Li vir, pirr bale min kişand. Ji ber vê yekê, ez dixwezim ku vê yekê, werênima ser ziman ku weke zihniyetaka rayadarên îranî ku dibêjin, ′jin bila bakîra neçê dûnya din, ku bakîre herê dûnya din, wê herê bihûştê.′ Bo vê yekê jî, wê mêr destbiavêjiyê de. Dema ku wî mêrî destavêtiyê de, ew jin, weke jineka ′harimî′û ankû ′lawitî′ tê ditin. Lê yê ku wê harimandinê û ankû lewitandinê dike jî, ew mêr a. Li li vir, pirr balbêş a ku ew mêrê ku di harimênê û ankû dilewitêne, nalewitê. Lê tenê ya ku dest hatî avêtin li wê ku ew jin a, ew dilewitê. Bi gotinaka din, mêrê ku tecewûz kirî nalewitê, lê jina ku rastî tecewûzê hatî dilewitê. Di mejiyê xwe de, ev zihniyeta mêr, xwe bi vî rengî hertimî paqij dihêne ser ziman. Çendî ku dest biavêje, wê ew nelewitê. Hertimî ya ku destavêtiyê de wê bilewitê. Di aslê xwe de ew zihniyeta ku bi vê dihêne ser ziman lewitî û pîs a. Mejiyê bi vê bawer dike jî, mejiyekê lewitî û pîs a.

Heta ku jina ku destavêtina li wê bûya, dihat gotin ku destê mirov jî li

wê bikeve, mirov wê bilewitê. Ev zihniyet, di vê çerçoveyê de xwe daya bawer kirin. Bi wê re, hertimî xwe paqij dibînê. Lê di aslê xwe de zihniyeta herî lewitî û pîs, ev zihniyeta. Di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Ev zihniyeta ku hertimî tecewûzê dike, û hertimî jî bawer dike ku çendî ku tecewûzê bike jî paqij dimêne, û tenê jina ku tecewûzî wê dike ew dilewitê, divê ku mirov li ser wê bisekinê. Ev zihniyet, weke zihniyeteka herî qirêj a. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov di temenê vê zihniyeta mêr de ajoya wî, lê bipirsê. Lê bigerihê. Li ser wê re jî, divê ku mirov bibêje ku ji vê zihniyetê mirov digihijê mêr, û ji vê mêrî jî bi bi vê zihniyetê re digihijê desthilatdarîyê û hwd
. Di dewama mijarê de, em divê ku vê zihniyetê hewl bidin ku baştir fahm bikin û werênina ser ziman. ..
”

**Bi dîroka civatê re jin. ..**

Dema ku mirov li mijara jinê binerê, bi teybetî bi dîrokê re pirr demdirêj mirov dikarê werêne ser ziman. Her wusa divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku dîrokê, divê ku mirov dem bi dem bi rengên pêşketinên wê re werênina ser ziman. Têgîna zayendî, bi aqil re diafirê. Her wusa, dema ku mirov bahse pêşketina aqil bikin jî, wê di cih de serdemên şariştanî wê werina berbîra me. Pêvajoyên şariştaniyê, ji destpêkê ve dema ku mirov li wan dinerê, her wusa mirov ya ku kifş dike ku li ser aqil re pêş dikevin. Aqil û şariştanî bi hevdû re dihên ditin. Dema ku mirov bahse pêşketina şariştaniyê bike, mirov wê bi aqil û pêvajoyên pêşketina aqil re bahse wê bike.

Têgîna şariştanî, her wusa, wê temenê wê jî li ser pêvajoyên pêşketina civatîtîyê bin. Civatîtî, wê piştî serdemên berî-şariştaniyê û pê de, bidest pêşketina xwe bike. Her wusa, serdemên berî şariştaniyê, weke serdemna ku di wan de aqil zêde pêşketiya. Li ser dîtbarîyên dîtinî ku mirov dibînê û bi wan re kifş dike re, mirov dike ku têgînekê pêş bixe. Kifşkirin, wê di destpêkê de temenê aqilê mirov ê bi têgînî bê. Aqilê têgînî, her wusa, ew aqilê ku bihiş pêşketî ya. Hiş jî, wê bi xwe re pêvajoyên hişmendiyê werêne. Pêvajoyên hişmendiyê, bi jîyanê re çendî ku dihên jîyîn jî, wê êdî hin bi hin zanîn pêş bikeve. Pêvajoyên pêşketina aqil ên ji hiş û bi ber zanîn ve ku pêş dikevin, di vê çerçoveyê de wê pêş bikevin.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku aqil, çendî ku pêşketîya, wê bi wê re li jîyanê jî hiş jî pêş bikeve. Em li vir, aqil weke pêvajoyeka pêşketinê ya şariştaniyê ya hîmî werênina ser ziman. Di serdemên şariştanî de, wê jîyan û adilandina di jîyanê de bi aqil û li ser aqil re werina kirin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku aqilê mirov, her wusa, wê bi xwe re jîyane mirov di vê çerçoveyê de pêş dixe. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de dinerê, her wusa, mirov digihijê wê têgînê ku dema ku mirov biaqil dibînê, mirov êdî wê karibê pirsgirêkên xwe bibînê û çareserîyê ji wan re werêne. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku weke ku me li jor hanî ser ziman, pirsgirêkên weke pirsgirêka jinê û hwd, weke pirsgirêkna ku wê di serdemên şariştaniyê de derkevina li holê bin. Têgînên aqilî ên dema şariştaniyê, wê di temenê wan afirandina pirsgirêkan de bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di dema şariştaniyê de aqil, weke aliyekî giring bi rengê fahmkirina wê re ku mirov li ser wê bisekinê ya. Her wusa, di serdemên şariştaniyê de rengê jîyanê, wê çawa pêşbikeve ewê bi aqil dihê kifşkirin. Malbat, weke mene bingihîn ya pergale jîyane şariştanî a pêşketîya, wê di wê de temenê wê yê civatî pêş bikeve. Li vir, divê ku mirov malbatîtîyê weke aliyekî giring werêne ser ziman. Rengê jîyanê û jîyandinê wê di nava malbatê de xwe bide pêşxistin. Malbatîtî, di serdemên pêşî ên şariştanîyê de li ser wê re danûstandin diafirin. Wê di nava malbatê de mirov çawa were jîyîn, wê andamên malbatê çawa werina bi erkkirin û şîrovekirin û hwd, ev hemû li ser aqil re wê werina ser ziman. Kevneşopîyên malbatî, û hwd, wê di vê çerçoveyê de pêş bikevin.

Jîyane malbatîtîyê, wê her wusa di nava wê de rewşa jin û mêr, zaroyan û hwd, bi wê re dihê hanîn li ser ziman. Di destpêkên şariştaniyê de jî, wusa dihê ditin ku wê di nava malbatê de kî wê çi bike û çawa bike, di wê çerçoveyê de wê çawa temenê jîyanê biafirêne û hwd, li ser wê re salixkirin dihê kirin. Her wusa, dinava jîyane malê de jin, weke kirdeyeka afrîner wê hebe. Di nava malbatê de, bo ku malbate dabara xwe bike, wê jin biafirêne. Wê ji destê wê derkeve. Di nava malê de minaq, çêkirina zad û xwarinê û hwd, divê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Kedîkirina sawalan û piştre dohtin û hildana şîrê wan û ji wî şîrî çêkirina mast û panîr û hwd, wê bibe. Wê ji hîrîya sawalan, wê hûnandin û cil û hwd, werina çêkirin. Wê çandin, were kirin.

Di kirina van kar û baran de wê jin, weke aliyekê giring wê li pêş bê.

Her wusa wê jin, derkeve li pêş. Jin, wê van karan bike. Li ser van karan re jî, wê li malbata xwe binerê. Wê çerçoveya jîyane wê biafirêne û biadilêne. Li ser van kirin û kiryaran re wê bi demê re pêşketin bibe. Her wusa, ev kirinên ku wê werina kirin, aliyekî wan ê bi hiş û hişkirinê heya. Aliyekî wan ê bi aqil heya. Di vê çerçoveyê de bi aqil, çêkirina wê çerçoveya wê kirinê û hwd, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov werêne ser ziman a.

Aqilê mirov, her wusa, di vê çerçoveyê de wê van kirinan, weke ku çawa ku di jîyanê de bi kirin û tevger û çûn û hatinên mirov re ku dihên kirin re wê bi çerçove bike. Aqil, wê çerçoveya kirinê, di xwe de bi wêne û naqş dike. Li ser wê re jî, êdî wê bi dest pêşketina xwe de bike.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi çerçovekirin û li ser aqil re qaydkirina wan kirinan biaqil, wê rengekî pêşketina zêhnê mirov jî bê. Ev çerçove, çendî ku bi aqil bûn û pêşketin û pê de, wê li ser aqil re bi demê re bidest pêşketina xwe ya bi demê re bikin. Ev aqilê ji kirinê, ku ji ditin û kirinan hatîy qaydkirin, weke aqilê ku mirov weke ´aqilê piretik´ jî ku dikarê werêne ser ziman a. Her wusa, ev aqilê piretîk, êdî weke aqilê, ku ew çerçova çêkiriya wê, xwe bide dîyarkirin.

Di nava malbatê de dûbara û dûbara kirina van kirinan weke çandin, ji sawalan sûdgirtin û hwd, wê rengekî fahmkirinê ê li ser wan re di mejîyê mirov de şenber bike. Mirov, di derbarê wan kirin û tişta ku bi wan kirina re dike û her wusa tiştên ku bi wan kirinan re bidest dixe bizanebûn dibê. Dizanê ku ew çi na. Minaq, şîr digrê ji sawalan, di zane ku şîr çi ya û wê çawa ji şîr sûd bigrê. Wê ji şîr, mast û panîr çê bike. Ev, weke kirinna kişfî ên bi aqilê mirov in. Her wusa, li ser van re wê aqilekî çandî û hwd, wê biafirê.

Ev rengê jîyanê ku bi aqil û hwd, ku di nava jîyane civatî ya ku pêş dikeve de ku pêş dikevin, wê bi destê jinê pêşbikevin. Her wusa, jin, bo mala xwe wan pêş dixe. Mirov dikarê van kifşên ku malbat bi wan dihê û dijî, weke kifşên jinê ên bo malbatîtîya wê jî werêne ser ziman. Di nava jinên kurd de ku weke kifşaka jinên kurd, ´destar´ û ´tanûr´ heya. Ev herdû kifşên jinên kurd, ên ku tenê bi destê jinên kurd hatina pêşxistin in. Her wusa, weke kifşên jinên kurd, kifşên wê yên weke ´teşî´yê jî mirov dikarê werêne ser ziman. ´Destar´, ´tanûr´ û ´teşî´, weke sê kifşên ku di demên buhûrî de ku bi destê jinên kurd bûna na. Her dema ku me navê ´Destar´, ´tanûr´ û ´teşî´ û hwd, hilde, divê ku mirov werêne ser ziman jî ku ev kifşên ku bi destê jinên kurd bûna na. Dema ku em bahse ´Destar´, ´tanûr´ û ´teşî´ û hwd bikin û navê jinên kurd bi wan re nehildin, wê ne

tenê bê weke nehaqîyekê li jinên kurd, ji wê zêdetirî wê bê kêmesîyek jî.

Ev hersê kifşên weke ´Destar´, ´tanûr´ û ´teşî´ û hwd, her yekê bi erkekê pêşketîya di destê jina kurd de di nava jîyane wê ya civatî de, bo malbatîtîya wê. Destar, dema ku genim û hhwd, dihê bidest xistin, bi wê dihê hêrtin. Tanûr, wê di wê de nan wê were pêjtin û pahtin. Teşî, wê ew hîrîya ku ji sawalan hat bidest xistin, wê çawa wê bikarbênin û bikina cil û hwd, bi wê tê çêkirin. Her wusa dema ku mirov di destê jina kurd de bahse teşîyê kir, divê ku mirov di dewama wê de bahse ´tevnê´ jî bike. Tevn, dinava kurdan de bo çêkirina, mahfûr, berik û marşan a.

Ev kar û bar, wê bi destê jina kurd bin di nava civate kurd de. Di nava civate xwe de jina kurd, bo ku malbatîtîya xwe de pêşbixe û bi parêzê, wê bi destê xwe ´destar´, ´tanûr´, ´teşî´, ´tevn´ û hwd pêşxistîya. Ev kifşên ku tenê bi destê Jina kurd in. Weke van mirov dema ku li jîyane civatîya kurd û ya jina kurd dihizirê, her wusa mirov bi wê re wê vê yekê bi teybetî werêne ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bi sedana vegotin û çîrokên ku li ser van kifşên Jina kurd ku ji devê jina kurd hatina vegotin jî hena.

Jina kurd, bi van kifşên xwe û kirinên xwe, jîyane xwe ya civatî pêş dixist. Her wusa wê bi van afirandinên xwe temenê jîyane malbatîtî û hwd, biawayekî vekirî pêşxist û pêş de bir. Jina kurd, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ser jîyane wê ya di nava civate wê de li wê dihizirê, mirov gelek kirinên wê ên dîrokî ku piştre bûna malê dîrokê jî dibînê. Ev hemû, di nava ahenga jîyane xwe ya civatî de pêşxistîya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku mirov dema ku mirov li van kifşên ku bi destê jina kurd ku bûna ku li wan dihizirê, gelek gotin û kirinên weke çandî û kevneşoîkî ên jina kurd jî baştir fahm bike. Wê ji destpêka bûyîna keç zaroyan de ku çawa divê ku hin bi hin bi jîyane xwe re fêrî van karan bibin bo malbateka ku ew wê ji xwe re piştre ava bikin, li ser wê jî pirr zêde dihê sekin in. Her wusa, weke ´Destar´, ´tanûr´ û ´teşî´, ´tevn´ û hwd, ku weke kifşna ku bi destê jina kurd in, divê ku mirov bahse ´naqşê´ jî bike. Her wusa naqş, çi ya? Naqş, dema ku keçikek hin bi hin bîrewer dibû, wê bidest çêkirina naqşan, qaytanan û hwd bibe. Wê ev karên destî ên wê ku ew dike, ji wan re bihata gotin ´naqş´ jî. Naqş, navê wan karên weke naqşkirinê bi destê wê dihatkirin jî bû.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman ku têgîna afirandinê, wê di nava jîyanê de bi dest jinê pirr zêde derkeve li pêş. Her wusa, jinên kurd ên ku bi bîrewerîya dîrok û çanda xwe heta roja me

dijîn, wê hê jî, ev kar ji destê wan werin. Wê karibin bikin. Li ser van karan û domandina wan ya bi dîrokê re heta roja me ku mirov li wê dinerê, her wusa mirov vê yekê jî fahm dike ku çawa di nava malbatîtîyê de mirov ji destpêkê ve dihê perwerde kirin. Mirov vê yekê jî, dibînê. Bi gotinaka din, jin û ankû dayik, weke mamosta û perwerdekarê malbata xwe bixwe jî ya. Mirov bi rewşa wê re, vê yekê jî, bi awayekî vekirî bi wê re dibînê.

Jina kurd, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li dîroka wê dihizirê, her wusa mirov baştir gelek tiştan kifş dike. Ji ber ku dîroka wê ya civatî ya bi dîroka şariştanîyê re pirr kevntira. Ev jî, pêvajoyên wê ên pêşketinê ên bi demê re ku çawa zêdetir hena, wê dihêne ser ziman.

Pêvajoyên jîyane malbatîtîyê ya malbate kurd, di vê çerçoveyê de giring a ku mirov wê bi teybetî hilde li dest. Her wusa, pêvajoyên malbatîtîya kurd, wê bi xwe re pêvajoyna teybet, bide berçavan ku mirov wan fahm bike û werêne ser ziman. Her wusa divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têgîna malbatîtîya kurd, heta roja me, pirr zêde li ser wê ne hatîya sekin in. Rastîya wê, bi xoslet û teybetîyên wê re li ser rengê wê yê pêşketina wê re bi kevneşopîyên wê yên xosîsî re ne hatîya fahm kirin. Lê dema ku mirov ji van aliyan ve li wê dihizirê, her wusa mirov bi wê re hem rastîya malbate kurd ya teybet û hem jî rastîya afirandina jinê bi gelek aliyên wê yên teybet re kifş dike.

Pêvajoyên civatîtîya kurd, her wusa di vê çerçoveyê de giring in ku mirov wan kifş bike û werêne ser ziman. Di nava wê de gelek pêvajoyên pêşketinê ên bi aqil hena ku mirov wê wan kifş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku malbate kurd, weke aliyekî giring ê ku mirov bi wê re werêne ser ziman, afirandina jina kurd a.

Çendî ku em î ro di nava civate kurd de rastî gelek pêvajo û rewşên xirab ên bi jina kurd re tên jî, lê dema ku mirov bi dîrokê re van rewşan dike ku fahm bike û werêne ser ziman, her wusa, mirov rastîya wê baştir fahm dike. Jina kurd, kevneşopîyên wê ên berî serdema me, kevneşopîyên serdestiyê na. Her wusa, di nava civate xwe de weke kirdeyeka kifşkar mirov wê kifş dike. Têgînên bi jina kurd re ku di nava bawerîyên kevn ên civate kurd ên weke êzdayîyê re ku dihên ditin, di wê rengê de na ku jina kurd, di çerçoveyeka nirxî ya pîroz de dihê ser ziman. Minaqa vê jî, di laleşa nûranî ya êzdayî de ku dihê ditin ku jin, ji destpêka jîyane xwe û heta dawîya jîyane xwe li wir, dimêne. Her wusa, ew jina ku li wir ma jî, wê bi navê wê re pîroziyekê re bahse wê bikin.

Tefsîrên weke ên bi ´şahmaran´ re tefsîrên wê jina kurd in ku di laleşê û hwd de ku hatina çêkirin in. Her wusa divê çerçoveyê de ji tefsîr û hanînên li ser ziman ên jina kurd, mirov fahm dike ku pîrozîyek li wê hatîya baxşkirin. Li vir, mirov dikarê du nîşanak û birhanên din jî, di vê warê de werêne ser ziman. Weke ku çawa ku di nava bawerîya Zerdeştî de wê jin, bi pîrozî were tefsîr kirin, mirov wê dibînê. Her wusa, nîşanak û birhana duyemin jî, ´kevneşopîya jina kurd a hamawîyê´ ya.

Kevneşopîya jina kurd a hamawîyê, weke kevneşopîyeka ku divê ku mirov bi teybetî wê werêne ser ziman a. Kevneşopîya hemanîyê, di wê rengê de ya ku jina kurd, weke nirxekê ya. Gotina, wê ti carî li ardê nayê hiştin. Dema ku jinê tiştek bi gotinî got, wê di cih de weke wê were kirin. Her wusa, dema ku du mirov û ankû aşîr jî ji nava civate kurd ketina berhevdû de ku bi hevdû re şer bikin û ku jina kurd çû û di nava wan de sekinê û ew hamawîya xwe ya ´rengînî´ ku ji ser serê xwe avêt nava wan, wê hingî, ew mirov û ankû aşîr, dawî li şer û pevçûnên xwe werênin û aşîtîyê bi hevdû re bikin. Kevneşopîya hamawîyê a jina kurd, weke kevneşopîyek pîroz dinava civate kurd de dihê ditin û ti mirovê kurd jî, nikarê li ser hebûna wê nîqaşê bide kirin. Nikarê gotinê ji pîrozîya wê re bibêje.

Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jina kurd, kevneşopîya wê pirr kevn heya. Di vê çerçoveyê de ew di nava malbatîtîya xwe de, weke kirdeyek kifşkar hertimî maya. Lê di serdemên dawî de ku piştî ku civate kurd serdestîya xwe ji dest winda kir û pê de, êdî weke ku ev kevneşopî, were ji bîrkirin li wê hat. Andamên civate kurd ku jin jî bê û mêr jî bê, ji çand, ziman û van kevneşopîyên xwe yên pîroz dûrketin. Êdî, bi wê re têkçûna civatî jî kûr bû û bi demê re dirêj bû.

**Dema ku mirov bahse rewşa jina kurd bike,** divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Di dewama vê beşa pirtûkê de divê ku mirov hinekî li ser rewşa jina kurd ya piştre jî bisekinê. Di aslê xwe de rewşa jina kurd, wê çawa were gûharandin, wê were ditin. Weke ku me hinekî li jor bi jina kurd re hanî ser ziman ku ew çawa di malê de diafirêne. Her wusa çawa weke perwerdevanekê ya. Piştî ku civatê kurd serdestîya xwe windakir û pê de jî, vê rewşa jina kurd xwe domand. Her wusa, di malê de jina kurd, zaroyên xwe bi çand, nirx û kevneşopîya xwe ya civatî ku wê pêşengtî ji wê re dikir, perwerde dikir.

Di vê çerçoveyê de jina kurd, piştî ku civate kurd serdestîya xwe winda kir û pê de jî, weke aliyê giring ê parastvanê civatê bû. Di malê de zaroyan, hertimî bi çanda xwe re perwerde didît û mazin dibûn. Ev rewşa

jina kurd, wê heta salên 1990´î û hwd jî, wê xwe bidimê domandin. Li vir, ezê, hinekî li ser van salên 1990´î bisekinim. Lê bi wê re jî, ku di nava hevdû de, ezê li ser demên buhûrî jî bisekinim. Her wusa, di demên piştre de jî, jinên kurd, wê çawa çawa rastî pirsgirêkan werin, wê ev rewşa jina kurd, wê vegotinbar bê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê di serî de werêne ser ziman ku heta salên 1990´î jî, wê jin, hebûna civatê li ser çand û zimanê re biparêzê. Heta ku wê were gotin ku "jina kurd, ziman û çanda kurdî parastîya." Ev gotin, pirr rast bû. Wê heta van salên 1990´î jî, wê jina kurd, di male xwe de wê parastvanîyê bike. Lê ji salên 1990´î û pê de, rayadarên rejima tirk, kirin ku dest biavêjina wê rewşê jî. her wusa, weke ku me hinekî li jor bahse kiryarên rayadarên rejima tirk ên li hemberê jina kurd bi awayê destavêtinê û hwd kir de, wê di vê çerçoveyê de jî, wateyeka wê hebe. Her wusa, di salên buhûrî de, piştî ku dewletê dît ku çendî ku pêvajoyên bişavtinê pêş dixe û nikarê biserkeve, êdî kir ku dest biavêje nava malan.

Her wusa di wê çerçoveya destavêtina nava malan de, di bin navê ´perwerde kirinê´ û hwd de wê bike. Gelek bernemeyên bişavtinê pêşxistin. Hinek ji wan bermeneyên bişavtinê ên bi vê armancê, ew bûn ku navê wan ”heydê, keçikno li dibistanê”, ”yabo, min bişêne dibistanê”, ”kardêlen” û hwd bû. Bi van bermeneyan, qaşo, wê herkesek fêrî xwandin û nivîsandinê bikiran. Lê ji temen ve armanc, ew bû ku bişavtinê pêş bixin. Dema ku ev bermene li ser serê civate kurd û jina kurd dihatina pêşxistin jî, zimanê kurdî ji aliyê heman rejimê ve hatibû qadaxa kirin. Ji xwe, ew jin, zarok û mirovên ku weke mirovna nexwendî û nezane dihanîna ser ziman, di aslê xwe de mirovna xwenda û zane jî bûn. Xwandin jî û nivîsandin jî dizanin. Lê ji ber ku wan bi kurdî û zimanê kurdî, xwandin û nivîsandin dikir, ev bermeneyên asimle kirinê ên bi navê wan **”heydê, keçikno li dibistanê”, ”yabo, min bişêne dibistanê”, ”kardêlen” û hwd,** li ser serê wan dihatina pêşxistin.Mesele ne meseleya fêrkirina xwandin û nivîsandinê bû. Mesele, bo rejimê û rayadarên, meseleya ku ew jin, zaro û mirov, ku êdî bi kurdî û zimanê ne xwênin û ne nivîsênin û êdî tenê bi zimanê tirkî bixwênin û binivîênin bû. Yanî, mesele, bo rejimê û rayadarên wê, meseleya asîmle kirina wan bû. Piştî salên 1990´î û pê de, wê hinek bernema jî werina amede kirin ku bi navê "heydê keçikno li dibistanê", wê bi wê re bikin ku wê jina kurd û rewşa wê ya li malê xira bikin. Yanî, bi gotinaka din, ku wê bişavtinê êdî bikina hûndûrê malê. Tenê, keleheka civate kurd, ya ku ziman û çanda wê diparast jina kurd a li malê bû. Bi bernemayên bi vî rengî, hewl didina

ku wê keleha civate kurd jî dorpêç bikin. Li ser wê re ku êdî bikin ku wê çawa bişavtinê li ser wê pêşbixin.

Weke minaqekê ez divê ku werima ser ziman ku heta salên 1990´î, wê ji sadî 80´î jinên ciwan ên kurd, wê bi zimanê tirkî nizanibin. Piştre jî, hertimî, wan bi zimanê civate xwe bi kurdî xwe perwerde dikirin. Zaroyên xwe mazin dikirin. Lê piştre, ku rayadarên dewletê, di çerçoveya bernemeyên bişavtinê(asimlasyonê) û hwd de ku dest avêtina wan, êdî piştre, hin bi hin di wê rewşê de jî gûharîn bû. Di aslê xwe de, ji salên 1990´î û pê de, êdî wê gûharîn di wê çerçoveyê de bibe. Tevî ku tevgera azadîya kurd, tekoşîneka mazin ya hemdem û demî ya herî mazin da jî, di vê warê de ji ber ku bergirên xwe negirtin ku çand û zimanê civatê bi başî biparêzê, ket zorê de. Her wusa, destavêtina malên kurd ên ji aliyê rejimê ve, bo rejimê weke ji navikê ve dagirkirina hebûna civatê bû. Ji xwe, rayadarên dewletê jî, bi vî rengî dihanîn ser ziman. Wan digotin ku "em çi dikin ûû nakin, em nikarin, bi tememî kurdan bişivênin(asîmle bikin)." Ev rast bû. Bo vê yekê, bernemayên rejimê ên li ser perwerde û camaetan re ku li Kurdistan pêşxistin, di vê çerçoveyê de wê çawa karibê, mudahaleyê li vê rewşa malbatî ya kurd bike. Hemû bernemayên wê di vê çerçoveyî de bûn. Li ser vê esasê bûn. Di ancama wan bernemayên asimlasyonê de, wê ji salên 1990´î ku dem tê salên 2000´an, wê êdî di malên kurd de, dayikên kurd ên ciwan jî, wê bidest axiftina bi tirkî bikin. Piştre, wê rewşek, pirr acêb û matmayî bo civate kurd derkeve li holê. Çend ku navên zarokên kurd "zelal", "zinda", "Rêzan", "rûbaran", "mizgin", "zîlan" û hwd a, lê tenê levzakê jî bi kurdî nizanin. Navê wan kurd a, lê zimanê wan tirkî ya.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku bandûra çapameniya kurd jî, di van pêvajoyên tûnakirina rewşa malbata kurd de pirr zêde kifşkar a. Her wusa, rojnema, kovar, malper û hwd, hemû jî bi zimanê tirkî ji civate kurd ku zimanê wê kurdî ya re dinivîsênin. Ev rewş jî, divê ku mirov bi bandûrî wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku ev vê yekê jî, werênima ser ziman ku rewşa kurdan, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê ji salên 1990´î û pê de, ji ber vê rewşa ziman û tûnakirina wê û di nava civate kurd de bi rêya çapameniya kurd û ankû çapameniyên din bê ku zimanê tirkî lê serdest dikin, wê êdî were bertûnabûnê. Wê zingil, bo civate kurd lê bixin.

Dem, heta ku hat salên 2000´an, ew jina kurd ku di mala xwe de hertimî bi ziman û çanda kurdî, malbata xwe ava dikir û pê de dibir, wê

piştre, xwe li bayê wê tûnabûnê berdê. Wê piştre, hin bi hin di nava malbata xwe de, zimanê tirkî bidest bikarhanînê bike. Li vir, divê ku ez vê yekê bibêjim ku dayik ku li malê kîjan zimanî bikarbêne, wê bandûra wê pirr zêde li ser andamên din ên malbatê ên li malê hebe. Di vê çerçoveyê de, dema ku dayikê jî, bi dest bikarhanîna zimanê tirkî kir, êdî weke ku me li jor hanî ser ziman, wê navê wan êdî navên kurdî bin, lê wê zimanê wan tirkî bê. Ev rewş, wê weke rewşna destpêka tengezerîyên civate kurd ên piştre bin.

Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê, werêne ser ziman ku rewşa jina kurd, di vê çerçoveyê de weke ku ji aliyê rejimê ve hatibû kirin bin dorpêçkirinekê de. Êdî, wê çawa zimanê jina kurd bikina zimanê tirkî ku ew li male xwe jî zimanê tirkî bikarbêne, li ser wê kar dikirin. Li ser wê bernemayên bişavtinê(asimlasyonê) amede dikirin û bi rê ve dibirin. Li ser vê yekê re, êdî hin bi hin dikirin ku bişavtinê pêş bixin.

Rewşa jina kurd, ji van salên 1990´î û pê de, wê rejima tirk, hewl bide ku ew êdî nikaribê, li malê bibe parastvanê çand û zimanê xwe, wê di vê çerçoveyê de pêvajoyên bişavtinê(asimlasyonê) ên teybet ku bi tememê û sadî-sad ku bo jina kurd in, wê werina amede kirin. Di vê çerçoveyê de, bernemeyên xwandinê ên bi navê "heydê keçikno li dibistanê", ´yabo, min bişêne dibistanê”, ”**nirgiz**(kardêlen)” û hwd, wê werina pêşxistin. Wê di bin navê wan bernemeyên bişavtin û asimlasyonê de werina pêşxistin. Qaşo, armanca van bermeneyan, fêrkirina xwandinê bû. Li vir, divê ku mirov werêne ser ziman ku ew mirov bi xwandin û nivîsandinê dizanin. Çendî ku tê gotin ku ´ew xwandin û nivîsandinê nizanin´ jî, lê ev ne rast a. Ya ku ew jin, zarok û mirovên kurd nizanin, tenê ku bi wê bixwênin û binivîsênin zimanê tirkî ya. Pêşî di çerçoveya van bernemeyên weke ”heydê, keçikno li dibistanê”, ”yabo, min bişêne dibistanê”, ”kardêlan” û hwd de, pêşî zimanê kurdî qadaxa dikin û piştre dikin ku bi hewldana ku wan bikin tirk û ku tenê bi zimanê tirkî bixwênin û binivîsênin, van bernemeyan pêş dixin. Li vir, divê ku mirov bibêje ku pêşî zimanê kurdî qadaxa dikin û piştre li ser zimanê tirkî re di çerçoveya bernemeyên bişavtinê de wê bernemeyên weke ”heydê, keçikno li dibistanê”, ”yabo, min bişêne dibistanê”, ”kardêlan” û hwd, pêş bixin. Piştî ku zimanê kurdî qadaxa kirin û pê de, bi van bernemeyên bişavtinê ên bi vî rengî dikin ku wê valahiyê li gorî xwe li ser van ´kampanyayên” weke ên qaşo ên fêrkirina xwandin û nivîsandinê ên weke ”heydê, keçikno li dibistanê”, ”yabo, min bişêne dibistanê”, ”kardêlan” û hwd, tişî bikin. Êdî bi vî rengî ku civatê asimle bikin û tûna bikin. Lê ji temen

ve bermeneyên bişavtinê bûn. Heta ku divê ku mirov di dewama wê de werêne ser ziman ku di salên 1990´î de, kiribûbûna bi mecbûrî ku her dayik bi mecbûrî, herina dibistanê. Heta ku yên ku neçûbûban, wê ceza jî bidan wan. Ev jî, di bin navê ”her jin, divê ku xwandinê û nivîsandinê bizanibê” de bû. Her wusa divê ku mirov di dewama vê de jî, ku heta roja me tê, pêvajoyên bişavtinê ên li ser partiyên rejimê re jî werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de partîyên rejimê, hertimî, dema ku li kurdistanê di nava civate kurd de xwe birêxistin kirina, wê hewldana ku lingekê xwe yê rêxistinî ê xort ku li ser jinê re di bin navê "baskê jinê ê partîyê" de ku birêxistin kirina û li ser wê re çûna bi ser jinên kurd de. Ev rengê bi rêxistina "baskên jinê ê partiyê" weke lingekê mazin û xort ê vê pêvajoya bişavtinê ê li ser jina kurd a. Divê ku mirov vê mijara ´baskê jinê ê partiyê" bi teybetî hûr û kûr hilde li dest û şîrove bike. Bêgûman di çerçoveya mijara me de, wê têrê nekê ku mirov bigiştî ji hemû aliyan ve bernemeyên bişavtinê ên rejimê ên li ser partîyan re di bin navê "baskê jinê ê partiyê" de ku dihên pêşxistin werênina ser ziman. Lê bêgûman, ev alî, divê ku mirov bi teybetî li ser wê bisekinê. Ev, bi serê xwe divê ku bibe mijara lêkolînekê di çerçoveya bernemeyên bişavtinê û jenosîda li ser serê civate kurd de. Her wusa, tişta herî sinsî jî, ew a ku wê vê yan di bin rêxistinîyeka li ser camaetê a li ser olê re bikin û yan jî di bin navê "têgîneka demokratik" de ku ev dihê kirin a.

Li vir, dema ku mirov rewşa camaetên ku rejima tirk li kurdistanê avakirina ku wan hilde li dest, divê ku mirov werêne ser ziman ku rewşa van camaetan, weke alî û rewşeka teybet a. Di bin navê têgîna "ûmmetîtîya olî" û "biratîya olî" û hwd de, wê çawa aliyê netewî ê civatî tûna bikin û li ser wê re tirkitiyê pêş bixin, di vê çerçoveyê de li wê dihizirin. Her wusa, di bernema, vaaz û şîrove û pirtûkên olî de danîna qadaxayê li ser hebûna zimanê kurdî jî, divê çerçoveyê divê ku mirov bibîr bixe û werêne ser ziman. Her wusa, di pergale perwerdeyê ya giştî de jî, ji dibstanînên bingihîn û heta ên seretayî ên bilind ku tenê zimanê tirkî li ser civate kurd dihê farzkirin jî, weke aliyê din ê vê pêvajoya bişavtin û jenosîdê ê li ser serê civate kurd mirov dikarê werêne ser ziman.

Pêvajoya bişavtina civate kurd, di vê çerçoveyê de ji salên 1990´î û pê de, bi bernemeyên bişavtinê ên li ser pergale perwerde, li ser cametan û her wusa rêzafilmên ku dikin ku xitabî jinên ciwan bikin ku çê dikin re kirin ku bi rê ve bibin. Di vê çerçoveyê de, wê çawa nifşeka ku ji rastîya xwe fihêt dike û çawa ku ku bi zimanê tirkî xwandî û diaxivê ku xwe

serbilind hîs dike ku biafirênin, bi teybetî li ser wê sekinin. Di vê çerçoveyê de li kurdistanê, bernemeyên teybet, wê li ser jinê werina pêşxistin. Rejimê bi wan bernemeyên teybet ên weke bernemeyên bişavtinê(asimlasyonê) ên li ser jinê, bi wan dixwestin ku weke ku çawa ku kurdan digot ku "jinê, çand û zimanê kurdî parastîya û gihandîya heta roja me," ku ji vê demê û pê de, ji wê parastinê nekê û vajî wê ew jî bibe lingekî bişavtinê(asimlasyonê), di vê çerçoveyê de berneme li ser serê wê pêşxistin.

Em î ro di sale 2015´an de dijîn. Em, divê ku vê pirsê ku bikin ku çend jinên ciwan ên kurd, di male xwe de zimanê dayika xwe ê zimanê kurdî bikardihênin? Wê bersiva wê pirsê rastîya trejikî ya jina kurd ya di vê demê de ku gihiştîyê de bi rastî jî raxê li berçav. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jina kurd, weke aliyekî giring ê ku divê çerçoveyê de mirov wê hilde li dest a.

Em dema ku bahse pêvajoyên bişavtinê bikin ku çawa ket malên kurd de, divê ku mirov di vê çerçoveyê de pêvajoyên bişavtinê ên li ser serê jinê ku hatina pêşxistin, werêne ser ziman û fahm bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jina kurd, ji salên 1990 ´î û pê de, bûya weke lingekî bişavtinê ê li ser serê civate xwe jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku hertimî weke têgînekê divê ku mirov werêne ser ziman ku bo fahmkirina rastîya civatekê, divê ku miirov li rewşa jinê û malbatîtîya wê binerin. Wê ev, weke aliyekî giring bê ku mirov divê ku werêne ser ziman bê. Her wusa rewşa jina kurd, di vê çerçoveyê de jî divê ku mirov wê werêne ser ziman.

Jina kurd, ji salên 1990´î û pê de, gav bi gav bi pêvajoyên bişavtinê û bernemeyên wê re, hewl hatîya dayîn ku ew ji rastîya wê ya civatî were dûrkirin. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku rejimê bixwe jî, ev hizir kiriya ku dema ku di malê de jin, ziman û çanda civate kurd neparêzê, wê li derve ti kesek nikaribê biparêzê. Di vê çerçoveyê de nêzîkî wê dibê. Plan, projeyên bişavtinê û bernemeyên wê, di vê çerçoveyê de hatina pêşxistin. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jina kurd, ji gelek aliyan ve divê ku mirov wê û rastîya wê hilde li dest.

Pêvajoyên bişavtin û jenosîdê ên li ser serê civate kurd ku rejima tirk dimeşêne, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ji salên 1990´î û pê de, pirr zêdeyî malbata kurd bi jinê re hatîya kirin dorpêça wê de. Wê çawa ji nava malbatê ve, pêvajoyên bişavtinê biserbixin li ser wê

hatîya hizirîn û pêvajo, hatina bi rêve birin. Ji salên 1990´î û pê de, bi pêşketinên teknîkî, teknolojikî û hwd re, bi pêşketina aqil û pêşketinên mazin ên weke înternetê û hwd re ku divîyabû ku jina kurd, zêdetirî di male xwe de karîba ku xwe û çand û zimanê xwe biparasta, wê vajî wê, bi bandûra van pêvajoyên bişavtinê, wê bi ji rastîya xwe û civate xwe dûrketinê re wê van pêvajoyan êdî bijî.

Pêvajoyên serdema me ên bi aqil û teknikê û hwd pêş dikevin, divê ku mirov van pêvajoyan jî, ji van aliyan ve bi teybetî hilde li dest. Her wusa, wê bandûra van pêvajoyan bi başî û xirabiyên wê re çawa li rewşa jinê bibin, divê ku mirov van jî bi başî fahm bike. Lê li vir, divê ku ez vê yekê jî bibêjim ku divê ku mirov pêşî bi dîrokê re pêvajoyên wê ên civatî ku buhûrandina wan di berçav de derbas bike û fahm bike. Em dema ku van pêvajoyên wê ên buhûrî ku baş fahm nekin, emê wê pêvajoyên nû ên serdema nû jî baştir fahm nekin. Dîroka ku mirov buhûrandî, wê hertimî, weke neynikekê bê di rastîya mirov ya bi ber pêşarojê de. Weke ku rêberê gelê kurd birêz Ocalan jî di bêje "kêlîk, di dîrokê de û dîrok jî, di kêlîkê de dijî." Ya ku mirov di vê çerçoveyê de bi xate dîrokê re ku bi roja me re ku hata roja me heyî bijî jî, wê di vê çerçoveyê de bê.

,,

**Serdestîya civatî, kevneşopî, malbat û pirsgirêkên wê yên ku diafirin. ..**

Di çerçoveya mijara jinê de divê ku mirov li mijara civatê û malbatê jî binerê. Her wusa li vir divê ku mirov vê yekê jî di serî de werêne ser ziman ku têgîna malbatê, bi rêzkarîyên xwe yên jîyanî û kevneşopî û hwd re heya. Civat, çendî ku karîya bi ziman û çanda xwe bijî û xwe pêş bixe, wê ewçendî jî karibê ku pêş bixe. Her wusa, parastina hebûna civatî çendî ku bi nirxên wê re ya, her wusa ewçendî jî li ser têgîna çand û ziman re, wê civat û keseyetîyên civatê jî karibin xwe biparêzên.

Ji vir ve, dema ku mirov dinerê, mirov gelek aliyên weke pirsgirêk bi civate kurd re ku î ro dijîn jî dibînin. Her wusa, pirsgirêkên nav-malbatî û hwd, di vê çerçoveyê de xwe didina dîyarkirin. Î ro, li herêmên kurdistanê, herêmên ku ji çand û zimanê kurdî dûrketina û her wusa bi kevneşopîya civatî re ku nikarin xwe bijîn û werênina ser ziman, pirsgirêkên herî mazin ên civatî û malbatî jî, mirov rastî wan tê. Ji

pirsgirêkên nava malbatê û heta pirsgirêkên mazin ên nava civatî bigiştî jî di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wan bike û werêne ser ziman.

Di nava malbatê de, hemû pirsgirêkên ku dihên jîyîn, wê pirr zêde jin ji wan bi bandûr bibe. Her wusa, divê çerçoveyê de weke ku me hinekî li jor hanîbû ser ziman ku di nava malbatê de rêzgezên ku wê malbat li gorî wê bijî, bi kevneşopî bijî, ew hatibûbûna kifşkirin. Lê çendî ku mirovên andamên civatê ji wan têgînên kevneşopî ên dîrokî ên civatî dûrdikeve, wê ewçendî hin bi hin êdî rastîya civatîtîya xwe jî dûr bikeve. Li vir, di dewama wê de em divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku çendî ku mirov ji rastîya civatî dûr dikevin, ev bi xwe re wê ewçendî jî pirsgirêkên civatî di çerçoveya serdestîya wê de jî bi xwe re werêne.

Pirsgirêkên civatî, ku rû didin, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov divê ku di serî de li ser derûnî û civaknasîyê re di serî de wan hilde li dest. Pirsgirêkên civatî, di vê çerçoveyê de diafirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku çendî ku mirovê kurd ji çand û zimanê xe dûrketîya, wê di nava malbatî de pirsgirêkên mazin jî rû bidin. Her wusa, pirsgirêkên di nava malbatê bixwe de ên di rengê tûndûtûjiyê de ku rû didin, divê ku mirov, hinekî jî wan di vê çerçoveyê de hilde li dest. Her wusa, bi wê re divê ku mirov di vê çerçoveyê de werêne ser ziman ku ev pirsgirêk, gelek ji wan, aliyên wan ên derûnî û civaknasî, ku bi xwe ne hanîna li ser ziman re rû didin a.

Li herêmên bakûrê kurdistanê, di van salên dawî de gelek bûyarên ku keçikên ciwan re ku rûdidin mirov di bihîzê. Her wusa, pirsgirêkên ´întîxarê´ ên weke dawî li jîyane xwe hanînî jî di nav de divê ku mirov werêne ser ziman. Keseyet, hertimî li navengekê digerihê ku xwe di wê de werêne ser ziman. Keseyet, ji aliyê derûnî ve jî û ji aliyê civaknasî ve jî hertimî pêwîstîya wê ya xwe hanîna li ser ziman heya. Dema wan derfetên xwe hanîna ser ziman ku ji xwe re nebînê, wê êdî weke bikeve zorê de. Bi keseyetîyê re tevgerên ´sîzofrenikî´ û hwd jî, wê xwe bidina dîyarkirin. Her wusa, heta ku ev rewş, dikarin, bi keseyetîyê re derûnîyên destavêtinê ku li dervî malê û heta ku di hundurê malê de jî bi mirovan re bidina pêşxistin. Yanî, bi gotinaka din, weke "têkiliyên enses" û hwd.

Keseyet, hertimî, di nava civate xwe de bi ziman û çanda xwe re xwe dihêne ser ziman. Di nava civate kurd de çend ku bi bernemeyên bişavtinê(asimlasyonê) û hwd re, zimanê tirkî weke zimanê sereke ku dihê bikarhanîn hatîya bicihkirin jî, di aslê xwe de ev temenê hemû pirsgirêkên civatî ên civate kurd in jî. Ji ber ku ev rewş, ne li gorî rewşên çandî, kevneşopî û zimanî ên civatîya kurd in. Mirov. bi teybetî û

xosletên wê re, wê hîsê bi xwe re nabînê ku xwe bi wê re werêne ser ziman. Çend ku biaxifê û xwe werêne ser ziman jî, her timî, wê ew hîsa xwe kêm dîtinê û kêm hanîna li ser ziman wê bi wî re bi andamên civate kurd re wê hebe. Kengî wê ew, bi hîseka têr re cih bigiharêne? Kengî ku mirovê kurd, ku karî ku xwe bi zimanê civate xwe werêne ser ziman, wê ew his bigûharê.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ev pirsgirêkên xwe ne hanîna li ser ziman, her timî di temenê pirsgirêkên civatî de na. Civatek, dema ku xwe bi zimanê xwe re dihêne ser ziman, bi rengê pêşketinên weke bi çandî û hwd re, weke ku bi derûnî jî ku civatê derman bike li mirov dike. Yanî, di nava civatê de bi zimanê civatê xwe hanîna li ser ziman û axiftin, weke ´tarapîyeka derûnî´ jî ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku Berî salên 1990´î û pê de, mirov rastî, bûyarên ´întîxarê´ û hwd, wusa zêde nayê. Piştî salên 1990´î û pê de, yek bi yek zêde dibin. Piştî salên 2000´an û pê de jî, wê bi carekê re di rêjaya ´întîxarên ciwanên jin´ û hwd de, wê zêdebûn bibe. Ji ber çi, herî zêde ev rêjaya întîxarê di nava jinê de zêde dibê? Sê sedem, xwe bi demê re didina dîyarkirin. Sedemek girtina li malê ya. Ya duyem, fahmkirinê ya. **Sedema sêyem jî**, li ser xwe hanîna li ser ziman re ya. Jin, weke heyîna herî zêde ya civaknas a. Di nava malbatê de bê û ankû derve û hwd bê, ew di nava jîyanê de ya. Lê dema ku hin bi hin derfetên wê yên xwe hanîna ser ziman kêêm dibin, ev jî bi demê re dibê temenê pirsgirêkên derûnî ên bi wê re. Her wusa, hêsta xwe ne hanîna li ser ziman, ne hatina fahmkirinê, ne naskirin û hwd, wê bi gelek hêstên din re bi jinê re pêş bikevin. Ev hêst, weke gelek hêstên din jî, wê di temenê pirsgirêkên ku xwe kêm hîskirinê de bin. Mirov jî, çendî ku xwe kêm hîs kir, wê bi derûnî, xwe tûna bihasibêne û her wusa wê êdî ti pîvanê bi xwe re nede dîyarkirin. Ev, wê di rewşa nerîna wê ya di jîyanê de jî, wê xwe bide dîyarkirin. Mirov, di şibekeya xwe ya nerînê de ku bi wê li jîyanê dinerê de pîvanên xwe yên nerînê diafirêne.

Pîvanên keseyetîyê, wê di temenê wê de nirxên civatî hebin. Hal û tevgerên mirov ên ku bi wan di jîyane xwe de tevdigerihê, bi çand û kevneşopîyên civatî re hena. Her wusa, dema ku hêrîş li çand û kevneşopîyê dibin, li van pîvanan dibin. Li vir, di dewama wê de divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ne hiştina ku bi çandî û kevneşopî û hwd ku li ser çand û kevneşopîya xwe re ku civat xwe biafirêne, di serî de wê di van waran de weke pirsgirêkan xwe bidina dîyarkirin. Ne hiştina ku civat xwe biafirêne bi çandî, wê keseyetîyê di nava malbatê de bike

nava tengezerîyan(kriz) de. Keseyet, wê hertimî li rengekî jîyanê û pîvanên wê bigerihê ku bi wan bijî. Dema ku wan nebînê, wê êdî pirsgirêkên jîyanî bijî. Wê di nava mejiyê xwe de di nava lêgerîneke de bê. Her wusa, ev rewşa keseyetîyê ya di nava lêgerînê de ya, wê keseyetîyê ji her cûra bikarhanînê re bide vekirî hiştin. Wê, keseyetîyê bike, her rêyên ku derkevina li pêşîya wî de. Mejiyê, vê keseyetîyê, wê başî û ne başîya wan rêyên ku derkevina li pêşîyê ne hizirê. Wê hema xwe biavêjîyê de. Her wusa, ev rengê keseyetîyê, hertimî bûya temenê bikarhanîna wê ji aliyê rejima tirk ve ku li ser serê wê serdest a.

Ev rengê keseyetîyê, rengê jîyanê ku ji wê re dihê pêşnîyarkirin dijî. Bi derûnîya, metingerê xwe dixwezê ku bijî û ankû bawer dike ku ew ya rast a ku bijî. Bi hal û tevgerên xwe, weke metingerê xwe dihê. Bi cil û bergên xwe dixwezê ku xwe weke serdestê xwe bike.

Ev rewş û hemû rewşên ku weke na, wê di temenê valahîya keseyetîyê de bin. Ji xwe, keseyet, valahiya herî mazin bi dûrketina ji ziman û çanda xwe re wê bijî. Ji ber ku wê bi nirxên xwe yên civatê û hwd re êdî najî. Dîrok, çand û zimanê civate xwe nizanê. Dibêt ku andamê civate kurd, nezanîna zimanê civate xwe, tenê weke nezanînekê dibînê. Lê di aslê xwe de ji aliyê civatî ve bi derûnî, civaknasî û hwd ve, bi gelek aliyên din ve jî temenê valahiyên mazin û tûnabûna keseyetîyê ya.

Ev rengên pirsgirêkên civatî, herî zêde bi jinê re wê xwe bidina dîyarkirin. Ji ber ku jin, weke kirdeya herî zêde ya wê jîyanê ya. Dema ku pirsgirêk, bi wê çand û zimanê wê yê civatî re dibê, wê herî zêde di warên derûnî û hwd de xwe bi wê re bide dîyarkirin.

Jina ku ji çand û zimanê civate xwe dûrketî, weke masiyê ku ji avê hatî derxistin û bi wê ji avê derxistinê re ku bêbêhn maya ya. Ziman û çand, rêya xwe hanîna li ser ziman a andamên civatê ya. Bi kevneşopî jî, rengê jîyanê dihê dîyarkirin.

Di dewama vê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku dema ku mirov bi kevneşopîkî û çandî û hwd, ku rêgezên xwe yên jîyanî ku li gorî wan bi pîvan ku dijî ku ji destê diçê, wê piştre weke ku di nava civate kurd de dibê, wê xwe li olê bipêçê. Wê valahiya xwe, wê bike ku bi olê re dagirê. Li vir ol, weke artartnatifekê ya. Lê wê ol û bawerîyê jî, li gorî rastîya wê û rengê rast nikarê bijî. Ew jî, rejim, çawa bi wê dide jîyankirin, wê dijî. Her wusa, wê ola rejimê bijî. Êdî, ew rêya ku weke rêya xilasiyê ku ji xwe re ditî û wê dijî, wê weke rêyeka ku ew dihê kirin bin sehêt(kontrol)ê de bê.

Li vir, çendî ku ev keseyet, li rêyekê ku bi keseyetîyî bijî ku lê digerihê, wê ew wê nebînê. Ji xwe, serdest û metingerê wê, wê nehêle ku ew bi keseyetîya civate xwe ya dîrokî re jî hevnasînê çê bike û bi wê re bijî. Ji kevneşopîya xwe dûrketîya. Di aslê xwe de ji çand û kevneşopîya xwe dûrketin, wê ji nirx, çand, kevneşopî û pîvanên keseyetî, malbatî û civatî jî dûrketin bê. Wê temenê, hemû pirsgirêkên ku bi keseyetî, malbat û civatê re biafirin bê. Vêca serdemeka ku bi aqil û pirr bi tevlîhevî pêş dikeve, ku bi wê re mirov werêne ser ziman, divê ku miirov bibêje ku giringîya çand û ziman, pirr zêde xwe wê xwe bide dîyarkirin.

Jîyane malbate kurd û her wusa jina kurd, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bi awayekî ji rastîyên wê yên civatî, çandî, kevneşopîkî û zimanî hatî dûrxistin re di nava rengê jîyane ku metingerê wê ku bi zimanê xwe re bi kovar, rêzafilm û hwd re ku dide kifşkirin re heya. ne li gorî rastîya wê ya. Jin, di nava malê de ku mejiyê wê bi rêzafilman dihê adilandin û kifşkirin dijî. Wê çawa li xwe binerê û li hewirdora xwe binerê, bi wan rêzafilm û hwd didina kifşkirin. Modela jîyanê ku di serê wê de bi wan rêzafilman û hwd, ku ji rastîya civate wê dûr dihê rûniştandin, wê weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov wê werêne ser ziman bê. Ev mijara, ku rengekî modela jîyanê ku bi wê jîyane wê dihê kifşkirin, em divê ku hinekî din jî li ser wê **bisekin in**.

.Di dewama mijarê de divê ku mirov hinekî li ser ´modale jinê´ ku bi rêzafilman û hwd dihê afirandin jî li ser wê bisekinê. Ev rengê modela jinê, wê çawa jinê bikina bin kontrola rejimê de û hwd, di vê çerçoveyê de dihên pêşxistin. Wusa dihê kirin ku jin, dervî van ´klîşe´yên ku bi rêzafilman û çapemeniyê ku dimejiyê wê de hatî afirandin û hwd û pê de, li tiştekî nahizirê. Di vê çerçoveyê de tîpolojiyekê li ser çapameniyê re diafirênin. Ev tîpolojî jî, weke tîpolojiyeka ku wê çawa jinê bi wê re bikina bin kontrola xwe de. Jinên kurd, ên ku bi navê xwe derdikevina li pêş jî, yan ji nedîtî ve tên û yan jî, wê li ser çapameniyê re hêrîşî wan bikin ku ew weke ´rol model´ ji aliyê mejiyê jinên kurd ên civatî ve ku newê dîtin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku jinên kurd, bi navê dîroka wan, ti jinên ku hatina derxistin û li pêş tûna na. Tevî ku bi hezaran minaqên ku werina dayîn hena jî, bi zanebûnî, ew ji berçav dihên dûrkirin. Her wusa, di nava rûpelên dîroka civate kurd de, mirov rastî gelek minaqên keseyetîyên jinên kurd tên, ku bi hêz, qûdret û zanîn û keseyetîya xwe re ku derketina li pêş û mohra xwe li dîrokê xistina, tên.

Li vir, divê ku miirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna

´magazînê´ û hwd ku li ser çapameniyê re hatî pêşxistin, divê ku mirov bike berlêpirsînê de. Magazîn, çend ku weke çapameniyeka civaknasî derdikeve, bi heman rengî, li ser jinê û hwd re, wê çawa werênina ser ziman, wê bi zayendetîya wê re derdixe li pêş. Ji aliyê zayendî ve jin çawa dihê îstîsmarkirin, bi awayekî vekirî, bi têgînên ´maagazînîkî´ û hwd re mirov wê baştir dibînê û kifş dike. Bi wê re jî, keseyetîyên ku bi çapameniya magazînê re derdixina li pêş jî, ew in ku wê çawa li gorî rejimê û têgîna wê bijî ya. Wê çawa dernekeve dervî sînorê wê. Wê çawa serî li hemberê rejimê bitawêne û hwd, ev alî bi gelek aliyên din re bi wê re hena. Lê ji wê zêdetirî, li ser magazînê re, tîpolojiyek bi keseyetî, dihê derxistin li pêş ku bi nûçeyên civakasî û zayendî û hwd re ku di mejîyan de bidina rûniştandin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî binxat bike û werêne ser ziman ku magazîn, çerçoveyeka keseyetî, diafirêne ku wê jin çawa zayendetîya xwe ya cinsî derxê li pêş û bi wê re bijî. Her wusa, li şûna aqilê jinê û vîna wê, laş û tîpê wê li pêş a di nava magazînê de.

Keseyetîyên ku di nava rûpelên magazînê de dihên ser ziman jî, wê çawa li gorî têgîna rejimê bin, li wê dihê hizirîn. Minaq, ev çapamenî, çendî ku rayadarên rejimê, wê li ser tv´yan, rojnemeyan û hwd re, ku di nava civate kurd de jî ku belav dikin jî, lê winê tenê keseyetîyekîya ji wê civate kurd û bi zimanê wê jî di nava wan rûpelên wê de nebînîn.

Civatek, dema ku andamên wê ji rastî û pêşketinên dîroka wê dûrketibê û bi zimanê wê ne hizirin, hingî ew civat, hatîya ber tûnabûnê. Ankû, ew civat, têkçûya û ji dîrokê diçê. Divê ku mirov van aliyan bi teybetî werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku keseyetîya civatî, bi xwe re têgîna civatî dihêne ser ziman. Civat, xwe bi wê re zindî dike. Ya ku , bi ziman, çand û kevneşopîya civatê re pêşîya wê dihê girtin jî ev a. Yanê, bi gotinaka din, wê çawa pêşîya pêşketina civatê were girtin li wê dihê hizirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, di çerçoveya têgîna jenosîda li ser serê civatekê de werêne ser ziman ku biqasî bi komkujiyên fizîkî, çandî û hwd ku ew civat dihê ji holê rakirin, ew pêşketina ku ew civat wê bi dîrokê re bi xwe re çêkiriba, girtina pêşîya wê jî, divê ku mirov, weke komkujiyeka ku bi dîrokê re hatî hanîn li serê wê civatê bibînê û werêne ser ziman.

Ya ku heta roja me tê serê civate kurd, ji vê aliyê ve jî divê ku mirov li wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Her wusa, biqasî bi komkujiyên fizîkî û çandî û hwd, ku pêşketina civate ku bûyî ku hatîya ji holê rakiirin, wilqasî jî, ew pêşketina ku wê êdî vê civate kurd bi xwe re

çê bikira jî pêşîya wê hatîya girtiin. Hê jî, dihê girtin. Divê ku mirov, rastîya têgîna jenosîdê, ji vê aliyê ve jî li ser wê bihizirê.

Di aslê xwe de, hemû hêrîşên ku li jina kurd dibin, hinekî jî ji van aliyan ve jî, divê ku mirov lê binerê. Her wusa, wê çawa civate, bi pêşketina wê ya ku bi xwe re çêkirî ji holê ra bikin, wilqasî jî ew pêşketina ku di demên xwe yên pêş de ku wê bi xwe re çê bikira pêşîya wê girtin jî, bi heman rengî jî divê ku mirov werêne ser ziman. Her wusa, pêşîya perwerdeya bi zimanê dayikê girtinê, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi têgîna jenosîda li ser serê civatê re werêne ser ziman. Hemû demên ku civatê bûhûrandina bi wê qadaxayê û perwerdeya xwe ku di wê de nedîtîya, divê ku mirov weke demên jenosîdê ên li ser serê civatê jî werêne ser ziman.

Civatek, ku andamên wê bi zimanê civate xwe perwerdeya xwe ya zikmakî nebînin, ew andamên wê civatê, ku çendî ku bi zimanekî dûyemin ê din ê beyenî bizanibin û bikin ku xwe werênina ser ziman jî, wê bo wan, ev xwe hanîna ser ziman, nebe weke xwe hanînaka li ser ziman bê. Wê, di her xwe hanîna li ser ziman de, xwe kêm hîs bike. Yanî, ew hêsta xwe kêm hîskirinê wê, hertimî xwe biparêzê.

Her wusa, di nava civatê de ku jin, weke kirdeya herî zêde ya jîyanê bê, wê çaxê, wê ev rewş herî zêde xwe bi wê re bide dîyarkirin. Xwe kêm hîskirin, xwe wastahî hîskirin, xwe hertimî di rewşeka ji jîyanê dûrketî de dîtin û heta ku di mejiyê xwe de bêwate dîtina jîyanê û di mejiyê xwe de li dawî jîyane xwe hanînê jî hizirîn û hwd, di vê çerçoveyê de weke hêst û têgînna ku pêş dikevin in. Gelek jinên kurd, ku di nava tekoşîna azadîyê de na jî, ev hêst bi wan re diafirin. Xwe wastahî, ne têr û ne kêrhatî dibînin. Di temenê van hêst û rewşan de, ji rastîya civatê, çand û zimanê wê dûrketin heya.

**Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, li vir bi teybetî di çerçoveya mijarê de binxat bike, ku gelek saziyên Jinan ên kurdan bin û ankû ên li rojavayê tirkiya bin, dema ku diçina nava jinên kurdan, ne bi zimanê civate kurd, diçina nava civate kurd. Bi zimanê tirkî, dikin ku xîtabî jina kurd ku zimanê wê zimanê kurdî ya dikin. Ew jina kurd jî, carna heta ku dikarê bi zimanê tirkî jî xwe dihêne ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ne saziyên ku bi zimanê tirkî diçina nava jinên kurd, dikarin bibêjin ku ew pirsgirêkên jinên kurd fahm dikin û ne jî jinên kurd ku zimanê wan zimanê kurdî ya, dikarin bibêjin ku ew bi zimanê tirkî dikarin bi tememî xwe werênina ser ziman. Yanî, ev kêmesîyek û xelatîyeka ku**

**ji herdû aliyan ve dihên kirin. Hemû, kovar, dirişm, nivîs û hwd, bi zimanê tirkî dihên nivîsandin. Ev hemû, ji mejiyê jina kurd re beyenî na. Çend ku, car bi car wan bixwêne jî, bi hêstî, wê nikaribê, xwe bi wan biwate bike û werêne ser ziman.** Tenê, ew nîvîs, kovar, dirişm û hwd, dibina weke kovar, dirişm û nivîsna ku ji jina kurd re dibêjin, tenê pirsgirêka te ev a, û hwd. Lê wekî din, ku dervî wan têgîh, nivîs, kovar û dirişman ku pirsgirêkên din ên jina kurd hebin, ew ti carî nayêna hanîna li ser ziman. Minaq, mijara fahmkirina a jina kurd a bi zimanê civate wê, ti carî rojekê jî min ne dîtîya ku sazîyaka ku dibêje ´ez sazîya jinê me´ ku hanîya rojevê û li ser wê re gotin hanîya ser ziman.

Pirsgirêka fahmkirinê ya jina kurd ya sereka, ya fahmkirin û xwe dana fahmkirinê ya bi zimanê wê yê civatî ya. Her wusa, bi zimanekî beyenî, ku weke ku zimanê wê yê dayikê bê, nêzîkatiyê li jina kurd dihê kirin. Di aslê xwe de, ev rewşa saziyên Jinan ên ku di bin navê saziyên Jinan de ku ava bûna û ankû weke ên ´baskê jinê ên partîyan´ ku avabûna û hwd, rewşaka di fîliyetê de dibe rewşeka hêrîşkarî li jina kurd bixwe jî. Bi gotinaka din, ev sazî, pêşî zimanê jina kurd di fîliyetê de weke ku rejimê û saziyên rejimê kirina, di mejiyê xwe de qadaxakirina. Ji vê re, çend ku hêncetên weke ´bêalîbûnê" û ankû weke ku dibêjim ´em, tenê em sazîya jinê na´ ku bi wê re dihêna hanîna ser ziman jî, hêncetna ku di kirasê ´masûmiyetê´ de ku navê jinê û rewşa jinê bixwe jî ku îstîsmar dikin in.

Ti saziyên jinê ku kurd bin û ku tirk bin, ku bi çi armancê û felsefeyê ku avabûbin, ku dema ku herina jina kurd û herina nava jinên kurd, ku ne bi zimanê wê bin û ne bi zimanê wê yê civatî bi zimanê kurdî ku xîtabî wê bikin bin, nikarin bibêjin ku ew rêz û hûrmetê ji jina kurd re digirin û ew bi pirsgirêkên wê re eleqeder dibin. Heta roja me, min ev ne dîtîya ku ti saziyên jinan, zimanên kurdî fêrbûna û ankû dema ku çûna nava jinên kurd ku ´tercûmanên kurdî´ jî tenezûl nekirina ku bi xwe re werênin bi wan fahm bikin. Ew saziyên jinan, ji çand, kevneşopîyên kurdan xwe xwedî dikin. Xwe mazin dikin. Lê tenê rojekê jî, giringîyê nadina zimanê jina kurd. Pêwîstî bi wê nabînin ku zimanê jina kurd fêr bibin. Di nava hemû saziyên jinan ên tirkiya de, diçin, ingilizî, firansizî, almanî û hwd, zimanên din fêr dibin û diçin û têkiliyê bi wan civatan re didênin. Lê ti carî, ev sazî, çendî ku diçina nava jinên kurd jî, wê rêz û hûrmetê nadina zimanê jina kurd ku fêrî zimanê wan bibin. Wê giringîyê nadina zimanê jina kurd. Dibêjin,”çendê ku ew jin kurd jî bin û jinên kurd jî bin, emê bi zimanê tirkî bibêjin û ew jî

mecbûrin ku fahmbikin.” Bi vê zihniyetê diçina nava jinên kurd. Ev rengê zihniyetê, zihniyeta asîmlesyonê a rejima tirk a ku bi reng û awayekî din, ku bi zanebûnî bê û ne bi zanebûnî bê, ev sazîyên jinan bi wê nêzîkî jina kurd dibin. Rejim, dibêje ku divê ku kurd bibina tirk. Saziyên jinan ên li tirkiya jî, dibêjin ”zimanê min tirkî ya, divê ku ew jinên kurd jî, weke min bi zimanê tirkî fahm bikin û xwe werênina ser ziman û divê ku pirsgirêkên wan bi zimanê tirkî werênina ser ziman. Bi gotinaka din, ew saziyên jinan jî, nêzîkatîya rejimê çiya li civate kurd, ya wan jî wusa ya li jina kurd. Rejim jî, zimanê kurdî piçûk û bêqiymet dibînê. Ev sazî jî, zimanê jina kurd, zimanê kurdî, piçûk û bêqiymet dibînin. Projeyên wan ên ku çê dikin jî, ew in ku wê çawa jinên kurd, bi zimanê tirkî perwerde bikin, fêr bikin û wan bi tirkî bikin ku xwe werênina ser ziman. Vê jî, di bin navê sazîyên jinan de dikin. Di aslê xwe de, ew zimanê jina kurd, piçûk û bêqiymet dibînin. Di hemû panel, civîn, konfarans, civînên tendûristiyê û hwd de, bi zimanê tirkî dikin. Li gorî xwe, ew tiştekî baş dikin. Hemû kar û xaabatên xwe bi zimanê tirkî dikin. Î ro, dema ku ez herim arabistanê bixwe jî, ez divê zimanê wê fêr bibim bo ku bi pirsgirêkên wê re eleqeder bibim. Heka mirov giringîyê bide jinên civatekê, mirov bi zimanê wê re diçê wê û xitabî wê dike. Jina kurd, zimanê wê kurdî ya, lê ev sazîyên jinan û hwd, hemû kar û xabatên xwe di nava jinên kurd de bi tirkî û zimanê tirkî dikin. Vê jî di bin navê, ´em alikariyê didin we´, ´ em bo we li vir in´, ´em bi pirsgirêkên we re eleqeder dibin ´ û hwd re dikin. Wê giringîyê û qiymetê nadina zimanê jina kurd, zimanê kurdî. Dibêjin ”emê pirsgirêkên jina kurd, çareser bikin”, lê zimanê jina kurd nizanin. Jina ku zimanê wê nizanin, wê çawa têkiliyê bi wê re dênin û wê çawa pirsgirêkên wê fahm bikin û çareser bikin? Wê çawa çareserîyê ji pirsgirêkên wê re werênin? ..

Pirsgirêka pêşî, li vir, pirsgirêka fahmkirin û têgihiştinê ya. Dema ku vê li ser zimanê wê yê civatê re ne hildina cidiyetê, wê çaxê, nikarin bahse rêz û hûrmetê jî bikin. Wê çaxê, mirov dikarê bahse rojevna van saziyên ku weke ´saziyên Jinan´ û ku ava bûna û heya, bikin. Rojeva herî sereka û vêşarî ya van saziyên ku weke ´saziyên Jinan´ ku kar dikin, ew a ku çawa ku wê jina kurd bi zimanê tirkî û li gorî mantiqê rejimê bikina tirk û ankû di wê çerçoveyê de zorê bidina wê ku, ew xwe werênina ser ziman. Ti ji van saziyên ku weke ´saziyên Jinan´ in, bi cil û bergên jinên kurd xîtabî wan nakin. Bi zimanê wê xîtabî wê nakin. Heta ku rengê wê yê bi cil û bergên wê û bi zimanê wê re heya, wê hîsasîyetê nadinê de û weke tiştekî piçûk û bêqiymet dibînin.

Li vir, divê ku mirov, vê yekê, werêne ser ziman ku pirsgirêka saziyên Jinan ên li kurdistanê di nava jinên kurd de, di serî de pirsgirêka li gorî rastîya wê ya civatî, çand, dîrok û zimanê wê nêzîkbûn a. Ti rêz û hûrmeta van saziyan ji rêz û hûrmetên wê yên civatî re nebûna. Saziyên ku weke saziyên Jinan ku di bin navê olê de jî hatina avakirin, di vê çerçoveyê de nêzîkî jina kurd bûna. Saziyên Jinan ên ku bi rengên din avabûna, wan jî bi vê rengî nêzîkatî li jina kurd kirina. Di ancamê de jî, hemû saziyên Jinan ên li kurdistanê ku di nava civate kurd de hatina avakirina, bi zanebûnî bê û ne bizanebûnî bê, xizmetî asîmlesyona li ser serê jina kurd û civate kurd kirina û di çerçoveya jenosîda li ser serê civate kurd de bo rejimê xabitî na.

Pirsgirêka saziyên Jinan ên ku li kurdistanê di nava civate kurd de hatina avakirin, divê ku mirov weke pirsgirêkeka sereka ya civatî jî werêne ser ziman. Ew sazîyên ku weke saziyên jina avabûna, civate kurd, bi awayekî weke ku ji rastîya wê dûr kirina na. Tûna kirina.

Saziyên Jinan ên li kurdistanê, ti carî mirov nikarê bibêje ku xizmetî jina kurd kar kirina. Bi zihniiyetî, navê jinê bikarhanîna û li gorî rejimê, wê çawa jina kurd bikina pozisyonekê de, di wê çerçoveyê de xabitî na û karkirina. Saziyên Jinan ên tekoşîna azadiya kurdistanê ku pêşketina, hinekî ji ber ku li gorî rastîya jina kurd tevgerîyan, di cih de ji aliyê jina kurd ve hatina fahmkirin û bi piştgirî kirin. Lê rejimê jî, hertimî astengî li pêşîya wan derxistina bo ku bi navê civate kurd û jina kurd pêşketinaka esasî nejî. Gelek ji wan saziyên jinan ên kurdistanî, bi destê dadgehên rejimê ve bi hêncetên cûr bi cûr ên hesan hatina girtin. Rejim, wan saziyan dişopêne. Dema ku sazi, li gorî rastîya civate kurd herê, astengî ji wê re tên derxistin û tê girtin. Lê ku li gorî rejimê bê, pêşî wê divekê. Di vê çerçoveyê de saziyên jinan ên kurdistanê ku tekoşîna azadiya kurdistanê pêşxistina, rastî astengiyên rejimê hatina. Armanc, pêşîya birêxistiniya civatî ya kurdistanî û kurdî bigirê ya. Lê tevî wê jî, saziyên tekoşîna azadîya kurdîstanê, kêm mana. Ji aliyê pêşxistina fahmkirinê û perwerdekirinê bi zimanê civatê û bi zimanê kurdî re kêm mana. Ev jî, bi demê re, bûya temenê pirsgirêkên din ên civatî ên navxweyî jî. Bi teybetî, ku di roja me de, kêm jinên kurd ên ciwan ku zimanê civate xwe bikarbênin, divê ku mirov di vê çerçoveyê de vê weke pirsgirêkekê di vê çerçoveyê de werênina ser ziman.

Jina kurd ku ji hemû nirx, kevneşopî û rastîya xwe ya civatî û zimanî dûrketîya, divê ku mirov di vê çerçoveyê de bi van pirsgirêkên wê re werênê ser ziman. Ne dîrok û ne jî zimanê xwe dizanê. Rastîya xwe ya

civatê, nizanê û fahm neke. Çend ji jinên kurd ên ciwan ên roja me, dikarin bibêjin ku ew dîroka xwe ya civatî dizanin? Çend ji wan, li ser rewşa jina kurd, bi dîroka wê ya civatî re lêkolîn kirina û ew hanîna li ser ziman? Di vê çerçoveyê de dîsa divê ku mirov werêne ser ziman ku çend ji van saziyên Jinan, bi zimanê jina kurd bi zimanê kurdî dîroka jina kurd, hildana li dest, nivîsandina û hanîna li ser ziman ku ew lê binerê û xwe bi wê re bibînê û fahm bike? Her wusa, weke van pirsgirêkan divê ku mirov pirr zêde li ser van mijaran bisekinê û wan werêne ser ziman. ,,,

**Bi nerîna jinê tûndûtûjî ...**

Her wusa, divê ku em li vir vê yekê bibêjin ku heta vir, me hewl da ku rewşa jinê, tûndûtûjiya li ser serê wê dihê meşandin, werênina ser ziman. Em dema ku li ser rewşa jinê dihizirin, her wusa li vir, mirov vê yekê kifş dike, ev aliyên ku heta vir me hanîna li ser ziman, tenê weke aliyekî mijara jinê û tûndûtûjiya li ser serê wê dimênin. Li vir, dema ku ev weka aliyekî bimênin, wê çaxê, divê ku mirov balê bikişêne li ser aliyên wê ên din jî. Aliyên wê yên din jî, her wusa di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wan dihizirê, mirov bi teybetî di nava malbatê de, bi têkilîya di nava jin û mêr de, bi nêzîkatîya li hevdû û hwd de dibînê.

Dema ku em tûndûtûjiyê, tenê bi dest li jinê rakirinê û lêxistinê û ankû bi lêdanê werênina ser ziman, wê ev tenê weke aliyekî tang bê. Lê divê ku mirov hinekî li ser berfirehiya wê re herê û mijarê ji aliyên wê yên din re jî werêne ser ziman. Bêgûman, tûndûtûjiya fizîkî, di roja me de jî heya li ser serê jinê. Heta ku tûndûtûjiya fizîkî, di wê astê de ya ku jin, weke ku bi wê dihê kuştin jî. Bûyarên kuştinê ên jinê di nava malê de bê ku bi hêncetên weke ên "namûsê" û hwd bê, û her wusa bi hêncetên din ên cûr bi cûr û hwd bê, hê jî bi wan jin dihên kuştin. Ev alî di çerçoveya mijarê de li wan dihizirê, her wusa, her aliyek, bi serê xwe di çerçoveya miijarak berfireh de dikarê werê hanîn li ser ziman. Her aliyek, dikarê li ser wê pirtûk bi berg bi berg werênina li ser werin nivîsandin.

Li vir, miijara jinê, divê ku mirov di çerçoveya nêzîkatîyê, nerîn û hwd de jî, weke aliyê fizîkî ê tûndûtûjiyê jî, werêne ser ziman. Li vir, dema ku em di çerçoveya jina kurd de werênina ser ziman, bêgûman, çerçoveya tûndûtûjiyê pirr zêde berfirehtir dibê û derdiikeve li ber me. Ji ber ku tûndûtûjiya rejimê a li ser serê civate kurd jî, ji aliyekî ve tenê

weke tûndûtûjiya li ser serê civatê namêne û dibê weke tûndûtûjiyeka li ser serê jinê jî. Li vir, di dewama vê de, ez divê ku di çerçoveya tendûtûjiya li ser serê jinê de bibêjim ku qadaxaya li ser zimanê kurdî bixwe jî, dibê weke tûndûtûjiyeka herî xadar û zalîmana a hem li ser civate kurd giştî û hem jî li ser serê jinê jî. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku jina kurd, zêdetir rastî tûndûtûjiyê tê. Dema ku di çerçoveya tûndûtûjiya rejima tirk de ku andamekê civate kurd ê mêr carekê rastî wê tûndûtûjiya zalimena were, wê jin, di wê çerçoveyê de weke ku du caran rastî wê tûndûtûjiyê were lê tê. Di serî de zimanê jina kurd qadaxa ya û ew nikarê xwe werêne ser ziman. Heta ku zimanê tirkî fêr nebê, mafê xwe hanîna li ser ziman ji wê re tûna ya. Qadaxaya li ser zimanan, zilm û xadarîya herî mazin ya ku dîrokê di demên buhûrî de şahîdî ji wê re kirîya û ya ku wê di demên pêşarojê ên pêş de ku ji wê re jî şahîdîyê bike bê. Zilma, Firawûn, Nemrûd û nazîyan jî, li ber wê zilm û xadarîya bi qadaxaya li ser zimanan re kêm dimêne.

Her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku dema ku zimanê kurdî qadaxa bê, wê andamên civate kurd nikaribin xwe bi zimanê xwe yê dayikê werênina ser ziman. Her wusa, bi wê re, wê jin jî, nikaribê xwe bi zimanê xwe werêne ser ziman. Li jor, me hinekî hanîbû ser ziman ku saziyên Jinan ên li tirkiya jî, dema ku diçina kurdistanê û jina kurd, di çerçoveya wê qadaxaya li ser zimanê kurdî de diçin. Ji xwe, projeyên wan jî, di wê çerçoveyê de na, ku wê çawa xwe bi zimanê tirkî werêne ser ziman. Rêz û hûrmeta wan ji zimanê civate kurd û jina kurd re tûna ya. Dema ku ev saziyên Jinan, bi saziyên Jinan ên welatên ewropî ên weke firansa, almanya, ingilistan û hwd re bikevina têkiliyê, ya tercûman li cem xwe amede dikin û yan jî, zimanê wan fêr dibin û wusa dikevina têkiliyê de. Lê dema ku diçina jinên kurd, wê bênezaketîyê didina nîşandin ku jina kurd ku zimanê wê kurdî ya, lê bi zimanê tirkî ji wê re diaxifin û dihênina ser ziman. Her wusa, divê ku mirov vê jî werêne ser ziman ku saziyên jinên tirk, nêzîkatîya wan li jinên kurd, di çerçoveya "neteweya serdest" ya metinger de ya. Bi nêzîkatî û têkiliya xwe re wê didina nîşandin. Ji jinên kurd re dibêjin, weke min bihizire, bi zimanê min bihizire û bi zimanên min xwe werêne ser ziman.

Her wusa, mirov dikarê vê nêzîkatîya weke nêzîkatîya saziyên Jinan li tirkiya ku li jinên kurd jî, weke rengekî tûndûtûjiyê ku di bin navê jinê, saziyên jinê û her wusa navê jinê de ku li jina kurd dihê kirin werêne ser ziman. Mirov dikarê vê nêzîkatîyê, weke rewşa ku polîs û leşkerên tirk, dema ku bi toma´yên polîs û leşkeran ku hêrîşî Jinan dikin û bombayên

gazê diavêjina jinên kurd û hwd, bi wê re werêne ser ziman. Ev hêzên dewletê jî, bo ku pêşîya rengên civate kurd bi ziman û çanda wê ku pêş dikeve bigrin wê tûndûtûjiyê li jina kurd dikin.

Rengê tûndûtûjiyê, ji vê aliyê ve dema ku mirov binerê, her wusa, weke tûndûtûjiya fizîkî ya ji dewletê ku li civate kurd û bi teybetî jî li jina kurd mirov dikarê werêne ser ziman. Aliyekî din ê ku vê tûndûtûjiya dewletê temem dike jî, li malê û hwd, tûndûtûjiya ku mêr li jina xwe, kêça xwe, xwûşka xwe û hwd dike jî, divê ku mirov werêne ser ziman.

Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bi teybetî werêne ser ziman ku Jina kurd, divê ku mirov werêne ser ziman ku ji gelek aliyan ve tûndûtûjî li ser serê wê heya. Her wusa, hemû rêyên wê yên xwe hanîna li ser ziman, di destpêkê de hatina girtin. Zimanê jina kurd, qadaxa ya. Saziyên Jinan ên li tirkiya jî, ku diçina jina kurd, ji wê re dibêjin ´divê ku tû bi zimanê tirkî biaxivê û werêne ser ziman.´ Dema ku jina kurd, zimanê tirkî nizanibê, bo wan saziyên Jinan, ew jina kurd ku zimanê tirkî nizanê, jineka nezan û nexwandî ya. Bo vê yekê jî, ew jî, ku di vê çerçoveyê de bizane dihasibênin, êdî dikin ku wê jina kurd, fêrî zimanê tirkî bikin. Jina kurd, li gorî wan çendî ku zimanê tirkî fêr bû, ewçendî medenî bûya, bizane bûya û her wusa fêr bûya û êdî dikarê li ser lingê xwe bisekinê. Yanê, ev saziyên Jinan ên li tirkiya medenîbûnê, bizanebûnê û her wusa fêrbûnê, di zanebûna zimanê tirkî de dibînin. Wekî din jî, heta roja me, bi ti pirsgirêkên din re eleqeder nebûna.

Li vir, divê ku ez vê yekê werênima ser ziman, divê ku mirov jin û civatê bi hevdû re hilde li dest. Ji xwe, li kurdistanê, bi zanebûnî, ji hevdû cûdakirina jinê û civatê û hildana li dest, dibê temenê gelek pirsgirêkên ku di vê çerçoveyê de ku rû didin bin. Dema ku rejimê zimanê civate kurd, zimanê kurdî qadaxa kiribê û ku di vê çerçoveyê de saziyek jinê bi zimanê tirkî ku li ser esasê wê qadaxaya li ser zimanê kurdî re ku nêzî jina kurd bibe, mirov çendî dikarê vê nêzîkatîyê, rast biahlaq û jidil bihasibêne û werêne ser ziman?

Zimanê jina kurd qadaxa ya. Bo vê yekê, nikarê xwe werêne ser ziman. Her wusa, êdî hertimî, li malê bê û ankû li derve bê, ku çi pirsgirêkan jina kurd dijî diavêje hundurê xwe. Ev jî, bi demê re wê temenê pirsgirêkên nû ku bi wê re diafirin bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê li vir binxat bike û werêne ser ziman ku mirov divê ku tûndûtûjiyê tenê bi tûndûtûjiya fizîkî ya ku dewlet li qadan û mêr li malê dike, tenê bi wê re bi sînor newêne ser ziman. Ji wê zêdetirî jî, di çerçoveya gotina tûndûtûjiyê de divê ku mirov ji aliyê derûnî û civaknasî ve jî nêzîkî wê

bibe. Di roja me de gelek mirovên ku xwe ´modern´ dihasibênin, dibê ku bi fîzîkî ku li berçav dihê ditin tûndûtûjiyê nakin. Lê bi gotina xwe re û bi nerîna xwe re wê tûndûtûjiyê dikin. Bi gotina re wê dişikênin. Bi gotina xwe re wê hêrîşkarîyê didina nîşandin û domandin. Bi nerînê re, dema ku bi çavên xwe û nerîna xwe re mirov jinekî tacîz bike, ew rengekî tûndûtûjiyê ya.

Mirov, di vê çerçoveyê de dikarê gotina tûndûtûjiyê bi têgînên weke ên derûnîyê û civaknasîyê re jî werêne ser ziman. Zora bi derûnî ku mirov bike, tûndûtûjiya wê, li mejiyê mirov, ji wê tûndûtûjiya bi fîzîkî li laşê mirov werê kirin ne kêmtir a. Bi derûnî, dema ku mirov hat xistin bin zorê de, ew divegerihê tûndûtûjiyê. Her wusa, di nava jîyane asayî de ev rewşên tûndûtûjiyê bi gelek rengên wê hena. Di nava du hevalan de jî, ku yek ji wan hevalan jin bê, bi çavê ku li wê were nerîn û bi întîbaya ku di derbarê wê de di mejiyê xwe de çê bike wê nêzîkatîya bitûndûtûj li wê bike. Di bin navê têkiliyên hevaltiyê de tûndûtûjiya ku li jinên ciwan ku ji hevalên wê bê, ji bira û ankû hewserê wê û hwd bê, bi gelek cûreyan xwe bi wê re dide nîşandin.

Tûndûtûjiya ku derve heval li jinê dike, di malê de bira, bav û mêr dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de jin, hemû qadên wê ên jîyanê li wê dihên wergerandin li tûndûtûjiyê. Jineka ku hinekî xweşik jî bê, ew xweşikatîya wê, bi wê zihniyetê li wê divegerihê rengekî tûndûtûjiyê ê bi nerîn û çavê mirov. Ew tacîza ku mêr bi çavê dike, wê hizra tacîzê ku di mejiyê xwe de bi wê dihizirê li jinê û hwd, her wusa divê ku mirov weke tûndûtûjîyeka xadar werênê ser ziman. Ti farqe wê rengê tûndûtûjiyê di mejî de bi tacîzî li jinê hizirkirin û her wusa bi çav û nerîna xwe re ku wê tacîz bike, ji wê recm´kirina jinê tûna ya. Ew recm´kirina jinê a ji aliyê mêr ve li jîyanê li berçavan dibê. **Lê ew recm´kirina mêr a bi rengê tûndûtûjî ê bi awayê bi nerîn û çavê xwe re, wê tacîz bike û di mejiyê xwe de bi wê re li wê bihizirê jî ya. Ev, recm´a hizrî ya. Mirov, di mejiyê xwe de bi hizirkirina xwe de wê recm kirinê dike.** Dema ku jinek, di ber çend mêran re derbas bû û bi carekê re wan mêran hemûyan bi carekê lê nerîn, ew dibê rengekî tacîzê ê derûnî jî. Heta, gelek jin, dema ku di rêyekê de diçina malê jî, rêyên xwe digûharin û diçin. Ji ber ku dizanin ku dema ku di der wan de herin, wê weke ku wê bi çavên xwe bixwûn wlê binerin. Jin jî, ji vê nexweş û aciz a. Ev rengê tacîza derûnî, mirov dikarê, weke recm´kirina derûnî jî werêne ser ziman. Ya ku wê mêr bide hizirkirin û heta ku bi mêr bike ku destbiavêje jinê û tecewûzî wê jî bike, ew recm´kirina di mejiyê mêr de ya ku bi vî rengî ya. Mirov, dikarê

vê recm´kirina di meji de ku bi rengê dimejîyê xwe de wê bihizirê û bi wê hizirkirinê wê tacîz bike re werêne ser ziman. Bi wê re, bi tacîza bi çav û nerînê re jî, di vê çerçoveyê de mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê rengê tacîz û tûndûtûjiyê de mêr, ajoyê vêşarî di mejiyê xwe de dijî û piştre dike piretikê de bi hêrîşên tacîzî ên li jinê re. Lê rengên recm´kirinê ên weke bi ´kevirkirinê´ hwd jî, rengê ajoya mirov ên vekirî û li berçav a. **Ev** zihniyeta recm´kirinê, jinê weke lewitîna destê mêr dibînê ya. Hertimî jî, di vê çerçoveyê de nêzîk bûya.

Ev rengê ajoyê, di malê de di nava têkiliyên mêr û jinê de jî xwe didina dîyarkirin. Jin û mêr, di malê de hewserên hevdû na. Lê mêr, weke ´serdestê´ wê ya. Heta ku di malê de dema ku diçina nava nivînên xwe û dirazihin jî, mêr dîsa li gorî xwesteka xwe tevdigerihê dike ku bibe xwediyê jinê û bi wê re razihê. Mêr, nahizirê ku ka jin di wê rewşê de ya ku karibê têkiliyê dêne û ankû ne dêne. Li wê ne hizirê. Tenê li wê xwesteka xwe ya têkildanînê dihizirê. Bo mêr, di wê kêlîkê de ya giring a ew ku ew tenê têkiliyê dêne. Tenê, li xwe dihizirê û difikirê. Li jinê, xwestekên wê û hêstên wê nahizirê. Heta ku li berçav jî, dibêt ku nagirê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di nava jin û mêr de, têkiliyeka ku tenê li gorî xwesteka aliyekî were danîn, divê ku mirov wê jî bike berlêpirsinê de. Ev rengê têkiliyê jî, aliyekî wê yê ku mirov dikarê bi têgîna tacîzê re ku werêne ser ziman heya. Ji ber ku dibê ku aliyekê di wê kêlîkê de nexwezê ku bikeve têkiliyê de. Lê aliyek zorê dide ku bikeve têkiliyê de. Heta ku car bi car, jinê gotîya ku ´ez nûha nexwezim ku bikevime têkiliyê´ û ankû ´ez ne amede me ku bikevima têkiliyê´ de jî, lê mêr li wê ne hisandîya û bi wê re ketîye têkiliyê de. Ev rengê têkiliyê, ku mirov dikarê hem weke rengekî tûndûtûjiyê werêne ser ziman û hem jî mirov dikarê weke tacîzeka ku di nava jin û mêr de jî ku mêr wê dike werêne ser ziman. Li vir, divê ku mirov vê yekê bibêje ku bila her jin, di çerçoveya têkiliya xwe ya bi hewserê xwe de vê pirsê ji xwe bike ku çend caran bi xwesteka xwe ketîya têkiliyê de. Her dema ku dikeve têkiliyê de, ew dixwezê û yan jî mêrê wê dixwezê? Yan jî, herdû bi hevdû re dixwezin? Ti têkiliya ku bi xwesteka aliyekî, mirov nikarê bi rastî wê werêne ser ziman. Mirovek jî, dema ku tû lingekî wî û ankû destekî wî jê bike, wê bi lingekî û ankû destekî bimêne û saqat bimêne. Wê ne tam bê. Heta ku mirov dikarê hinekî din jî pêde herê û wirde herê û bibêje ku ev rengê têkiliyê dikarê weke rengekî tecewûzê ku mêr bi jina xwe re dike jî werêne ser ziman.

Dema ku mirov bahse têkiliyeka rast ku di wê de tacîz û tecewûz tûna ya bike, divê ku mirov di çerçoveya bidilîyê de bike. Yanê, dema ku têkilî were danîn ku bi dil û xweşî û xwezeka herdû aliyan bê. Di wê çerçoveyê de ku herdû alî, rêz û hûrmeteka wan ji hevdû re hebe. Di vê çerçoveyê de mirov dikarê bahse wê bike û werêne ser ziman.

Dema ku mijar bibe jin, mêr ne bi mejiyê xwe dihizirê. Bi ajo û mêrîya xwe dihizirê. Dema ku keçekê û kûrekî bibêjin ´em hêz hevdû dikin´, di wê hêz kirinê de rewşa ku diafirê ku weke ku ew keçik, piştî ku wî kûrîkî ku hêz wê kirîya, êdî ew keçik bûya ya wî. Bûya malê wî. Bi wê rengê, lê dinerê. Heta ku piştî keçikê got û xwest ku ji wî cûda bibe jî, wê kûrîk, bi gotinên tacîzkarî û hêrîşkarî wê bi wê re biaxivê. Wê heta ku tûndûtûjiya fizîkî jî bike. Bi wê re jî, heta divê ku mirov vê jî bibêje ku gelek keçikên ku di vê rewşê de ku xwestina ku ji hevalê xwe cûda bibin, ji aliyê hevalên van ve hatina qatil kirin jî hena. Di pêvajoyên din ên jin û mêr de jî, mirov rastî rewşên bi vî rengî hatina. Bi gotina din, mirov dikarê vê werêne ser ziman ku ya ku mêr ji xwe re rast û di cih de dibînê, ji jinê re nabînê. Ji xwe re rast dibînê ku ew herê bi keçikeka din re hevaltiyê bike. Lê wê ji keçika ku berî hingî hevalti bi wê re kirîya, wê ji wê re rast nebînê. Têgîna hevaltîyê jî, weke ya mêrîtîyê û ankû hewsertiyê, li vir, divê ku mirov bibêje ku ne li ser temen û esasekî baş û rast a.

Abdusamet Yigit, Cizîra bota, Kurdistan, hezîrene 2015.